# پێشەنگ

گۆڤارێکی رامیاری و رۆشنبیرییە ڕاگەیاندنی ناوەندی پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان دەری دەکات

ژمارە (١١)　سالّی: ٤　ئازار/ ١٩٨٦

خستنە سەر نێت:- چالاک
chalakmuhamad@gmail.com



گەل لەسەر خاکی نیشتمان



پێشمەرگەی کوردستان

جەمشید کوردۆ

ناونیشان

PÊŞENG

P.O.BOX 5042 I3I05 NACKA SWEDEN

# پێشـەنگ

گۆڤارێکی رامیاری و رۆشنبیرییە راگەیاندنی ناوەندی پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان دەری دەکات .







HUNERMENDA NAVDAR
GULÎSTAN KEÇA KURD

نرخی (٥٠٠) فلسـە

## لەم ژمارەیەدا


٤ ـ گـەل لەسەر خاکی نیشتمان

٧ ـ بەیاننامەیەک بۆ رای گشتی

١١ـ دووەم کۆنگرەی سەرکردایەتی‌نەتەوایەتی هێزە شۆڕشگێڕییەکانی ولاتانی عەرەبی ....

١٣ـ ئیمپریالیزمی جیهانی جەنگێکی بەردەوامە دژی گەلان ....

١٥ـ بەلوجستان .. ژانێکی تورە

١٦ـ ئایدۆلۆژی شۆڕشگێڕانە ...

١٨ـ مەرگـی دیکتاتۆر ...

١٩ـ خوێندن لەژێر چەپۆکی فاشیزمی دا ...

٢٣ـ چیا ...... شیعر ـ ئەحمەد عارف

٢٤ـ چاوپێکەوتن لەگەڵ شاعیرو نیشتمانپەروەری گەورەی کورد مامۆستا هەژار ..

٢٩ـ چەند تێبینییەک لەسەر بیرەوەرییەکانی مامۆستا ( نوری شاوەیس )

٣٤ـ جاشنامە .... حەسەنی‌قزلجی

٣٨ـ دووری ... شیعر ـ جەلالی میرزاکەریم

٣٩ـ سێزدە سوارێن بەهدینان ـ شیعر ـ واربار ان

HELBEST.................................(40)

WEŞANÊN NÛ..............................(41)

JI DÎROKA ÇEWSANDÎNA JÎNÊ...............(43)

BÎ HELKEFTÎNA BORÎNA 77 SALAN JI JIYANA CASIMÊ CELÎL.......................(44)

QENATÊ KURDO ÇÛ HEQIYA XWE...............(45)

ARTÎSTÊN SOVETÎSTANEYÊ KURD ÊN PRFESÎONAL(47)

HEVPEYVÎNEK BÎ HUNERMENDA NAVDAR GULÎSTAN RA.............................(49)

JI RAPORTA POLÊTÎKÎ YA P,D,G,K..........(51)

DOZA KURDÎ DI CIVATA NETEWEYÊN YEK GIRTÎ DA...............................(52)

DOZA KURDÎ DI KONGIREYÊN " MESABE" Û SEROKATIYA NETEWEYÎ DA ...............(55)

RIJÎMA ŞOVÊNÎST 776 DIBISTAN LI KURDÎSTANÊ DAXISTIN......................(56)

BEYANNAMEYEK JI RAYA GIŞTÎ RA ..........(57)

GEL LI SER XAKA WELATÎ .................(58)

# پارتی گەل... لەسەر خاکی نیشتمان

واجارێکی دیکەش گەڕاینەوە سەرخاکی نیشتمان بۆ پەرەدان بە تێکوشان، بەتایبەتی خەباتی چەکدارانە شان بەشانی پارتییە هاوپەیمانەکانمان لە بەرەی نیشتمانی دیموکراتی (جود) و گشت هێزە خەباتگێڕەکانی دژ بەڕژێمی فاشیزمی خوێنمژی سەر بە ئیمپریالیزم و کۆنەپەرستان.

ئەولوتکەبڵندە بەبەفر داپۆشراوانە چەندە دڵگیرو جوانن، هاژەهاژی ئەو هەموو تافگانەی ئەم دەوروبەرەیان پڕ کردووە چەندە شیرینە ئەم قەدپاڵانە شادی و شانازیمان پێدەبەخشن، ئەو داربەڕووانە چەندە دڵفڕێنن لەوکاتانەدا کە تیشکی زێرینی خۆر دەڕژێتە سەر کڵۆ بەفری گیرساوە بە چڵ و لقەکانییەوەکەوەک چل چرا بەهەرار ڕەنگە خۆ دەنوێنن ◦ قاسپەقاسپی پۆلە کەوی ئەم دۆڵانە چۆن دڵ دەهەژێنن .....

پاش ماوەیەک دوور کەوتنەوەو گەڕانەوەبەفر بارینیش دەبێتە مایەی شانازی کردن بە نیشتمان و سۆزی گەرم بۆ ڕابووردووی پڕ لە سەربەرزی .. بگرە زرمە زرمی تۆپ و گرمەگرمی فرۆکەجەنگییەکانیش پاڵەوانێتی گەلەکەمان دێنێتەوە یاد .. کێ دەڵێ زستان وەرزی کار و خەباتنییە لە چیاکانی کوردستان ؟!

هاتنەوەی پارتییە خەباتگێڕەکەمان بۆ کۆڕی خەباتی چەکدارانە سەرئەنجامی کار و خەباتێکی بێووچان و ئاڵوز بوو کە پارتیمان لەڕۆژی دامەزراندنییەوە خەباتی بۆ دەکرد کە سیاسەتی ڕاستی پارتیمان لە هەموو بوارەکانا گرنگترین لایەنی ئەو هەوڵ و تەقەلایانە بوو کە بوونە هۆی ئەم سەرکەوتنە چۆنیەتییە بە تایبەتی هەڵوێستی یەکێتیخوازی بەرامبەر بزووتنەوەی ئازادیخوازی کوردو بزووتنەوەی نیشتمانی عیراق و بەتایبەتی پارتییە خەباتگێڕەکانی ناو بەرەی (جود) و پتەو کردنی بارو دۆخی بەرەیی و پەیوەندی دوو قۆڵی لەگەڵ زۆربەی هێزەنیشتمانییەکانی ترو بەتوندی ڕاوەستان دژی براکوژی و بانگهێشتنی ڕاستەقینە بۆ یەکگرتنی گشت هێزە نیشتمانییە جۆربەجۆرەکان .. بەم بۆنەیەوە بە سوپاسەوە یادی هەڵوێستی پارتە هاوپەیمانەکانمان و پارتەکانی تری براوهێزە ئازادیخوازە دۆستەکان دەکەین لە ناوچەکەمان کە پشتگیری مافی پارتیمانیان کردووەودەکەن



بۆگرتنی خانەو شوێنی سروشتی خۆی لە سەر خاکی نیشتمان ، ئەو نیشتمانەی لە پێناوی ئازاد کردنیدا سڵ لە هیچ جۆرە قوربانییەک ناکەینەوە ◦ پارتیمان هیچ مەبەستێکی لەمەدا نیە جگە لە زیاتر قوربانی پێشکەشکردن لە پێناوی ماف و ئازادی گەلی کوردمان و گەلی عیراق و هەموو کێشە ڕەواکانی تری گەلانی ناوچەکەمان .

پارتیمان لە ڕۆژی دامەزراندنیەوە بە سەر کاتی زۆر گران و بار و دۆخی یەکجار ئاڵۆزا تێپەڕیوە ، بەڵام ڕێبازی نیشتمانی و



پێشکەوتنخوازانەی کەبەندە لەسەر پێکەوەگرێدانی خەباتی ئازادیخوازی نەتەوایەتی و خەباتی چینایەتی هەمیشە مەشخەڵ بووە بۆ ڕۆشنکردنەوەی ڕێگای بەردەم خەباتگێڕە ڕاستگۆکانمان لەگەڵ خۆیان و گەلەکەیان. سەرکردایەتی و کادرەکانی پارتیمان بە سوور بوونی شۆڕشگێڕانەیان ڕێگایان نەداکە ئاڵای(گەل) بنەوێ یان دوور بکەوێتەوە لەخاکی نیشتمان. لەم ڕێگایەدا پتر لە بیست شەهیدمان بەخشیوە لەچاکترین و لێهاتووترین کادر وسەرکردەکانمان لەگەڵ ژمارەیەک لە بریندار و سەدان زیندانی کە هێشتا زۆربەیان لەکونجی تاریکی زیندانی فاشیەکاندان....

ئەمە هەمووی لەپێناوی مانەوەی ئاڵای گەل بەشەکاوەیی لەسەر خاکی نیشتمان و لەناو جەماوەرە خەباتگێڕەکەی دا.. ئێمە ئێستا لەم ڕۆژانەدا بەتایبەتی یادی شەهیدانمان دەکەینەوە، وەک شەهید گوندی وهاوڕێکانی

شەهید کاوەو هاوڕێکانی شەهیدان فارس وجەنگۆ و شەمۆ و کەژاوە پرشنگدارەکەی شەهیدانمان کە گیانی خۆیان کردە پرد بۆ پەڕینەوەی پارتیمان، پارتی دیموکراتی گەلی‌کوردستان، بۆ خاکی نیشتمان.

یادی هەڤاڵی مەزن شەهید نوری شاوەیس دەکەینەوەو ئامۆژگاری و ڕاوێژە بەنرخەکانی و ژیانی پێشکەوتنخوازی نەگۆڕی هەمیشە لەبەر چاومانایە.

هاتنی پارتیمان، بەشێوەیەکی ئاشکرا، بۆ سەر گۆڕەپان، سەرەتایەکی نوێی گرنگ پێکدێنێ، گەرچی لەهەمان کاتدا دەستکردنەوەیە بە خەباتی چەکدارانە لەلایەن سەرکردە و کادرەکان و پێشمەرگەکانیەوە، پارتیمان ناخوازێ ڕۆڵی هیچ پارتێکی تر کەم بکاتەوە یان جێی هیچ لایەنێک بگرێت، گۆڕەپانەکە ئەوەندە فراوانە جێی هەموانی تیادەبێتەوەو هێشتا زۆربەی جەماوەری گەلەکەمان دوورن لە ڕێکخراوە سیاسیەکان، ئەویش بەهۆی تیرۆری فاشیستی و سیاسەتی ڕەگەز پەرستانەی بێوێنەی خوێنمژانەی (صدام) کەهەموو جۆرە هونەرێکی چەوسانەوە بەکار دێنێ، هەر بۆ نموونە ئەم ڕژێمە بە هەڕەشەکردن و ترساندن و تۆقاندن بە ڕاپێچ کردن بۆ بەرەکانی جەنگ، و گواستنەوەی زۆرەملێیی جوتیارەکان و ئابلووقەدانی ئابووری گوندو لادێکان ونەکرینی بەروبوومی کشتوکاڵیان و داخستنی سەدان قوتابخانەو مەڵبەندی تەندروستی و جۆرەها شێوەی هەڕەشەکردن و تەماح خستنە بەر توانیوێتی ئەم ژمارە زۆرە بێوێنەیەی (مودیل)ی نوێی جاشقەید بکات کە ناویانلێ ناوە (الافواج الخفیفە). پێویستە لەسەر هەموومان، بەتایبەتی لەسەر بەرەی (جود) پیلانی دروست دابنێ بۆ سەرنەگرتنی ئەم دیاردە سەیر و سەرسوڕهێنەرەی پاشچارەکە سەدەیەک لەخەباتی شۆڕشگێڕانەی چەکدارانە لەکوردستان بڵاوبۆتەوەوتەشەنەی کردووە.

زۆر گیروگرفت هەیە لەسەر ڕێی پارتیمانا بەتایبەتی و لەبەردەم گشت هێزە کاراکانی تری کوردستان بەگشتی بۆ پەرەسەندن و گەشەکردنی ڕێکخراوە پارتایەتی و پێشمەرگایەتی و جەماوەرییەکانی بەشێوەیەکی سروشتی بۆئەوەی شێوازی نیشتمانی سەرانسەری بگرێتە خۆ. کە گرنگترین ئەم گیروگرفتانە، پاش تیرۆری فاشیزمی، دابەشکردنی زەوییە ئازادکراوەکانو ئەو زەوییانەی دەستی هێزی پێشمەرگەیان پێ دەگاتە کە دابەشکراون بەسەر نفوزی چەکداریدا، ئەو کارەی کە بەهیچ جۆرێک

خزمەتی خەبات و ئاوات و خواست و ماف و یەکگرتنی گەلەکەمان ناکات .

پێویستە لەسەر هەموان بەووردی لەم دیاردەیە بکۆڵنەوەکە بووە بەکۆسپ لەڕێی بەرەوپێشەوە چوون و پێشکەوتنی شۆڕش و گەلێک مەترسی هەیە بۆ سەر پاشەڕۆژی گەلەکە ـ مان، ئەمەش پێویستی بە لێکۆڵینەوەو پلان دانان هەیە بۆ بنەبڕکردنی ،گەرچی بە ماوەیەکی کەمیش تەواو نابێ . وا نۆ ساڵ بەسەر ئەم دیاردە کۆسپدانەرەدا تێپەڕیوە و ئەنجامی تەنیا بێ هێزی و چەسپاندنی پەرت پەرت بوون بووە . ئەمە لە کاتێکا کە دەست هەڵگرتن لەو دیاردەیە و پێکهێنانی یەکگرتنی نیشتمانی دەبێتە هۆی گۆڕینی زەوییە ئازاد کراوەکان بۆ قەڵایەکی پۆڵایینی سەخت لەڕووی لەشکری زۆرداران دا ودەبێتە دروستکردنی سەرەتا پێویستەکانی بەدەست



هێنانی مافە نەتەوایەتی و دیموکراسییەکان.

لێرەدا دەمانەوێ جارێکی دیکەش پەنجە بۆ شتێک ڕابکێشین کە پتر لە جارێک باسمان کردووە، ئەوەش ئەوەیە کە تەنازل کردن بۆ یەکتری زیانبەخش نیە، بەڵکو دەبێتە هۆی دەرگا داخستن لەسەر ( تەنازل ) کردن بۆ ڕژێمی فاشی ڕەگەز پەرست و ئیمپریالیزم و کۆنەپەرستانی ئاغای ئەو ڕژێمە . هەر کاتێکیش یەکێتی زەوییەکانی شۆڕش و هێزە شۆڕشگێڕەکانی سەر ئەو خاکە هاتە دی ، ئەو کاتە دەروازەکان لەسەر گازی پشت دەکرێنەوە بۆ بەدەست هێنانی سەرکەوتنی یەک بەدوای یەکدا لەسەرەڕێی بەدیهێنانی دیموکراسی و مافە نەتەوایەتییە ڕەواکان .

پێویستە ئەوەش بخەینەوە یاد کە خەباتی چەکدارانەمایەی شانازی پێوەکردنی جەماوەری گەلەکەمانە و خەم و پەژارە ڕەوێن و مەرهەمی زامەقووڵەکانی و ڕێگای تۆڵە سەندنەوەیەتی لە چەوسێنەران . بەڵام لە هەمان کاتیشدا بارێکی گرانە لە ڕێگایەکی دوور و درێژدا ، بەتایبەتی لەڕووی دەستەبەرکردنی پێداویستیە مادییەکانی بۆ بەردەوام بوون و بەرەوپێشەوە چوون و هێشتنەوەی وەک کارێکی شۆڕشگێڕانەی خاوێن پێویستە لەسەر ئەندامان و لایەنگران و پێشمەرگەکانی پارتیمان و جەماوەرو دۆستانی گەلەکەمان ئەمایان لەیاد نەچێ و ڕۆڵێکی کارا ببینن لە دابین کردنی پێداویستییە ـ کانی خەباتی چەکدارانەی سەپێندراو بە سەر گەلەکەمان دا وەک هۆیەکی سەرەکی بەرگریکردن و ڕزگاری .

( گەل ) بە هاتنی بۆ سەر خاکی نیشتمان نزیکتر دەبێتەوە لەڕووداوەکانی سەر خاکی کوردستان و عێراق بەگشتی و زیاتر دەچێتە ناخی ژان و ئازارەکانی جەماوەری گەلەکەمان

بەلای ئێمەوە دەبێ سەرتاپای خەباتی سیاسی و چەکداری و ڕاگەیاندنی وچالاکیەکانی تری پارتایەتی و بەرەیی ڕووی لە دامەزراندنی بەرەیەکی نیشتمانی فراوان بێ کە هەموو هێزە تێکۆشەرەکانی گەلەکەمان بگرێتەوە لە هێزە دیموکراسی و نەتەوایەتی و ئیسلامییەکان، چونکە ئەوە ڕێگای ڕاستی ڕاپەڕینی میللی سەرتاپاییە کە بتوانێ ڕژێمی (صدام) ی عەفلەقی فاشی لەناو ببات و ڕژێمێکی دیموکراسی هەڵبژێررا و دابمەزرێنێ و مافە نەتەوایەتییە ڕەواکانی گەلی کورد بهێنێتە دی و عێراق بگێڕێتەوە بۆ ڕیزی ئازادیخوازانەی عەرەبی و جیهانی .

# بەیاننامەیەکی هاوبەشی یانزە پارتی کوردی

## ـ بۆڕای گشتی ـ

بەبۆنەی هاتنی ساڵی نوێوە، نوێنەرانی پارتیوهێزە نیشتمانییەکوردستانی وکوردییەکان کەئەم بەیاننامەیان ئیمزا کردووە، کۆبوونەوەیەکی فراوانیان کردووەو سەبارەت بە کۆمەڵێک بابەتکە پەیوەندی هەیە بە بزووتنەوەی ئازادیخوازی نیشتمانی گەلی کورد .

لە سەرەتادا ئامادە بووان ڕووبەڕوویئەو ڕووداوانەی ساڵی ١٩٨٥ ڕاوەستان کە پەرەسەندنی بەربەرەکانی بەخۆیەوە، بینی لە نێوان هێزەکانی ئاشتیخوازی و پێشکەوتن و دیموکراسیی دا لەلایەک و هێزەکانیئیمپریالزم و کۆنەپەرستی لەلایەکی ترەوە .لەئەنجامیئەوەی ئیمپریالیزمی جیهانی بەسەرکردایەتی ئەمریکا پەرەی داوە بەڕادەی هەڕەشەکانی لە دژی ئاسایشی گەلان و ئاشتی جیهانی و بەردەوام بوونی لەسەر سیاسەتیپێشبڕکێی خۆ پڕچەک کردن و هەنگاونان بۆ بەجێهێنانی پڕۆگرامە دوژمنکارییەکەی چەکدارکردنی ئاسمان، هەتا وای لێهات کە ئیحتیمالی بەرپابوونی جەنگێکی ئەتۆمی لەهەموو کاتێکی تر زیاترە . بەرامبەر بەوەش یەکێتی سۆڤیەتو وولاتە سۆشیالیستەکان و هێزە دیموکراتوئاشتی خوازەکان دەورێکی ئیجابییان بینیوە بۆ پاراستنی ئاشتی جیهانی و ڕووبەڕووبونەوەی سیاسەتە ئیمپریالیستەکان .

لەڕاستی دا ناوچەکەمان ( ڕۆژهەلاتی ناوەڕاست ) لەهەموو ناوچەکانی تر زیاتر کەوتە ژێر کارتێکردنی سیاسەتەدوژمنکارییە ـ کەی ئیمپریالیزم لەئەنجامی شکانەتاڵەکەی ئەمریکاو ئیسرائیل ی دوستی لە لوبنان،ئەوە بوو بەردەوام بوون لەسەر ڕێبازەدوژمنکارییەکەیان و بە هێرشی ڕاستەوخۆ هەستان لە دژی هەردوو گەلی فەلەستینی و لوبنانی وهێرشیان لەسوریا و جەماوەری لیبیا کرد بە هۆی پشتگیری کردنی خەباتی هێزە نیشتمانییە لوبنانی و فەلەستینییەکان و هەڵویستی دژایەتییان بۆ ئیمپریالیزم و زایۆنیزمو کۆنەپەرستی و پیلانەکانیان . دەزگاکەی ڕێگن هەڵوێستە دوژمنکارییەکانی خۆی زیندووکردەوە بە کردنی دوو ڕووداوەکەی فرۆکەخانەی ڕۆما و ڤیەننا بە بیانوویەک بۆ هەڕەشەکردن بە هێرشی سەربازی بۆ سەر لیبیا و ئابلوقەی ئابووری بەسەردا سەپاندو داوا لە وولاتەکانی تر دەکات بۆ هەنگاونان لەدووی لەم بارەیەوە . بەلاّم بەپیچەوانەی ئارەزووەکانی ئەمریکا ئەم سیاسەتە شکستی هێنا لەئەنجامی ئەوەی هێزەکانی ئاشتی و ئازادی لە هەموو ناوچەیەکی جیهان و هەڕەشەکانی ئەمریکایان تاوانبارکرد .

ڕێکخراوە نیشتمانییە کوردییەکان ناڕەزایی و تاوانبارکردنیان دووبارە دەکەنەوە بۆ هەڕەشەکانی ئەمریکاو هاریکاری تەواویخۆیان ئاشکرا کرد لەگەڵ سوریا و لیبیا و گشت بزووتنەوەکانی ئازادیخوازی نیشتمانی لە ناوچەکەدا .

هەروەها ئامادەبووان کەوتنە لێکۆڵینەوەی پەرەسەندنی پەیوەندییەکانی ئیمپریالیزمی ئەمریکا لەگەڵ ئیستعماری فاشی تورکیا کە زیاتر لە ساڵی ڕابووردوودا گەرم بوونلە

ئەنجامی ڕازی بوونی حکوومەتی تورکیا لەسەر دانانی کۆمەڵێک مووشەکی ئەتۆمی و بنکەی سەربازی نوێ لە تورکیا و لە کوردستانی تورکیا . لەلایەکی تریشەوە هەتا ئێستا بەشێکی لە دوورگەی قوبرس داگیر کردووەو و ئەوەش ئاشتی ناوچەکە و جیهانی خستۆتە مەترسییەوە .

یەکێک لە گیروگرفتە هەرەگرینگەکانی ناوچەکەمان جەنگی عێراق و ئێرانە کە ڕژێمی فاشی سەدام بەرپای کردووە لە بەری ئیمپریالیزمی جیهانی . زۆر ئاشکرا شە کە بەردەوام بوونی ئەم جەنگە لەبەرژەوەندیەهیچ لایەکی ئەم دوو وڵاتە نیە و لە مەرگ وویرانی بەولاوە هیچی تریان پێنابڕێ. لەلایەکی تریشەوە ئەم جەنگە مەترسییەکی گەورە دەخاتە سەر بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد بەوەی کە ئاگری شەڕ کوردستانیشیگرتۆتەوە ، کەئەمەش دەبێتە هۆی ئازارو ناخۆشی زۆرتر بۆ گەلەکەمان .

لەڕاستی دا ساڵی ١٩٨٥ ساڵێکی پڕ لەئازار و ناخۆشی بوو بۆ گەلی کوردستان ، ئەوەش بە هۆی بەردەوام بوونی سیاسەتی سەرکوت کردن و کوشتن و بڕین لەدژی لەلایەن دوژمنەکانییەوە ، ئەوانەی کە هەنگاوی نوێیان ناوە لەبواری یارمەتی و هاریکاری بەمەبەستی کوژاندنەوەی ئاگریخەباتی شۆڕشگێڕانەی گەلی کوردمان، ئەوەبوو کوردستان ببوو بە مەیدانی هێرشی کوێرانە لەدژی خەڵکی بێ چەک و زیاتر لە کردارەکانی دێهات سوتاندن و دەربەدەرکردنو لەسێدارەدانی بەکۆمەڵ و داخستنی سەدان خوێندنگەو گیرانی هەزاران قوتابی، ئەم کردارانەش هەمووی بەپێی پرۆگرامێکی شۆڤێنی و فاشی لەلایەن ڕژێمی سەدامی فاشی ئەنجام دراوە بەمەبەستی گۆڕینی واقعی نەتەوەیی کوردستانی عێراق .

لەلایەکی تریشەوە دەسەڵاتداریە فاشیەکەی داگیرکەری تورکی کەگەورەترین بەشی کوردستانی داگیر کردووە ، تەنها بەبەکار هێنانی سیاسەتێکی نامرۆڤانە لەدژی گەلەکەمان لەکوردستانی تورکیا ڕازی نیەو بەڵکو ڕەفتاری دوژمنکارانە لەدژی گەلەکەمان بەکار دەهێنێت لەبەشەکانی تری کوردستان.لە کاتێکیشدا کە گەلی کوردمان و کەمایەتییە نەتەوەییەکانی تری وەک عەرەب و ئەرمەن و لاز و چەرکەسی بێبەشکردووە لەساکارترین مافە نەتەوەیی و دیموکراتییەکان ، دەبینین بەبێ هیچ شەرمێک باسی دیموکراسیو مافی مرۆڤ دەکات لەکاتی باسکردنی موسڵمانەکانی بولگاریا و زنجیرەیەک لەپرۆپاگەندەی گومانلێکراو دەردەخات لەدژی ئەو وڵاتە .

سەرەڕای هەموو ئەو ناخۆشیانە، ساڵی ١٩٨٥ ساڵی خەباتێکی بێ ووچان بوو بۆ بزووتنەوە ئازادیخوازەکەی گەلەکەمان کە ڕێگای خۆی بەرەو پێش بردووە . هێزەکانی پێشمەرگەش بەردەوام بوون لە لێدانی دوژمن هەرچەند مەسەلەی کورد لایەنگیرییەکی جیهانی ئەوتۆو پێویستی بەدەست نەهێناوە ، بەلام توانی لایەنگیری و هاریکارییەکی زیاتر بەدەست بهێنی لەناو لایەنەکانی بزووتنەوە ئازادیخوازییەکان و هێزەکانی ئاشتی و پێشکەوتنو دیموکراسی لە جیهان دا بەگشتی.

لەکاتێکیشدا کە لایەنە سلبییەکانی بزووتنەوەی گەلی کورد هەڵدەسەنگێنین ، دەبینین کەگرنگترین ڕووی لاواز کە گەلەکەمان بەدەستییەوە دەناڵێنێت ئەوەیە کە پەرشو بڵاوەو یەکگرتوو نییە و بەتایبەتی کەهەندێک لە هێزەکانی پەنا دەبەنە بەر چەک بۆ چارەسەرکردنی ناکۆکییەکانیان کە ئەوەش تەنها خزمەتی پیلانەکانی دوژمن دەکات . ئێمە لەکاتێکا کە ئەم ڕەفتارانە تاوانبار دەکەین پێویستی پەنابردنە بەر ووتوویژی دیموکراتی دووپات دەکەینەوە بۆچارەسەرکردنی ناکۆکییە لاوەکییەکان .

ئەی هێزە پێشکەوتنخوازەکان و ئەوانەی بەرگری لەمافی مرۆڤ دەکەن :

داواتان لی دەکەین کە دەنگ بەرز بکەنەوە لە

دژی ئەو ڕەفتارە ڕەگەزپەرست و کۆلۆنیالیانەی بەکار دەهێنرێت لە دژی گەلی کورد، کەژمارەی لە ٢٠ ملیون کەس زیاترە،بەمەبەستی نەهێشتنی بوونە نەتەوەییەکەی ، هەروەها لەدژی گرتنی بەکۆمەڵ و داوای هاریکارتان دەکەین لەگەڵ گەلەکەمان .

بەدیهێنانی ئاشتییەکی داد پەروەرانە لە ڕۆژهەلاتی ناوەڕاستا لەڕێگای چارەسەرکردنی دادپەروەرانەی مەسەلەی کوردەوە دەبێت بە مسۆگەر کردنی مافە نەتەوەیی و دیموکراسییەکانی گەلی کورد .

دەبا ساڵی ١٩٨٦ساڵی پەرەپێدانی خەباتی شۆڕشگێڕانە بێت لە دژی ئیمپریالیزم و کۆنەپەرستی . لەپێناوی هەنگاوی مەزنتر لەڕێگای ئازادی و ئاشتی لەم ناوچەیە و لە جیهان دا .

کانوونی دووەمی ١٩٨٦ –

**– پارتی هەڤگرتنی گەلی کوردی لە سوریا**
**–پارتی سۆسیالیستی کوردستان – تورکیا .**
**– پارتی سۆسیالیستی کوردستان – عێراق**
**– بزووتنەوەی ئازادی کوردستان– کوکسی**
**– پارتی دیموکراتی پێشڤەڕۆی کورد لەسوریا**
**– پارتی دیموکراتی کوردستان – عێراق**
**– پارتی دیموکراتی کورد لە سوریا ( پارتی)**
**– ئاڵای رزگاری .**
**– پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان.**
**– پارتی پێشەنگی کارکەرانی کوردستان.**
**– پارتی چەپڕەوی کورد لە سوریا .**

**هەتا وەک ئاگری نێو کان لەناو یەک**
**ئەگەر تۆفان بێ لەشکرتان، بە پووشەک**
**لەگوێی گا نووستوون بۆیە کە ڕێوی**
**لەسەرە ئێوە وەها شێرە وەکوو سەگ**

**(حاجی قادر)**

# بروسکەی پشتگیری

دوا بەدوای هەڕەشە دوژمنکارییەکانی ولاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا بۆسەر جەماهیری لیبیا و دەستکردن بە مناوەرات لەبەرامبەر سنووری دەریایی کەنداوی سرتی لیبیایی . زۆربەی پارت و ڕێکخراو ولایەنە شۆڕشگێڕو پێشکەوتنخوازەکانی جیهان بەجۆرەها شێوە پشتگیری و هاریکاری خۆیان دەربڕی لەگەڵ گەلی لیبیا و ناڕەزایی و بێزاری خۆیان پیشان دا بەرامبەر هەڕەشەکانی ئیمپریالیزمی ئەمریکی دژی گەلانی ئازادیخوازی جیهان .

**بروسکەی جود:**

بەم بونەیەوە "جود" لە تشرینی دووهەمی ساڵی ١٩٨٥ بروسکەیەکی ناردووە بۆ بەڕێز موعەممەرقەزافی ، لێرەدا چەند برگەیەکی دەخەینە بەرچاوی خوێنەران :

(( بەرەی نیشتمانی دیموکراتی – عێراق "جود" بەتوندی پشتگیری گەل و سەرکردایەتی جەماهیریی لیبیا دەکات لەبەرهەڵستی کردن و بەرپەرچ دانەوەی هێرشی ئیمپریالیزمی ئەمریکی و زایۆنیزمی ئاڕاستە کراو لە دژی لیبیا ...

"جود" بە توندی ناڕەزایی دەردەبڕێ و پیلانەکانی ئیمپریالیزمی ئەمریکی و هاوپەیمانەکانی دژی وڵاتی ئێوە تاوانبار دەکات ...

ئێمە ئەم بۆنەیە بەهەل دەزانین بۆ ڕێز گرتن لەهەڵوێستی هاریکارییەتان لەگەڵ گەلی عێراق بەعەرەب و کوردو کەمایەتییە نەتەوایەتییەکانەوە کەخەبات دەکەن لە پێناوی کۆتایی هێنان بەوجەنگە وێرانکاریەی ڕژێمی دیکتاتۆری هەڵگیرساندو بۆ

ڕووخاندنی ڕژێمی ئەو دەستە دیکتاتورییە فاشییەی خۆی سەپاندووە بەسەر گەلی عێراق دا

## بروسکەی پارتییە کوردییەکان:

هەروەها یانزە پارتی و ڕێکخراوی کوردی لە ١٩٨٦/١/١٤ بروسکەیەکی پشتگیری و هاریکاریی یان ناردووە بۆ بەڕێز موعەممەر قەزافی ئەمە دەقی بروسکەکەیە :

برای خەباتگێڕ موعەممەر قەزافی سەرکردەی شۆڕشی مەزنی ئەیلول.

سڵاوێکی شۆڕشگێڕانە .

بەناوی ئەو لایەنە کوردستانی و کوردییانەی ئەم بروسکەیەیان ئیمزا کردووە، سڵاوی خەبات و شۆڕشتان لێ دەکەین بۆ هەڵوێستە نەبەردانەکە ـ تان دژی پیلان و هەڕەشەکانی ئیمپریالزمی ئەمریکی و زایۆنیزمی کە دژی گەل و شۆڕشە جەماوەرییەکەی لیبیا یە و هەڕەشە کردنە لە گشت بزووتنەوە ئازادیخوازییە نیشتمانییەکان لە ناوچەکەمان . ئێمە کە بەتوندی ناڕەزایی خۆمان دەردەبڕین بەرامبەر ئەم هەڕەشە کردنانەو تاوانباری دەکەین . پشتگیری گەلی کوردمان و هێزە شۆڕشگێڕەکانی دەردەبڕین لەگەڵتان و لەگەڵ شۆڕشی مەزنی

(الفاتح)ی ئەیلول و لەگەڵ هەڵوێستە مێژووییەکانتان بەرامبەر کێشەی میللەتی کوردی بەشبەشکراو .

سەرکەوتن هەر بەدەست ئێوەیە چونکە ماف بەدەست ئێوەیەو ڕمان هەمیشە بۆ پیلانەکانی ئیمپریالیزم و زایۆنیزم و کۆنەپەرستانە .

بۆپێشەوە

* پارتی سۆسیالیستی کوردستان ـ عێراق
* پارتی پێشەنگی کارکەرانی کوردستان
* پارتی دیموکراتی پێشڕەوی کورد لەسوریا
* بزووتنەوەی ئازادی کوردستان ـ کوکسی ـ
* پارتی هەڤگرتنی گەلی کورد لە سوریا
* ئاڵای ڕزگاری کوردستان
* پارتی سۆسیالیستی کوردستان ـ تورکیا
* پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان
* پارتی دیموکراتی کوردستان ـ عێراق
* پارتی دیموکراتی کورد لە سوریا ( پارتی)
* پارتی چەپڕەوی کورد لە سوریا

## بروسکەی پارتیمان:

هەربەهەمان بۆنەوە پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان ڕۆژی ١٩٨٦/١/٢٣ بروسکەیەکی ناردووە بۆ خەباتگێڕ موعەممەر قەزافی تیایدا هاتبوو ـــ ... ( لەو چیا سەرکەشانەی کوردستانەوە کە بونەتە شورەیەکی پۆڵایین لە ڕووی زۆرداران و داگیرکەران، بەناوی خەباتگێڕان و پێشمەرگەو جەماوەری پارتیمان گەرمترین سڵاو پێشکەشی بەڕێزتان دەکەین و هاریکاری تەواوی خۆمان ڕادەگەیەنین لەگەڵ گەلی جەماهیری لیبیا و سەرکردایەتییە شۆڕشگێڕە دڵسۆزەکەی دژی زۆرداری و پیلان و هەڕەشە دوژمنکارییە هەڵچووەکانی ئیمپریالیزمی ئەمریکی بۆ سەر گەل و سەرکردایەتی ئێوە ...

دڵنیاین کە کوردستان بە پیرولاو ،ئافرەت و پیاو، بەچیاو دۆڵەکانییەوە کە ئێوەیان وەک هاوڕێیەکی بەوەفا و سەرکردەیەکی مەبدەئی لەسەرکردەکانی بزووتنەوەئازادیخوازییەکانی ناوچەکەمان و جیهان ناسیوە ،هاریکاریتان لەگەڵ دەکەن و ئامادەن بۆ بەرگری کردن شان بەشانی ئێوە ..



# دووەم کۆبونەوەی سەرکردایەتی نەتەوایەتی هێزە شۆڕشگێڕەکانی وڵاتانی عەرەبی و کۆنگرەی دووەمی - المثابة العالمیة - و مەسەلەی کورد

لە نێوان ٢-٤/شوباتی ئەمساڵ لە سەر داخوازی موعەممەر قەزافی ، سەرکردایەتی نەتەوەیی هێزە شۆڕشگێڕەکانی وڵاتانی عەرەبی لە تەرابلوسی ڕۆژئاوا ،دووهەم کۆبونەوەی فراوانی خۆی کرد.

وەفدی پارتیمان لەگەڵ وەفدی ( جود )ئامادەی بوو، لەکۆبوونەوەکان دا گفتوگۆ لەسەر باری ئێستای وڵاتانی عەرەبی و ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست و جیهان کرا .. بەدرێژی باسی مەترسی و ئاڵۆزی باری سەربازی کرا لە دەریای ناوەڕاست و بەتایبەتی لە بەرامبەر سنووری کەنداوی سرتی لیبیا! کە ئەمریکا بەتوندی هەڕەشە لە جەماهیریی لیبیا دەکا ...

ئەمجارەش وەک هەرجارێکی تر برای تێکۆشەر موعەممەر قەزافی میللەتی کوردی لەیاد نەکرد لەو کۆبوونەوە فراوانەدا چەند جار هاتە سەر مەسەلەی کورد ...

لەیەکەم ڕۆژدا ، لەوتاری دەستپێکردنا ووتی:

"خەباتی هێزە کوردییەکان تەنها بۆ ڕزگارکردنی عێراق نیە ، بەڵکو خەبات دەکەن بۆ ئازادی کوردستان .. کورد نەک تەنها شایانی ئۆتۆنۆمییە ، بەڵکو شایانی مافی خۆبڕیاردانی چارەنووس و دامەزراندنی دەوڵەتی کوردستانە ... پێویستە هەر لە سەرەتاوە ئەم سەرکردایەتییەی ئێمە بەشدار بێ لەئازادکردنی میللەتی برا ، میللەتی کوردستان ... لەسەرەتاوە دەڵێم دەبێ نەک تەنها لایەنگیریی ئۆتۆنۆمی بۆ کورد بکەین بەڵکو دەبێ لایەنی ئازادکردنی ئەممیللەتە بگرین .."

دوا بەدوای ئەم ، ئەو چوار پارتییە کوردییەی ئامادەی کۆبونەوەکان بوون(پارتی سۆسیالیستی کوردستان - عێراق، ئاڵای شۆڕش، پارتی دیموکراتی کوردستان ، پارتی گەلی دیموکراتی کوردستان )،بە چوار قۆڵی نامە - یەکی هاوبەشیان نووسی بۆ قەزافی ، بۆ سوپاس کردنی سەبارەت بە هەڵوێستە مەبدەئییەکانی دەربارەی میللەتی کورد ..

هەروەها لە دوا ڕۆژی کۆبوونەوەکانیش دا دیسان ووتی :

" مەسەلەیەک هەیە کە دەبێ باسی بکەین، ئەویش مەسەلەی کوردە ، کورد لەلایەن حکوومەتەکانەوە دەچەوسێنەوەو ئازاردەدرێن. ئێمە وەک دەوڵەت و بەناوی خۆمەوە چەند جار داوامان لە تورکیا کردووە بۆ ڕاگرتنی هێرشی قەلاچۆکردن و ئاوارەکردنی کورد.. ئێمە لەم سەرکردایەتییەدا دەبێ بە هەموو ڕێگایەک هەوڵ بدەین بۆ لابردنی زۆرو زۆرداری لەسەر کورد لە تورکیا .."

ڕۆژی ١٩٨٦/٢/٤ لەئەنجامی کۆبوونەوە فراوانەکەدا ، بەیاننامەیەک دەرکرا دەربارەی هەڵسەنگاندنی کۆبوونەوەکان و باری سیاسی ناوچەکە و جیهان بەتایبەتی دەربارەی جموجۆڵی سەربازی ئەمریکا لەدەریای ناوەڕاست بەرامبەر کەنداوی سرت و خۆڕاگرتنی سوریا بەرامبەر ئیمپریالیزم و زایۆنیزم و خەباتی گەلی فەلەستین و لوبنان و باسکردنی کارەساتە دڵتەزێنەکانی ئەم دواییەی یەمەنی دیموکرات .. پاش ئەوە دەربارەی عێراق بڕگەیەکی تایبەتی هەیە تیا نووسراوە:

" سەرکردایەتی نەتەوەیی هێزە شۆڕشگێڕە عەرەبییەکان هاتنە سەر باسی ئەو ژان وئازارانەی گەلی عێراق پێوەی دەناڵێنی بەدەست ڕژێمی فاشیستی یەوە کە ڕۆڵە خەباتگێڕەکانی عێراقی دەربەدەر کردووەو ناشیرینترین هۆیەکانی کوشتن و بڕین و تیرۆر بەکاردەهێنێ و لەڕێی جەنگێکی وێرانکاریی یەوە توانا کانی عێراقی بەفیڕۆ داوە ..

سەرکردایەتی نەتەوایەتی هێزە شۆڕشگێڕە عەرەبییەکان پشتگیری خۆی دوپات دەکاتەوە بۆ هێزەکانی موعارەزەی عێراقی بۆ خەبات کردن بۆ ڕوخاندنی ڕژێمی فاشیستی "صدام" و ئازادکردنی عێراق و دامەزراندنی ڕژێمێکی نیشتمانی دیموکراسی و هێنانەدی ئۆتۆنۆمی بۆ گەلی کورد لە کوردستان و گێڕانەوەی عێراق بۆ گێڕانی دەوری نەتەوەیی خۆی لە بەربەرەکانی کردنا دژی زایۆنیزم وئیمپریالزم

لە بڕگەیەکی تردا هاتووە کە"ئەم سەرکردایەتییە پشتگیری تەواو دەکات لە خەباتی ڕەوای گەلانی خەباتگێڕ لە پێناوی سەربەخۆیی و ئازادبوون لە چنگی ڕژێمە کۆنەپەرست و فاشیزمی و دیکتاتۆرییەکان و هاوبەشی کردنی خەباتیان لە ڕووبەڕووبونەوە - ی ئیمپریالیزمی جیهانی بەسەرکردایەتی وڵاتە یەککرتووەکانی ئەمریکا کە ئەوەش پێویستی هەیە بە دامەزراندنی بەرەیەکی میللی جیهانی بۆ بەرەنگاری ئیمپریالیزم و زایۆنیزم و کۆلۆنیالیزم .

## چاوپێکەوتن لەگەڵ تێکۆشەر موعەممەر قەزافی

ئێوارەی ٦/٢/١٩٨٦ وەفدێکی بەرەی نیشتمانی ( جود ) لە تەرابلووسی ڕۆژ ئاوا چاویان کەوت بە تێکۆشەر موعەممەر قەزافی بۆ گفتوگۆ کردن و ئاڵوگۆڕکردنی بیرو ڕا لە سەر خەباتی هێزە نیشتمانییەکانی گەلی عێراق و میللەتی کورد، دژی ڕژێمی دیکتاتوری فاشی "صدام" و خەباتی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد و باری سیاسی ناوچەی ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست و هەڕەشەو جموجۆڵی سەربازی و دوژمنکارانەی ئیمپریالیزمی ئەمریکی دژی لیبیا لەدەریای سپی ناوەڕاست بەرامبەر سنوورەکانی کەنداوی سرتی لیبیایی.

جارێکی تریش جەماهیریی لیبیا پشتگیری و هاریکاری خۆی نوێ کردەوە لەگەڵ خەباتی گەلی عێراق و میللەتی کورد ...

شایانی باسە کە وەفدێکی "ئاڵای شۆڕش" لەگەڵ وەفدی جود ئامادەی چاوپێکەوتنەکە بوو .

## دووەم کۆنگرەی گشتی جیهانی مەلبەندی جیهانی بەرەنگاری کردنی ئیمپریالیزم وزایونیزم و ڕەگەزپەرستی وکۆنەپەرستی و فاشیزم

لەنێوان ١٥-١٨ ی مانگی ئازاردا لە جەماهیری لیبیا دووەم کۆنگرەی ( المثابة العالمية لمقاومة الامبريالية و الصهيونية و العنصرية و الرجعية و الفاشية) ساز کرا.

پتر لە ٣٠٠ سێ سەد پارتی و ڕێکخراوی سیاسی لە گشت کیشوەرەکانی جیهانەوە هاتبوون بۆ ئەو کۆنگرەیە، وەفدی پارتیمان لەگەڵ وەفدی گشت لایەنەکانی تری بەرەی "جود" و ئاڵای شۆڕش و چەند لایەنێکی تری عێراقی ئامادەبوون.

لەبەرنامەی کۆنگرەکەدا ، مەسەلەی کورد شوێنێکی تایبەتی هەبوو، ئەمجارەش تێکۆشەر موعەممەر قەزافی وەک هەر جارێکی تر هەڵوێستی مەبدەئی جەماهیری لیبیای دەربڕی بەرامبەر مافی میللەتی کورد بۆ ئازادی و سەربەخۆ بوون .

لەیەکەم ڕۆژی کۆبونەوەکان دا ، لە وتاری دەستپێکردنا سەرەتا بەخێرهاتنی وەفدەکان دەستی پێکرد و وتی : بەخێرهاتنی نوێنەرانی هەموو لایەنە کوردییەکانی جیهان دەکەین .. بەخێرهاتنی هەموو بزووتنەوەکانی سەوزدەکەین لەجیهانا لەگەڵ گشت لایەنەکانی هندییەسورەکان لەئەمریکای ژوورو خوارو ....

هەر لەو وتارەدا جارێکی تریش هاتەوە سەر میللەتی کوردو وتی لێرە نوێنەری لایەنە جۆر بەجۆرەکانی میللەتی کوردمان لەگەڵدایە، ئەم میللەتەی کە پارچەپارچەکراوە و چەوسێندراوەتەوەو ئازاردراوەو کە دراوسێکانی نکوڵی دەکەن لەمافی یەکگرتن و سەربەخۆیی..

ناتوانین باری ئەم میللەتە لێ قەوماوە پشتگوێ بخەین، دەبێ لە هەموو شوێنێکی جیهان دا، بەتایبەتی کە ئێمە لە هەموو کیشوەرەکانی جیهان دا هەین، مافی میللەتی کورد ڕابگەیەنین بۆ یەکگرتن و سەربەخۆبوون

ڕۆژی ١٧/ئازار هەڤاڵ مەسعود بارزانی وتارێکی خوێندەوە بەناوی پارتی دیموکراتی کوردستان، پارتی سوسیالیستی کورد، پارتی سوسیالیستی کوردستان، پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان. تیای دا بەگەرمی سوپاسی تێکۆشەر موعەممەر قەزافی کرد بۆ ئەوەی کە بەبەردەوامی پشتگیری میللەتی کورد دەکات. کە بۆ یەکەمجارە سەرکردەیەی ولاتێک بەو شێوە بەهێزو ئاشکرایە بەرگری لەمافی میللەتی ئێمەدەکات.. هەروەها لە وتارەکەیدا بە کورتی باسی شۆڕش و ڕاپەڕینەکانی کوردی کرد تا دەگاتە شۆڕشی ئێستای کوردستان.. سەرەڕای ئەوەش ڕژێمی بەعسی عەفلەقی فاشی تاوانبار کرد بەهەڵگیرساندنی ئەو جەنگە وێرانکارییە دژی کۆماری ئیسلامی ئێران..

هەر لەو کۆبۆنەوەیەدا هەڤاڵ د.عبدالویس بەناوی "جود" وتارێکی خوێندەوە، ووتی:

لەوکاتەوە کە ڕژێمی بەعسی عەفلەقی دەستی گرتووە بەسەر عێراقدا وڵاتەکەمان و گەلەکەمان لەژێر باری جۆرەها تیرۆرو ئازارو زیندانا دەناڵێنێ.. ئەم ڕژێمە عێراقی کردوە بە زیندانێکی مەزن بۆ ڕۆڵەکانی، بەشی گەلی کوردیش لەم ڕژێمە ئەوەبووەکە جەنگێکی نوێ دەربارەی بەرپا کرا..

ڕۆژی ١٨/ئازار کۆنگرەکە کۆتایی پێهات و بەیاننامەیەکی سیاسی گرنگ بڵاوکرایەوە، لەم بەیاننامەیەشدا بەم جۆرە باسی میللەتی کورد کرابوو:

میللەتە پارچەپارچەکراوەکان مافیان هەیە کە دەست بەرداری هەویەی خۆی نەبێ و ڕۆڵەکانی خۆی کۆ بکاتەوە کە دووچاری ئاوارەیی و بڵاو بوونەوەی جوگرافی و سیاسی بوون بۆچاککردنەوەی بارەکەلەکەبووە مێژوویەکان کەحوکمی ئەم گیروگرفتە دەکاتە لە ڕوانگەی ئەم هەڵوێستەوە ئەم کۆنگرەیە پشتگیری خۆی دەردەبڕێ بۆ خەباتی میللەتی کورد لەپێناوی یەکێتی نەتەوایەتی و داواکارییەڕەواکانی.



### پشتگیری تەواوی میللەتی کورد

* بۆ زیاتر ڕوونکردنەوە بڕوانە ڕۆژنامەی گەل - ژمارە (٢١) و پاشکۆی تایبەتی ئەو ژمارەیە.

# ئیمپریالیزمی جیهانی جەنگێکی بەردەوامە دژی گەلان

ئامانج



ئەگەر تەماشایەکی نەخشەی ئیمڕۆی جیهان بکەین گەلێک ناوچەی داگیرساو بەدیدەکەین کە دوکەڵی شەڕو شۆڕو هەموو جۆرە چەکەکانی کوشتن و بڕینی تیا بەرز دەبێتەوەو هەموو ڕۆژی دەیان و بگرە سەدان مرۆڤی تیا دەکوژرێت و زیانی ئابووری گەورە دەکەوێت. ئەگەر کەمێکیش ووردتر بینەوە، ئەوا دەبینین زۆربەی ئەو ناوچە داگیرساوانە ئەو وولاتە تازە پێگەیشتووانە دەگرنەوە کە ڕێگای سەربەخۆیی نیشتمانی و ئابوورییان گرتۆتە بەر. ئاشکراشە کە ئیمپریالیزم بەرپرسیاری یەکەمە لە هەڵگیرساندن و خۆشکردنی ئاگری ئەو ناوچە داگیرساوانەو لە پشتیانەوە ڕادەوەستێ.

لەوەتەی ئیمپریالیزمی ئەمریکا شکانە گەورەکەی بەخۆیەوە بینی لە ڤێتنام لەسەر دەستی "فیەتکونگە" نەبەزەکان، شێوازی دوژمنکارییەکانی لە دژی گەلان لە هێرش و داگیرکردنی ڕاستەوخۆوە گۆڕیوە بۆ چەند شێوازێکی نوێی تر. وەک پشتگیری کردنی ئەو ڕژێمە بەکرێگیراوانەی بەدیکتاتۆرو کۆنەپەرست ناسراون لەلایەن گەلەکانیانەوە. شێوەی ئەو پشتگیری کردنەش هەموو جۆرە یارمەتییەکی مادی و سیاسی و سەربازی دەگرێتەوە. بەڵام لەهەموو شێوازە دوژمنکارییەکانی ئیمپریالیزم باو تر لەم ساڵانەی دواییدا ئەوە کە پەنا دەباتە بەر ئامادە کردن و ناردنی هێزەکانی دژ بە شۆڕش (شۆڕشی چەواشە) بۆ ناو ئەو وولاتانەی کە ڕێگای سەربەخۆیی نیشتمانییان هەڵبژاردوە (نیکاراکوا و ڤێتنام و کەمبۆچیا و ئەنگۆلا ... هتد)، یان لە ڕێگای نانەوەی تۆوی ناکۆکیی تایەفەگەری و سیاسی و ئاینی (لوبنان، هندستان، ... هتد): سەرەڕای ئەم شێوازە جۆربەجۆرانەی ئیمپریالیزم بۆ دوژمنایەتی کردنی گەلان بەشێوەیەکی ناڕاستەوخۆ، هیچکاتێ دوو دڵ نابێ و یەک و دووناکا لەبەکارهێنانی شێوازە کۆنەکەی بۆ هێرشکردن و داگیر کردنی ڕاستەوخۆ.



لەنیکاراگوا کاتێ کەگەل لەگەرمەی خەبات و ڕاپەرین دا بوو لەدژی ڕژێمەبۆگەنەکەی "ئەنستاسیۆ سۆمۆزا" وولاتە یەکگرتوەکانی ئەمریکا هەموو توانایەکی خۆی خستبووەکار بۆ درێژە دان بە تەمەنی ڕژێمە ئاڵقە لە گوێیەکەی خۆی و هەموو جۆرە یارمەتییەکی سەربازی و سیاسی و ئابووری و تەنانەت ئینتلجینسیشی پێ دەبەخشی. سەرەڕای پشت گیرییە بەهێزو بێ سنوورەکەی ئیمپریالیزمی ئەمریکا بۆ ئەو ڕژێمە، گەلی نیکاراگوا بە پێشڕەوایەتی بەرەی ساندینیستا توانی تەختی سۆمۆزا بڕوخێنێ لەدوای ڕزگارکردنی دوا بستی خاکی نیکاراگوا. بەڵام ئایا ئیمپریالیزم لەم خاڵەوە ڕاوەستاو بەرۆکی گەلی هەژاری نیکاراگوای بەردا ...؟ بەپێچەوانەوە، بەڵکو لەوڕۆژەوەی کە ئەو وولاتە سەربەخۆیی نیشتمانی خۆی ئاشکراکردو هەتا ئیمڕۆو تا ئەم ساتەش وولاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا سروەتی نەداوە لە دوژمنایەتی کردنی ئەوگەلە بەهەموو شێوەیەک، هەر لە ئابڵووقەی ئابوورییەوە تا ناردنی هێزی دژ بە شۆڕش لەسۆمۆزییە چڵکاو خۆرەکان کە ئەمانەش درێغی ناکەن لە تاڵانکردن و وێرانکاری بە مەبەستی شڵەژاندن و شپرزە کردنی ڕژێمە شۆڕشگێڕە نیشتمانییەکەی. لەهەموو ئەم دوژمنکارییانەش سەیرتر ئەوەبوو کە ئەمریکا بە شێوەیەکی ڕاستەوخۆ کەوتە لەغەم کردنی ئاوی دەریای دەمکەنارەکانی نیکاراگوا کە بووە هۆی کوشتنی چەندەها کەس لەو هەژارانەی بەسەر ڕاوە ماسییەوە دەژین. چەندەها جاریش وولاتەیەکگرتووەکانی ئەمریکا بەزمانی سەرۆکەکەی" ڕیگان"ئاشکرای کردووە کە ووچان نادات بۆ ڕووخاندنی ڕژێمی ئێستای ئەم وڵاتەو گێڕانەوەی سۆمۆزا.

ئەم نموونەیەی نیکاراگوا یەکێکە لە چەندها نموونەی تر کە تیایاندا ئیمپریالزم

هەمان دەور دەبینێت بەمەبەستی مل کەچ کردنی گەلان بۆ بەرژەوەندییەکانیان . ئەم تاقیکردنەوەیەی کە باسمان کرد هەمووڕۆژێ دووبارە دەبێتەوە لە ئەنگۆلاو ڤێتنام و کەمبۆچیا ... هتد .

لە شێوازەکانی تری دوژمنکاری ئیمپریالی لە دژی گەلان نانەوەی تۆوی ناکۆکی تایەفەگەری و ئیقلیمچێتی و عەشایەرییە لەناو گەلە دواکەوتووەکان بە مەبەستی بێ هێزکردنیان و دوورخستنەوەیان لەهەستو بیری ئازادیخوازی . لەم بارەیەوە نموونەی لوبنان چاکترین بەڵگەیە بۆ دەورە ڕوخێنەرەکەی ئیمپریالیزم لەم وولاتە . یان نموونەی هندستان کە ئیمپریالیزم هەموو توانایەک بەکاردەهێنێ بۆ ئەوەی ئیسلام و هیندۆس و سیخەکان بەیەکا بدات و ئەو وولاتە تێک بداو بیگێڕێتەوە بۆ ڕۆژە تاریکەکانی جارانی ژێردەستەیی ، ئەوی شایانی باسیشە هەر ئەم دەورەی ئیمپر-یالیزم بوو کە بووە هۆی کوشتنی پێشەوای هیندستان ئەندیرا غاندی . لەڕاستیدا ئەم شێوازە ئیمپریالیستییە نوێ نییەو سیاسەتێکی کۆلۆنیالی کۆنە بەڵام ئامرازێکی بەکارە لە دەبێتی ئیمپریالیزم دا هەتا ئیمرۆش هەروەک لەو دوونموونەیەی سەرەوە .

هەروەک ووتمان ئیمپریالیزم سەرەڕای ئەوەی ئێستا هەوڵی بەکارهێنانی شێوازی ناڕاستەوخۆ دەدات لە جەنگی گەلان ، بەڵام هیچ کاتێک دوودڵ نابێ لەبەکارهێنانی شێوازە کۆنەکەی جارانی بۆ هێرش بردن و داگیرکردنی وولاتان ، ڕووداوەکانی دوێنێ گرینادا و داگیر کردنی لەلایەن هێزەکانی وولاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا ، یان هێرشی سوپای تورکیای ئەندام لە پەیمانی ناتۆ بۆ سەر کوردستانی خواروو و بزووتنەوەی ئازادی خوازی کورد و پێشێل کردنی مافەکانی میللەتی کورد لە کوردستانی ژووروو ، یان هەڕەشەکانی ئێستای هێزەدەریاییەکانی ئەمریکا کە لەبەردەم کەنارەکانی لیبیا خەریکی مناوەرە کردنی دوژمنکارانەن بۆ سەر گەلی لیبیا ، ئەمانەهەمووی ڕاستییەجەوهەرییە-کەی ئیمپریالیزم پیشان دەدەن .

ئەو ڕاستییەش کەکەس ناتوانێ بەدرۆی بخاتەوە دەربارەی هەڵوێستی دوژمنانەی ئیمپریالزم بەرامبەر بە گەلان ، پشتگیری کردنیەتی بۆ "ئیسرائیل" و "باشووری ئەفریقیا" ، ئەم دوو ڕژێمە بەبڕیاری ئەنجومەنی گشتی ڕێکخراوی نەتەوە یەکگرتووەکان بەدوو ڕژێمی ڕەگەز پەرست ناونراون بەهۆی سیاسەتە ناڕەواو نامرۆڤانەکانیان . بەڵام ئەم دوو ڕژێمە زۆر بە توندی لەلایەن ئەمریکاوە پشتگیری دەکرێن و هەموو جۆرە یارمەتییەکان پێدەبەخشێت و لە هەموو جارێک کە ئەنجوومەنی ئاسایشی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکانەدەیەوێت کردارە دوژمنکارییەکانیان لەدژی گەلانی تر تاوانبار بکات دەبینین "ڤیتۆ"ی ئەمریکی لەڕووی دەوستێ و بڕیارەکانی نەتەوە یەکگرتووەکان پێشێل دەکات .




لەکوتاییدا ئەوە ماوە بڵێین ئیمپریالیزم کەوەک هەژدیهایەکی گەورە وایە بەهەڵمژینی خوێنی گەلان دەژی و هەرکاتێ ئەو خوێنەی لێ ببڕێت لەکاردەکەوێت و دەمرێت ، بریتییە لە جەنگێکی بەردەوام لەدژی گەلان ، جا یان ئەوەتا بەبەهێزی بمێنێتەوەو خوێنی گەلان بمژێت و بەژیانی چەوساوەیی و مەمرەو مەژی بیانهێڵێ-تەوە ، یان گەلان پەرە بەخەباتی خۆیان بدەن هەتاکو بەدەستهێنانی سەربەخۆیی سیاسی و ئابووری خۆیان کەئەوەش دەبێتە هۆی گیانەڵاو مردنی ئیمپریالیزم . گەلی کوردیش لەئەنجامی خەباتە مێژووییەکەی لە دژی ڕژێمە کۆنەپەرست و بەکرێگیراوەکانی سەر بە ئیمپریالیزم ، هەر لە شۆڕشە نیشتمانییەکەی شێخ مەحموودی نەمرو شۆڕشەکانی بارزان و کۆماری مەهاباد و شۆڕشەکانی گەلی کوردمان لەکوردستانی باکورەوە هەتا شۆڕشە نیشتمانیەکەی ئەیلول و کارەساتەدڵتەزینەکانی هەرەسە-کەی ١٩٧٥ و دەوری ئیمپریالیزمی ئەمریکا تیایدا ، چاک شارەزای ئیمپریالیزم بووە و خاوەنی تاقیکردنەوەیەکی دەوڵەمەندە لەم بارەیەوە ، هەر لەبەر ئەوەشە کە بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد بەشێکی دانەبڕاوە لە هێزەکانی شۆڕشی جیهان لەدژی ئیمپریالیزم و کۆنەپەرستی و ڕەگەزپەرستی .



بەلوجستان
پاشماوەی لاپەرە 16

ڕێکخراوی خوێندکارانی بەلوچ ( B.S.O ) وەکو ڕێکخراوێکی پێشکەوتنخوازانە دۆستی ڕێکخراوی خوێندکارانی کوردە لە ئاسیا و پشتگیری تەواو لە خەباتی گەلی کورد دەکات .

پەیامنێری پێشەنگ

# بەلوچستان ژانێکی تورە

chalakmuhamad@gmail.com
خستنە سەر نێت: چالاک

گەلی بەلوچ وەکو گەلی کورد بەپیلانەکانی ئیمپریالیزم لەنێوان چەند وڵاتێکدا دابەش کراوە .. ئەم گەلە لە بنەڕەتدا گەلێکی"ئاری ن و زمانەکەشیان زمانی بەلوچی زۆر لەزمانی کوردی یەوەنزیکە . تەنانەت زۆر لە مێژوو نوسانی ئەم ناوچەیە لەو بڕوایەدان کە کورو بەلوچ لە کۆن دا یەک نەتەوەبوون. لێرەدا ناماناەوێ ڕەسەن و شارستانیەتی بەلوچەکان باس بکەین ، بەڵکو هەوڵ ئەدەین لایەنێک لە بزووتنەوەی ڕامیاری ئەم گەلە نەبەزە بخەینە بەرچاوی خوێنەران.

بەگشتی .. بەلوچستان ناوچەیەکی شاخاوییە و لەڕووی کانەکانەوەدەوڵەمەندە . نەوت وگازو خەڵوزی بەردی و ئاسن و بەردی مەرمەڕیتێدایە. ئەمڕۆ (سوگاز) کەلەبەلوچستانەوەدەرئەچێت بۆ هەموو شارەکانی پاکستان بەبۆری ڕاکێشراوە بەڵام نەگیشتۆتە ماڵی هەژارە بەلوچەکان. ڕژێمی کۆنەپەرستی پاکستانیش لەکۆنەوە ئەم ناوچەیەی لەئاوەدانی و پێش خستنی ئابووری و ڕۆشنبیری بێ بەش کردوە .

بەلوچستان لەپێش دامەزراندنی دەوڵەتی پاکستاندا خاوەنی دەوڵەتێکی ڕامیاری بوو کە میرەکانی قەڵات فەرمانبەرێتییان دەکرد... ئەم دەوڵەتە بەلوچە لەساڵی هەزارو نۆسەد و چل و هەشت دا لەلایەن لەشکری پاکستانەوە ڕوخاو بەلوچستانیان بەزۆر خستە ژێر سنوری ئیداری پاکستانەوە . بەلوچەکان بەم کارە زۆر نارازی بوون و لەگەڵ دابەش بوونی هیندا نەبوون چونکە بە پیلانێکی ئیمپریالیستی یان دادەنا ، ئەوەبو لەساڵی ١٩٤٩ حکومەتی پاکستان زۆر لە خوێندەواران و ڕۆشنبیرانی بەلوچی خستە زیندانەوە بۆ نموونە میر عبدالعزیز کوردو میرغوس بیزبخو . میر عبدالعزیز کورد لەساڵی ١٩١٧ یەکەم ڕێکخراوی ڕامیاری بەناوی (ئەنجومەنی یەکێتی بەلوچەکان ) دامەزراند. دوایی لەساڵی ١٩٣٤دا ناوی ئەنجومەنەکە گۆڕا بۆ ( پارتی گەلی نیشتمانی) و ئەم پارتە توانی هەموو عەشیرەتی بەلوچەکان و کوردەکان لەژێر ئاڵای خۆیدا کۆبکاتەوە .

لەساڵی ١٩٦٢ دا عزت عبدالعزیز کورد و محمود عزیز کورد ( ڕێکخراوی قوتابیانی بەلوچ )یان دامەزراند. محمود عزیز کورد لەبەر چالاکییە ڕامیارییەکانی بۆ هەمیشە لەکۆلیجدا دەرکراو نەیتوانی جارێکی تر بخوێنێت . دوا بەدوای ئەمە لەساڵی ١٩٦٤ دا



حەمید بلوچ لە زیندانی مەچدا



سەلیم کورد شاعیرو دکتۆر قاضی مبارك شاعیری بەلوچ لە زیندانی مەچ دا .

( ڕێکخراوی لاوانی بەلوچ ) بەسەرۆکایەتی ئەمیر الملک مەنگل دامەزرا . ڕێکخراوی قوتابیان و لاوان توانیان زۆربەی لاوانی بەلوچ ئاگادار بکەنەوەو لەژێر ئاڵای ڕێکخراوەکەیاندا کۆیان بکەنەوە تاکو ساڵی ١٩٦٧ هەر لەو ساڵەدائەم دوو ڕێکخراوەیەکیان گرتوو ڕێکخراوی خوێندکارانی بەلوچیان دامەزراند ( B.S.O )و عبدالحی بلوچ کرا بەسەرۆک . مەسەلەی نەتەوایەتی و چینایەتی لەئەنجامدا ڕێکخراوی خوێندکارانی کرد بەدوو بەشەوە ، بەشێکیان کەدژی بیرو باوەڕی بۆرژوازی بوون و بڕوایان بە ڕاڕەوێکی مارکسیزمی- لینینزمی هەبوو ناوی خۆیان نا ( عوامی) .ئەم ناکۆکی یە تاکو ساڵی ١٩٨٣ وەکو خۆی مایەوە لەو ساڵەدا هەردوو گروپەکە جارێکی تر بوونەوە بەیەک.

## بەلوچستان و شۆڕشی زەفار

(گەوادەر) ناوچەیەکی بەلوچستانە لەسەر دەریای عەرەبی، لەکۆنەوەئەم ناوچەیە حکومەتی عومان داگیری کردبوو . لەسەردەمی ئەیوبخان دا پاکستان و عومان ڕێکەوتن وئەم ناوچەیە درایەوە دەست پاکستان بەمەرجێک حکومەتی مەسقەت مافی ئەوەی هەبێت هەموو ساڵێک پیاوی ئەم ناوچەیە کۆبکاتەوەو بیانکا بە"مرتزقە" جاش . لەبەر نەخوێندەواریو لە بەر هەژاری زۆر لە لاوە بەلوچییەکان لە دیهاتەکانەوە هەمووساڵێک ڕوویان دەکردە عومان و حکومەتی سوڵتانیش پارەیەکی زۆر و چەکی ئەدانێ تاکو کۆشکی سوڵتان بپارێزن و شۆڕشە ئازادیخوانەکانیش سەرکوت بکەن. سوڵتان قابوس زۆر لەم بەلوچانەی بۆکوژانەوەی شۆڕشی زەفار بەکار هێناو هەموو ساڵێکیش تاکو ئەمڕۆ جەنراڵێکی سوڵتان بەیارمەتی حکومەتی پاکستان ئەکەوێتە ماشینەوەی لاوانی ئەم ناوچەیە .

## مەسەلەی حەمید بەلوچ

ڕێکخراوی خوێندکارانی بەلوچ لەساڵی ١٩٨٠دا بەیاننامەیەکیان بڵاوکردەوەو داوایان لەگەلی بەلوچ کرد کەدەستی خۆیان بە خوێنی شۆڕشگێڕەکانی زەفار خوێناوی نەکەن ودژی زوڵم و زۆری ڕژێمی دیکتاتوری و سوڵتان وشێخەکانی وڵاتانی عەرەب بوەستن . لەهەمان کاتدا کەمینێکیان بۆ کوشتنی جەنراڵەکەی سوڵتان قابوس دانا تاکو لەکاتی چونیا بۆ بەلوچستان بیکوژن و لاپەڕەیەکی مێژوویی برایانەلەگەڵ

شۆڕشی زەفاردا بکەنەوە. جەنرال (خلفان) و چەند ئەفسەرێکی پاکستانی ڕویان کردە شاری (توربەت) و کەوتنە ناو کەمینەوە بەڵام کەسیان نەکوژرا یەکێکیش لە قوتابیەکان (حەمید بەلوچ) گیرا.

حەمید بەلوچ قوتابی پۆلی دووەمی کۆلیجی ئەندازیاری زانکۆی کابول بوو لەو ماوەیەدا بەسەردان گەڕابۆوە ناو خێزانە جوتیارەکەی و وەکو مرۆڤێکی شۆڕشگێڕ بەشداری ئەم کارە ڕامیارییەی کرد. حکومەتی پاکستانی سەر بە ئیمپریالیزم بۆ ئەوەی دڵی سوڵتان رازی بکا بڕیاری لەسێدارەدانی حەمید بەلوچی داو تاوانی کوشتنی یەکێک لە پیاوەکانی جەنرال (خلفان)ی خستە ئەستۆ. ئەوەی ڕاستیش بێت کەس نەکوژراو دادگاش نەیتوانی هیچ بسەلمێنێ پارێزەرەکەی حەمید بەلوچ داوای لاشەو ناوی کوژراوەکەی کرد.. دادگا سێ جار ناوی کوژراوەکەی گۆڕی و لاشەکەشی ئامادە نەکرد بو لێکۆڵینەوە. بەکورتیەکەی، ئەوانە هەمووی بیانوو بوون بۆ هەڵواسینی حەمید بەلوچ و لە زیندانی (مەچ) دا لەسێدارەدراو ناوی چووە مێژووەوە. حەمید بەلوچ تەنیا شەهیدێکی ئەم ڕێکخراوەنییە بەڵکو لە سەرەتای دەست پێکردنی خەباتی ڕامیاری و بزووتنەوەی ئازادیخوازانەی بەلوچ ڕێکخراوی خوێندکارانی بەلوچ شەهیدی زۆریان داوە بۆ نموونە (مەجید بەلوچ، عومەر بەلوچ، عامرشا بەلوچ، لە ساڵی ١٩٧٤ شەهیدکران و اسداللە مینگل لە ساڵی ١٩٧٦ شەهید کراو نذر محمدشەهی و زۆری تریش لە ساڵی ١٩٧٧ دا شەهیدکران.

خوێندکارانی بەلوچ لە ئاستی مەسەلەکەی حەمیدبەلوچ دا بێدەنگ نەبوون.. لە زۆربەی شارەکان دا کەوتنە خۆپیشاندان و مان گرتن. لەم مانگرتنەدا (٤٠٠) قوتابی گیراو لە زیندان توند کران.. کەریم بەلوچ ولالجان بۆ ماوەی ٢٥ ساڵ حوکم دران و ئەوانی تریش لە ساڵێکەوە بۆ پێنج ساڵ خرانە زیندانەوە، هەروەها حکومەتی کۆنەپەرستی ئیسلام ئاباد (١٠) قوتابی لە زانکۆکان دا دەرکرد وەکو (دکتۆر ئەکبەرو نەواز بەلوچ و جەنگیز کورد).

خەباتی گەلی بەلوچ تاکو ئیمڕۆ چۆکی بۆ هێزە کۆنەپەرستەکان دانەداوە و خەباتێکی نەتەوایەتی پێشکەوتنخوازانەیە و دژی چەوساندنەوەی نەتەوایەتی و چینایەتی ڕاوەستاوە.

بروانە لاپەرە 14



# لەڕاپۆرتی سیاسی پارتی دیموکراتی گەلی کوردستانەوە

## لەرامیاری شۆڕشگێڕانەی پارتی پێشڕەو

گەلەکەمان بەدەست دواکەوتنەوە دەناڵێنی و شێوازو پەیرەو و ڕێبازە هاوچەرخە شۆڕشگێڕی و زانستییەکانیش بەشێوەیەکی فراوان بڵاو نەبۆتەوە، نەک تەنیا لەناو ڕیزەکانی جەماوەردا، بەڵکو لەناو ڕیزی ئەوانەش دا کە کاری شۆڕشگێڕانە دەکەن یان چەندەها ساڵە سەرکردایەتی ئەو کارە دەکەن. لەبەر ئەوە کاری ئامادەکردن کە بریتییە لە پەروەردەکردنی کادرو ووشیارکردنەوەی جەماوەر و ئەنجام دانی کاری شۆڕشگێڕانە لە بارو دۆخی دروست دا کارێکی زۆر گرنگە.

هەروەها زۆر جار هەل ڕێک دەکەوێ بۆ خەباتی ئاشتییانەی جەماوەریی، کە پێویستە سوودی لێ وەربگیرێ بۆپتەوکردنی خەبات و لاواز کردنی دوژمن و بەدیهێنانی دەستکەوت بۆ جەماوەری میللی. نموونەی ئەم بابەتانە ـ ش. مانگرتنی کرێکاران و ڕاپەڕینی میللی و خۆپیشاندان و بڵاوکردنەوەی ئەدەبی شۆڕشگێڕانەو هەستانە بە چالاکی کۆمەڵایەتی و ڕۆشنبیری. دەتوانرێ ساڵانی (١٩٧٠ـ ١٩٧٤) دابنرێ بە ماوەی خەباتی ئاشتیخوازانە کە لە ئەنجامی خەباتی چەکدارانەی ساڵانی پێشوودا هاتە کایەوە، هەرچەند کە پلانێکی ناوەندی نەبوو بۆ ئەم خەباتە جەماوەرییەی ئەوماوەیە بەڵام دەستپێشکەری هەندێ لە ئەندامانی سەرکردایەتی و ڕێکخراوە پارتایەتییەکان و جەماوەر خۆی تا ڕادەیەکی باش بەشداری کرد لە پێکەوە بوون و یەکخستنی بزووتنەوەی شۆڕشگێڕانە لە شارو گوندەکان و شێوەی نیشتمانێتی و جەماوەرێتی یەکگرتووی بەخشی بە نەتەوەی کورد. کە ئەوەش دەستکەوتێکی کەم نەبوو هەرچەند لەسەر پلانێکی ناوەندی نەبوو یان لەسەر بناغەی ووشیار کردنەوەی جەماوەر ی ڕەنجدەر نەبوو بەبەرژەوەندییە چینایەتییەکانی.

ئێستا ڕاپەڕینێکی شۆڕشگێڕانەی پێشکەوتنخوازانە ڕەچاو دەکرێ لە بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد لە تورکیا کە لەسەرەتای شەستەکانەوە سەری هەڵدا و لەسەرەتای حەفتاکان دا کاتێ کودەتا سەربازییەکە بۆ ماوەیەکی کەم خامۆش بوو ، پاشان سەری بەرز کردەوەو بەردەوام بوو لە گەشەکردن وفراوانبوون داتا ئەیلوولی ساڵی ١٩٨٠ . لەو ماوەیەدا لە کوردستانی تورکیا ، شۆڕش و ڕاپەڕینی چەکدارانە بەرپا نەبوو بەڵکو ڕێکخراوی پارتایەتی و جەماوەری دروست بوو ، ئەدەبی شۆڕشگێڕانە بڵاوکرایەوە ، ڕۆژنامەگەری شۆڕشگێڕانە ڕاپەڕی و چەندەها کرداری جۆربەجۆری جەماوەرییانە پیادەکران . گرنگ ئەوەیە ئەم خەباتە ئاشتییانە بەسەرکردایەتی پارت و ڕێکخراوە خاوەن ئایدۆلۆژییە نیشتمانیی و پێشکەوتنخوازییەکان ئەنجام درا ، ئەوەش بووە هۆی ڕەنگدانەوەی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد لە ڕەوتێکی شۆڕشگێڕانەی سەرتاپایی دا کە دوژمنان بتۆقێنێ و دۆستان حیسابی بۆبکەن ، لەبارودۆخێکی جیو - سیاسی ئاڵۆزی وەک ئەوەی چوار دەوری بزووتنەوەی کوردی تەنیوە . دەتوانین بە دڵنیاییەوە بڵێین تا بوار هەبێ چاکترە بەردەوامی بدرێ بە خەباتی ئاشتیخوازانەی شۆڕشگێڕانە .

بەڵام لەسەر پارتی پێشڕەوە کە پەنا بباتە بەر خەباتی شۆڕشگێڕانەی چەکداری گەر دەسەڵاتداران پەنایان بردە بەر سەرکوت کردنی بزووتنەوەی کوردی و بواریان نەدا بە پەرەسەندن و بەرەوپێشەوە چوون و ڕێگای کارکردنیان لێ بەست . گەر پارتییەکە قەناعەتی هەبوو کە جەماوەر ئەو کارە پەسەند دەکەن و دەتوانرێ پێداویستییە مادییەکانی خەباتی چەکدارانەی درێژخایەن دەستەبەر بکرێ بەبێ پشت بەستن بە دوژمنان و کۆنەپەرستان و ڕەگەزپەرستان . لێرەدا لێهاتوویی سەرکردایەتی دەردەکەوێ کە مل کەچی ئارەزووە تایبەتییەکانی خۆی نەبێ و خۆی نەخاتە گێژاوی ( موغامەرە )کردن و ئاگر بازییەوە ، بەڵکو دەبێ بزانێ و هەست بکا کە جەماوەر بەڕاستی پەنا بردنە بەر خەباتی چەکدارانە قبووڵ دەکات . زۆر لە تاقیکردنەوە شۆڕشگێڕییەکان ، بەتاقیکردنەوەکانی شۆڕشی (ئەیلوول) و (٢١/گولان) یشەوە ، لەم چەرخە پڕ لە شۆڕشەدا بوونەتە هۆی ڕوونکردنەوە و ئاشکراکردنی ئەوەی کە یەکێ لە پێوانە بنەڕەتییەکان بۆ پێوانی شۆڕشگێڕێتی جەماوەرو ئامادەبوونی بۆ شۆڕشی چەکداری ئەمەیە کە کاتێ دەسەڵاتدارە کۆنەپەرستەکان دەیانەوی سەرکوت کردن و تیرۆروچەوسانەوە بەسەر جەماوەری گەل دا بسەپێنن ئەم جەماوەرە ئەوە ڕەفز دەکات و پەنا دەباتە بەر یاخی بوون . واتە دەسەڵاتداران هەوڵی گێڕانەوەی کۆمەڵگا دەدەن بەرەو دواوە ، بەڵام جەماوەر گەڕانەوە ڕەفز دەکات . دیسانەوە بۆ پارتی پێشڕەو هەیە پەنا بباتە بەر خەباتی چەکدارانە لە کاتی گۆڕانی بارو دۆخی جیو - سیاسی لەبەرژەوەندی بزووتنەوەی

ئازادیخوازی کوردو سووربوونی دەسەڵاتداران لەبەر گوێ نەدان بە مافە نیشتمانیی و دیموکراسییەکانی گەلەکەمان ، بەڵام جارێکی تریش دەبێ دڵنیا بین لە ئامادەیی جەماوەر بۆ خەباتی چەکدارانە .

## کۆنگرەی چوارەمی پارتی کۆمۆنیستی عێراق

لە کوردستانی ئازادکراو ، لەچیا بەرزو بڵندەکانی نیشتمان و لەگەرمەی خەباتی بێ ووچان دا .. لەژێر دروشمی ( لەپێناوی ڕاگرتنی دەست بەجێی جەنگ و ڕووخاندنی دیکتاتۆریی فاشیزمی و بەدیهێنانی جێگری دیموکراسی )دا پارتی کۆمۆنیستی عێراق لە ١٠- ١٥/ تشرینی دووەمی /١٩٨٥ چوارەمین کۆنگرەی خۆی ئەنجام دا .

هاوڕێی خەباتگێڕ عەزیز محەممەد سکرتێری یەکەمی کۆمیتەی ناوەندی ، لەسەرەتادا بە ووتارێک کۆنگرەکەی کردەوە ، دەربارەی گرنگییەتی ئەم کۆنگرەیەو شی کردنەوەی باری سیاسی و جۆری خەباتی حیزب بەتایبەتی پاش دەست دانە خەباتی چەکدارانە ، بەدرێژی باسی جەنگی ئێران و عێراق ی کردو لەگەڵ پێویستی ڕاگرتنی دەست بەجێی ئەوجەنگە .

کۆنگرە ڕاپۆرتێکی سیاسی و بەرنامەیەکی نوێ و هەڵسەنگاندنێکی خەباتی ساڵانی ١٩٦٨- ١٩٧٨ بڵاوکردۆتەوە ... کۆمیتەی ناوەندی نوێ هەڵبژێردراو کۆمیتەی ناوەندیش پاش کۆبونەوەیەک ئەندامانی مەکتەبی سیاسی یان دیاریکرد و هاوڕێ عەزیز محەممەد هەڵبژێردرایەوە بە سکرتێری یەکەمی پارتی کۆمۆنیستی عێراق .

# مەرگی دیکتاتۆر

ئاوات

دەشێ ئەمساڵ ساڵەکەی نەهات و قات وقڕی بێ بۆ دیکتاتۆرە گەنیوەکانی جیهان و یەک بەدوای یەکدا باروبارگەیان بپێچنەوەو بە ڕووی ڕەش و خۆڵ و دۆ بەسەرکراودا ملیان بشکێنن و ڕابووردوویەکی پڕ لە شەرم و شەرمەزاری لەدوای خۆیانەوە جێبهێڵن ...

سەرەتای ئەمساڵ، لەچەند جێگایەک تەختی پواو ورزیوی زۆرداران بەڕەشەبای تووڕەیی و هەلچوونی گەلانی ژێر دەستە هاتۆتەلەرزین و داتەپین و ڕمان و هەرەس هێنان و ڕۆچوون بەناخی زەوی دا ...

ئەوەتا دوڤالیە، پاش پانزە ساڵی ڕەبەق لەزۆرو زۆرداری و سەرکوتکردن و داپڵۆسین و کوشتن و بڕینی گەلی هەژارو بێ دەسەڵاتی ئەو دورگە بچوکەیکەوتۆتە دەریای کاریبیەوەکە بە "هاییتی" ناسراوە .. دوڤالیەی ئاوارەو سەرگەردان بەم جیهانە پان وپۆڕەدا دەسوڕێتەوەو یەکە یەکە لە دەروازەی فرۆکەخانەو سەر سنووری کۆنە دۆستەکانی دەدات بێ ئەوەی کەسێ بەزەیی پیابێتەوەو لایەکیلێبکاتەوەودالدەیەکی بدا.

هێشتا دەنگوباسی دوڤالیەی دەرپەڕێنراو سارد نەبۆتەوە وا مارکۆس و خاتوو ئەمێلدای خێزانی بەخۆیان و جانتا پڕ لە خشڵوگەوهەرو زێرو دۆلارو جۆرەها تالانی ترەوە دورگە مەزن وهەزارپارچەی فیلیپین جێدەهێڵن وسەری خۆیان هەلدەگرن، بەرەو نادیار مل دەنێن، بیست ساڵ چەوساندنەوەو زۆرداریو دیکتاتۆری دەنێنە گۆڕ.

ساڵێکیش لەمەوبەر ئەو "نومەیری" یەی سۆدانی کردبوو بەخۆڵەمێش وەک سۆموٚزای نیکاراگوا یا وەک ئەو حەمەڕەزاشایەی ببوو بەپۆلیسی ئیمپریالیزمی جیهانی لەناوچەکەدا و ناوی خۆی نابوو شای هەمووشاکان، ئێرانی کردبووە قەفەزێکی بچووک بۆ سەرتاپای خەڵکی ئێران، ئەویش چووە زبڵدانی مێژووەوە.

هێشتا مارکۆس وئەمێلدا .. لەگەڵ دوڤالیە کونجێکی ئارامیان دەست نەکەوتووە بۆ حەوانەوە، ئەوەتا ئەو "قاهیرە"یەی ساداتی نایە چاڵ، دیسانەوە هاتۆتە ژان گرتنو تەختی




دیکتاتۆری میسری لەق کردووە ...

دەشێ ئەمساڵ نۆرەی مەرگی ڕژێمە ڕەش داگیرساوەکەی دیکتاتۆری عێراقبێ کە بۆ شانزە ساڵ دەچێ سەرو خواری عێراقی لە خوێن و ئاگرو ئاسن دا نقوم کردووە، جەنگێکی بێ کۆتایی بۆ بنەبڕکردن و ڕیشەکێشانی کورد و تەختکردنی کوردستان بەرپا کردووە.. کە شەشەم ساڵە عێراقی کردوتە دۆزەخ ولە جەنگێکی سەرشێتانەی وێرانکاری دا لەبەر هێشتنەوەی تەختە شلۆقەکەی تەڕو ووشک پێکەوە دەسوتێنێ و هاوار هاوارێتی گەر عێراق چۆڵ بکەم، دوای هەموو عێراقییەکان چۆڵی دەکەم ..

شانزەساڵە عێراق وەک جارانی ئێران و سۆدان و هاییتی و فیلیپین و نیکاراگوا، وەک ئێستای چیلی وباشووری ئەفریقیاو... بەدەست دیکتاتۆرییەوە دەناڵێنێ و خەبات دەکات بۆ گەیشتن بە ئازادی و ژیان بەسەربەرزی.

# خوێندن لە ژێر چەپۆکی فاشیزم دا

## «سیاسەتی ناوچە داخراوەکان و بێبەری کردن لە مافی خوێندن»

د. بلیغ عبدالسلام

لەروژنامەی ( الغد الثقافی)یەوە کراوە بەکوردی -١-

لەعێراق رژێمێکی سەرکوتکەر دەستی گرتووە بەسەر هەموو ئاستەکانی خوێندن دا ، ئەم سەرکوتکردنەوەک پەتا لە نیوەی دووەمی حەفتاکاندا تەشەنەی کردودوای دانیشتنی ( صدام حسین) لەسەر تەختی سەرۆکایەتی لەتەموزی ١٩٧٩ و هەڵگیرساندنی جەنگە دوژمنکارییەکەی دژی ئێران لە ئەیلوولی ١٩٨٠ توندو تیژتر بوو.

رژێمی عێراق لەبواری خوێندندا ئەم سیستەمەی سەپاند بەو سیفەتەی کە بەشێکە لە پرۆژەیەکی فراوان بۆ سەپاندنی حوکمی دیکتاتۆری بەسەر تەواوی ژیانی کۆمەڵایەتی و رۆشنبیری و رامیاری و ئابووری وولات .

هەڵسورێنەرانی کودەتای ١٩٦٨، بەئامانجی دەستەبەرکردنی بناغەیەک بۆ دەسەڵاتداریان کەبەهۆیەوە بتوانن بەتەواوی دەست بگرن بەسەر وولات دا بریاریان داوە بەپلەی یەکەم بایەخ بدرێت بەهێزی چەکدارو دەزگا سیخورییەکان کە پاککراونەتەوەلەهەموو ئەوانەی دەشێ مەترسی دروست بکەن بۆسەر رژێمەکەیان و کردویانن بە جۆرە دەزگایەک کە بەشێوەیەکی رەها ملیان بۆ کەچ کردوون .

لەپاش ئەوە دەسەڵاتداری بریاری دا کە ئەم ( نموونەیە ) فراوانتر بکات تا بواری خوێندنیش بگرێتەوە . رایگەیاند کە خویندن لە قۆناغەکانی سەرەتایی و ئامادەیی و پیشەیی دا دادەنرێ بە (ناوچەداخراوەکان ) یان قەدەغەکراوەکان، ( صدام حسین ) لەناوەراستی حەفتاکان دا پەنجەی راکێشا کە نەوەی پێشوو ( لەدەستمان دەرچووە )بەڵام نەوەی نوێ لەناو ( چنگمانایە ) و رێگای پێ نادەین(لە دەستمان بچێ ) ، بەڵکو پێویستە بە گوێرەی (بیروباوەری سۆسیالیستی نەتەوەییمان) پەروەردە بکرێ .

بەبەعسی کردن تایبەت بوو بەمامۆستایان و ئەندامانی تری سەربەپەروەردەو فێرکردن و قوتابیان و خوێندکاران و بەرنامەکانی خوێندن . مامۆستایان ناچارکران کە بچنە ریزی بەعسی عێراق تا رێگایان پێ بدرێ بە مامۆستایی بمێننەوە . گرتن و ئازاردانی درندانە چارەنووسی ئەو ماموستایانە بوو کە رازی نەدەبوون بە ئیمزاکردنی ئیستیمارەی بەڵین دان ( التعهد ) یان( البراءه ) لە پارتییە سیاسییەکانی تر کە هێشتا بەئاشکرا چالاکییان دەنواند. ژمارەیەکی زۆر لە مامۆستایان ناچار بوون دەست بەردار بن لە پیشەو شوێنی نیشتەجێبوونیان،نەک تەنیا ئەوە بەڵکو بگرە تا دەگاتە کۆچ کردن بۆ دەرەوەی شار و راکردن لەدەست ئەم کارە ناهەموارانە .

بەووتەبێپێزەکانی ( سەرکردە ) ژەهر دەئاخننە مێشکی لاوان .. کتێبی قوتابخانەکان بەبێ کۆتایی ناوی (صدام) دووبارەو چەندبارە دەکەنەوە لەهەموو بابەتەکان دا ، لەرێزمانی عەرەبی دا ، لەشیعرو ئەدەب ، لەمێژوو وزانستە کۆمەڵایەتییەکان دا ... هتد. کتێبەکانی خوێندن ناوی نەتەوەکانی تری عێراقناهێنێ گەلی کوردو تورکمان و سریان بەجۆرێک پشت گوێ خراون زۆر بەدەگمەن لە کتێبی مێژوو و وانەکانی تردا ناویان دەهێنرێ . برایەتی نێوان گەلان لە فەرهەنگی رژێم دا هیچ جێگای نییە . جارێک دیکتاتۆر داوای کردبوو کەباسی بوونی ( میللەتی کورد یا نەتەوەی کورد) نەکرێ تا ( هەستی یەکگرتنی میللەتەکەیان و

دامەزراندنی دەوڵەتێکی یەکگرتووی وەک ئەو یەکگرتنەی ئێمە داوای دەکەین بۆ میللەتی عەرەب لەناو ئەوانیشدا پەرەنەسێنێ .

**- بەبەعسی کردنی خوێندنی بالا -**

بەبەعسی کردنی زانکۆو پەیمانگەکانی خوێندنی بالابەچەندەها ڕێگای پڕ فێڵ وتەڵەکە بازی تر ئەنجام درا . لەسەرەتای ساڵی **١٩٧٦** وەزیری خوێندنی بالاو لێکۆڵینەوەی زانستی ئەو کاتە ڕایگەیاند (( شۆڕش بڕیاری داوە کە بچێتە ناو زانکۆکان )) ئەم وەزیرە کە غانم عبدالجلیل بوویەکێک بوو لەهەرە نزیکەکان لە "صدام" کەساڵی ١٩٧٩ لەسێدارەی دا . لەساڵی ١٩٧٧وەزیری نوێ بەئاشکرا تر هەڕەشەی لە ئەنجومەنی خوێندن وماموستایانی زانکۆ کرد کەئەگەر نەچنە ناو ڕیزەکانی حیزبی ڕژێم ئەوا دەردەکرێن . ئەم وەزیرە ڕایگەیاند کە لەمەو دوا هیچ خوێندکارێک ئەگەر ئەندامی حیزبی ڕژێم نەبێ لەزانکۆ وەرناگیرێ .

لەلایەکی تریشەوە ، پاڵەپەستۆیەکیزۆربەکار هێنرا لەسەر ئەندامانی ئەنجومەنی خوێندنبۆ چوونە ناو ڕیزەکانی حیزبی دەسەلاتدار . ڕژێم چەند جار بەئاشکرا نیازی خۆی دەربڕیوە لەم بارەیەوە . ژمارەیەک لە ئەکادیمییەکان دەرکراون وچەندەهای تر گوێزراونەتەوە بۆسەر کارو فەرمانی جیاوازی سەر بەوەزارەتەکانیتر کەزۆربەی جار پەیوەندی بە بواریخوێندنەوە نییە ( لەگەڵ هێنانەخوارەوەی پلەو پایەیان ) ، هەندێکی تریش خانەنشین کراون . بەم جۆرە سەدان ئەندامی ئەنجومەنی خوێندن دوور خراونەتەوە .

**- هێرشی نەخوێندەواران بۆ زانکۆکان -**

پێش ساڵی **١٩٦٨** سەرۆکی بەشەکان بەڕێگای هەڵبژاردن دادەنران ، کەگشت ئەندامانی ئەنجومەنیخوێندن تیا بەشدار دەبوون، بەلام خێرا ئەم سیستەمی هەڵبژاردنە یان راویژ کارییەهەڵوەشێنرایەوەو سەرۆکی زانکۆ بوو بە خاوەن ماف بۆ دامەزراندنی سەرۆکیبەشەکان لەسەر داخوازی عەمیدی کۆلیژەکان . لە ناوەڕاستی حەفتاکانەوە دامەزراندن لە پلە بەرزەکاندا وەک ( عەمید ،سەرۆکی بەش،سەرۆکی مەڵبەندەکانی لێکۆڵینەوە ، هتد.. ) تەرخان کرا بۆ ئەندامانی حیزبی خاوەن دەسەلاتە بە بێ گوێ دانە لێهاتوویی و پلەی زانستی و ئەکادیمی . لەزۆربەی حاڵەتەکانیشدا ئەوانەی لەم کارانەدا دامەزراون کەمترین ڕادەی لێهاتوویی و پلەی زانستی وئەکادیمیان نییەو خاوەنی شارەزایی نین لە کاری زانکۆیی دا .

**- قۆناغێکی نوێی بەبەعسی کردن -**

بەبەعسی کردنی خوێندن چووە ناو قۆناغێکی نوێوە ، ئەوەش بە دەرچوونی ئەو بڕیارەی لە تشرینی دووەمی ١٩٧٥ دا درا دەربارەی سەر لەنوێ ڕێکخستنەوەی کۆلیژەکانی پەروەردە لە سەر" بنەمای نوێ " مەبەستیش لەم "بنەما نوێیانە" دەستەبەرکردنی کۆلیژەکان بوو بۆ دروستکردنی ماموستایانکەنەوەی نوێ بە گیانی شۆڤێنیزمی ڕەگەزپەرستانە پەروەردە بکەن . بڕیاردرا لەم کۆلیژانەدا هیچ خوێندکارێک وەرنەگیرێت گەر ئەندام نەبێ لە حیزبی دەسەلاتداردا . لێرەوە ناوی ( کۆلیژە داخراوەکان ) هاتۆتە کایەوە.لە ڕاستیدا تەنها ئەم کۆلیژانە کۆلیژی داخراو نەبوون ، بەڵکو جێ بەجێ کردنی ئەو بڕیارە باڵی درێژ کرد بەسەر پەیمانگەی هونەرە جوانەکان و پەیمانگەیماموستایانیشدا .

لە تشرینی یەکەمی ١٩٧٧ سیاسەتی (ناوچە داخراوەکان) پەرەی سەند تا گەیشتە سەر شێوەی قبوول کردن لە خوێندنی بالا. ئەندامێتی لە حیزبی دەسەلاتداردا بوو بە مەرجێک بۆ وەرگرتنی خوێندکار لە خوێندنی بالا. بە زانکۆکان ڕاگەیەندرا کە بڕیاری وەرگرتن یان وەرنەگرتنی خوێندکاران لەم بوارەدا لە دەسەلاتی زانکۆدا نیە ، بەڵکو دەبێ لیستەی پاڵێوراوان بەرز بکرێتەوە بۆ وەزارەت بۆ بڕیاردان لەسەری ، هەروەها دیسان ناردنی

خوێندکاران بۆدەرەوەی عێراق بوو بە (ناوچەی داخراو) نەریتی جارانی خوێندنگەکانی عێراق ئەوەبوو کە پێشبرکێ هەبێ لەناو خوێندکاران بۆ بەدەستهێنانی زەمالەی حکومەتی لە هەموو ئەو بوارانەداکە وڵات پێویستی پێیان هەبوو. ژمارەی خوێندکارانی پێویست ڕادەگەیەنرا، پاڵێوراوان دیاری دەکران، سەرکەوتوترین خوێندکاران هەڵدەبژێردران بۆ ئەممەبەستە.. بەڵام لەژێر سایەی ڕژێمی (صدام حسین) داگۆڕ کرا.. ئێستا زەمالە بەبێ ڕاگەیاندنو بەبێ پێشبرکێ و بەبێ گوێ دانە هیچ لێهاتوویەکی ئەکادیمی دیاری دەکرێت.

لەسەرەتای ساڵی ١٩٧٨ هێرشی بەبەعسی کردنی زانکۆکان چووە هێرشی بەبەعسی کردنی زانکۆکان چووە قوناخێکی دژوار، بڕیار درا کەنەک تەنها کۆلیژی پەروەردە بەڵکو گشت کۆلیژەکان بوون( بەناوچەی داخراو) ئەمەش دەستدرێژییەکی زەق وناقۆڵایە بۆسەر مافی خوێندن کەلە بڵاوکراوەی گشتی مافی مرۆڤ وهەر - دوو بەرنامەی نێو دەوڵەتان دەربارەی مافە مەدەنی و سیاسی و ئابووری و کۆمەڵایەتیەکان دانی پیانراوە. عێراق یەکێکە لەو دەوڵەتا- نەی کە یەکەمجار ئەو دووبەرنامەیەیان ئیمزا کردووە. ئایا ئەمە گاڵتەپێکردن نییە بە مافی مرۆڤ!

لەگشت کۆلیژەکانیشدا کۆمیتەی لێکۆڵینەوە و تیرۆر پێکهێنرا لە لێپرساوانی یەکێتی نیشتمانی قوتابیان و ئەندامە بەعسیەکانی ناو ئەنجومەنی خوێندن و هەروەها بەئاشکرا پیاوانی (ئەمن) یش بەشداریان تیا کردووە. لەناو سنووری زانکوکاندا لێکۆڵینەوەکانیان دەستی پێکرد بەبێ گوێدانە ڕێزی تایبەتی زانکۆکان. لێرەدا ئامانجیان لێکۆڵینەوە بوو لە بیرو باوەڕی سیاسی هەندێ خوێندکاری دیاریکراو بۆ گەڕان بەدوای هۆی نەهاتنیان بۆناو حیزبی دەسەڵاتدار. ئەو خوێندکارانەدوو ڕێگایان خراوەتە بەردەم، یان دەستهەڵگرتن لەبیرو باوەڕەکانیان یان زیندانەکانی(ئەمن) و چاوەڕێ کردنی چارەنووسی نادیار، پەیوەندی نێوان خوێندکاران و ئەنجوومەنی خوێندن ،بەلای سەرکردەکانی یەکێتی نیشتمانی قوتابیانەوە، پەیوەندییەکی (تیرۆریستانەیە) واتە ئەنجومەنی خوێندن تیرۆر بەکار دەهێنێ دژی خوێندکاران. لێرەوە مامۆستایان بەتاک و بە کۆمەل بوون بە بنێشتە خۆشەی (خەباتی) ئەم یەکێتییەو تۆمارکردنی (سەرکەوتن) بەسەریاندا بوو بەیەکێک لە ئامانجە بنەڕەتییەکانی یەکێتی بە نیازی پەیدا کردنی (جەماوەریتی) لەناو خوێندکاراندا.

### - بەعەرەبی کردنی بەرنامەکان و زانکۆ کوردییەکە -

لەکۆتایی شوباتی ١٩٧٦ دا سەرۆک زانکۆکان و عەمیدەکان و سەرۆکی بەشەکان وژمارە- یەکی هەڵبژاردە لەمامۆستایان و لێپرساوانی یەکێتی نیشتمانی قوتابیان بانگکران بۆ کۆبونەوەیەک کە بە ئامۆژگاری وەزارەتی خوێندنی باڵا و لێکۆڵینەوەی زانستی ساز کرابوو بەنیازی مەبەستی پروپاگەندەیی کۆبوونەوەکە ناونرا (کۆنگرە) ئامادەبووەکان گوێیان شل کرد بۆ وەزیر کە (سووربوونی) شۆڕشی ڕاگەیاند لەسەر چوونە ناو زانکۆکانو یەکخستنی بەرنامەکان، هەر لەبەرنامەی خوێندنی سەرەتاییەوە تا دەگاتە دکتۆرا و بە عەرەبی کردنی خوێندنی باڵا بۆ ئەوەی بە یەکجاری خوێندنی باڵا لەناوببەن. دوا بە دوای وەزیر سەرۆکی کۆمیتەیەکی تایبەتی کە بەبڕیاری (دەسەلاتی باڵا) پێکهێنرابوو کەوتە قسەکردن و دەقی کۆمەڵە بڕیارێکی خوێندەوە دەربارەی یەکخستنی بەرنامەکان و بەعەرەبی کردنی خوێندنی باڵا. بەئامادە بووەکان ڕاگەیاندرا کە ئەم بڕیارانە بۆ گفتوگۆ لەسەرکردن نیە و تەنها ڕێگا دەدرێ بەپرسکردن دەربارەی شی کردنەوەی ئەو لایەنانەی ڕوون نین. بڕیارەکان دەربارەی دانان و وەرگێڕانی بەرنامەی هەموو

بابەتەکان بۆ بۆ عەرەبی بەمەرجێ لەماوەی چوار پێنج ساڵدا یەکبخرێن و بکرێن بە عەرەبی .

بەلام لەبەر هەڵپەو پەلەکوتێ و کاری کوێرانەو هەراو هوریای ڕاگەیاندنی و سنگ دەرپەڕاندن هیچیان بۆ جێبەجێ نەکرا ...... کۆمیتە تایبەتییەکەش بەڕوو هەڵماڵراوییەوە ئەو پێشنیارانەی لە ڕاپۆرتەکەدا بوو بە هەنگاوێکی ( نەمر )ی ژمارد لە خوێندنی بالادا .

دژوارترین مەبەستی ئەم کۆنگرەیە بە عەرەبی کردنی زانکۆی سلێمانی بوو لە کوردستانی عێراق، ئەم زانکۆیە کەوەک زانکۆ- یەکی کوردی لەکۆتایی شەستەکاندا دامەزرا بوو بۆ دەستەبەرکردنی پێداویستییەکانی ناوچەکە کە بەجۆرێک بگونجێ لەگەڵ ئاوات و خواستەکانی گەلی کورد و ڕۆشنبیری نەتەوەیی کوردی، بەلام هەر لە ساڵی **١٩٧٦** ەوە ناوی (کوردی) لە کاروبارە ڕەسمییەکان دانەما فەرمان درا بەو (کۆنگرەیە کە بەعەرەبی کردن دەبێ بەردەوام بەرەو پێشەوە بڕوات لە هەموو زانکۆکاندا کە زانکۆی ( سلێمانی)یش دەگرێتەوە (کۆمیتە ) لێپرسراوەکە ڕایگەیاند کە بە هیچ جۆرێک ڕازی نییە کە خوێندنی بالا بەزمانی کوردی بێت .

دوای ئەم (کۆنگرە )یە زانکۆی سلێمانی دووچاری بێزار کردنێکی لەجاران توندوتیژ تر بوو . لەساڵی ١٩٨١ بڕیار درا ئەم زانکۆیە بگوێزرێتەوە بۆ هەولێر لەبەر ( تێکچوونی باری ئەمنی ) لەئەنجامی پەرە سەندنی چالاکی پێشمەرگەو هێزەنیشتمانییەکان لە ناوچەکەدا . ئاسایە کەکاری سەرکوت کردن دژی دامەزراوە زانستییەکانی عێراق لە کوردستان توندو تیژ تر بێ لەبەر هەڵوێستی شۆڤێنی و ڕەگەز پەرستانەی دەسەلاتدارانی عێراق دژی گەلی کورد .

**- بەخشینی بڕوانامە بەپێی مەرسومی جەمهوری -**

ڕژێمی ( صدام ) هەمیشە دەم بە هاوارە دەربارەی خۆشویستنی زانست و ڕۆشنبیری و هونەرو خوێندن و سووربوونی لەسەر بەرز کردنەوەی ئاستی خویندن و هاندانی زانکۆکان بۆ خستنە کاری هەموو توانایەک لە پێناوی هێنانەدی ئەم ئامانجانەدا . بەلام ئاخۆ ئەم خۆشەویستییە چلۆن خۆی دەنوێنێ؟

بەبەخشینی بڕوانامەی زانکۆیی بە خوێندکارە دەرنەچووەکانی سەربەیەکێتی نیشتمانی قوتابیان و هاو چەشنەکانیان لەڕێی ( مەرسومی جەمهوری) یەوە خۆی دەنوێنێ...ئەم (مەرسوم)انە تا ئەم دوایییەش لە گۆڤاری ( الوقائع العراقیە ) دا بلاودەکرایەوە .

هەروەها ڕێز گرتن لە زانست و ڕۆشنبیری لە بەزور سەپاندنی وەرگرتنی پیاوانی ئەمن و ئیستخبارات و پۆلیس لەزانکۆکاندا خۆی دەنوێنی بەبێ گوێدانە مەرجەکانی وەرگرتنی خوێندکار و یاسا ئاساییەکانی زانکۆ .

* * *

ئاشکرایە ئەو هێرشەی ڕژێمی ( صدام )کردیە سەر موعارەزەی میللی لەعێراق بووەهۆی ئاوارە کردنی نزیکەی دووسەد هەزار هاووڵاتی لە بارو دۆخێکی زۆر سەخت و دژواردا لەنێوان ئاوارە بووەکاندا ژمارەیەکی زۆر قوتابی و مامۆستایان و پسپۆڕانی زانکۆ هەبوون ... هەروەها لەسەرئەنجامی توند بوونی هێرشی داپلۆسین و سەرکوت کردنی گشت هێزەکانی موعارەزە ژمارەیەکی زۆری ئەکادیمییەکان وولاتیان جێهێشت ، سەرەڕای ئەوەش ژمارەیەکی زۆری ئەوانەی لەدەرەوەی وولات خوێندویانە و خوێندنیان تەواو کردووە مانەوەیان لەدەرەوە بەباشتر زانی وەک لەگەڕانەوە.. مافی هاونیشتمانییەتی عێراقی لەوئەکادیمیانە سەندرایەوەکە عێراقیان جێهێشتووەتەنانەت پاسپۆرتەکانیشیان لێ سەندراوەتەوەو ماڵ و سامانەکانیشیان زەوت کراوەو فەرمان دەرچووە بۆ گرتنیان لەکاتی گەڕانەوەیان دا بۆ ناو عێراق . هەریەکێکیش لەوان گەر لە پێشدا

ئەندامی حیزبی دەسەڵاتدار بووبێ ئەوا فەرمانی لەسێدارەدانیش چاوەڕوانی دەکاتە.. هێشتا چەندەها ئەکادیمی تر بەهەموو ڕێگایەک هەوڵ دەدەن وولات جێبهێڵن و لەعێراق بچنە دەرەوە کە ( صدام ) کردویەتی بە زیندانێکی مەزن .

جەنگیش کە "صدام " هەڵیگیرسان دژیئێران گەورەترین کارەساتە کە دووچاری گەلی عێراق بووە ، ڕژێم تەنیا بەوە نەوەستا کە سەربازەکانی بەکوشت داوە ، بەڵکو داوای"تطوع" دەکات بۆ چوونە دۆزەخی شەڕ ، شێوازی بە زۆر سەرباز گرتنی سەردەمی عوسمانییەکان هەر وەک گەشت و گوزار وایە لەچاو شێوازەکانی دەسەڵاتدارانی عێراق بۆ ناچار کردنی هاونیشتمانیان بۆ ( تطوع ) .. تەنانەت "صدام " سێ ودووی لەوەش نەکرد کە ماموستا - یانی زانکۆ بانگ بکات وگلەییان لێ بکات و توانج و پلاریان تێ بگرێ چونکە کەمتەرخەمیان کردووە دەربارەی پیشاندانی حەماسەتی گەرم سەبارەت بە قادسیەکەی، سەرکردەزانکۆییەکان ناچار کران ، لەکاتی کارکردنی ڕەسمیدا ، بەرگی سەربازی بکەنە بەر.

عێراقییەکان بە دڵتەنگییەوە ووتەکانی " صدام " دێتەوە بیریان کە لە کۆڕی ( لێکۆڵینەوەی بەرنامەی کار دەربارەی خوێندن ) ووتبووی ئامادەیە دەرچووانیخوێندنی سەرەتایی دابمەزرێنی بە ماموستای زانکۆ ئەگەر بەدڵسۆزی خزمەتی ئەوو حیزبەکەی بکاو زۆر پێخوشحاڵ و شادمان دەبێ گەر ببینێ بەڕێوەبەری ئەمنی گشتی ببێ بە سەرۆکی زانکۆی بەغداد .

---

1)ڕۆژنامەی ( الغد الثقافی)پاشکۆی ڕۆژنامەی (الغد الدیمقراطی ) یە کە ئۆرگانی تەجەمموعی نیشتمانی عێراقە .

---

شیعر

# چیا

## ئەحمەد عارف

بابە، چی یە ئەم دیوارە
بۆ وا بەرزە،ناهەموارە
کێ دەتوانێ بەسەرکەوێ
بێ ماندو بوون هەمووشەوێ

* * *

ڕۆڵە ئەمە دیوار نی یە
ناهەموار و دزێو نی یە
ئەوە پەنای شێرپیاوانە
پشتی کوردە بۆ تەنگانە

* * *

ئەی بابە تۆ بۆ هاتووی
لەترسێ چی وا هەڵاتووی
کەی دێیتەوە . منیش وەکو
نازەنین بگرم دەستی تۆو
بۆ گەشت ،سەیران،ڕوو لەکێوان
لەبەربکەین جلکی جوان جوان

* * *

هەر دێمەوە بەرخۆلەکەم
ئەمجارەیان یاخود ئاڵا
یا کفنە برم بە بەرباڵا
هەر دێمەوە،دوا لوتکەی چیا
ماچ دەکەم وتف لە ڕیشی
ئەوەش دەکەم دەڵێ ئەشقیا

١٩٨٥/٨

---

### داوای لێبوردن

بەداخەوە لە ژمارە (١٠)ی پێشەنگ دا هەندێ هەڵەی چاپ ڕووی دابوو، بەتایبەتی لە وتارەکەیماموستا هەژار موکریانی کە سەبارەت بە ماموستاسدجادی نوسیبووی، هەروەها لە بابەتەکەی کاک جەمشید کوردۆ لەلاپەرە (٢٥) دا لەژێر وێنەی مافورەکەدا بەهەڵە ناونیشانێک نوسراوە کە ڕاستیەکەی ئەمەیە (نمونەی مافورێکی سەددی شانزە)داوای لێبوردن لە هەردوو نووسەری هێژا و لە خوێنەرانی بەرێز دەکەین .



# چاوپێکەوتن لەگەڵ شاعیر و نیشتمانپەروەری گەورەی کورد «هەژار»

١- ماموستا هەژار ئێوە یەکێکن لەو هەندە کەسەی لەسەرەتای جەنگی جیهانی دووەمەوە بەشداری خەباتی نیشتمانی بوون، بێ ئەوەی بکەونە زۆنگاوی خۆفرۆشتن و ناپاکی کردن.

أ- گرنگترین دەستکەوتە خەباتگێڕییەکانی ئەم سەردەمە چییە کەنیو سەدە دەبێ ؟

ب- مەزنترین ئەوهەڵانەی کە بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد تێی کەوتووە؟

ج-هۆی بە خێرایی بەرەو پێشەوە نەچوونی ئەم بزووتنەوەیە ؟

د- چۆن خەبات بەڕێوە دەچێ بە شێوەیەکی زانستییانەی دوور لە کەوتنە داوی دوژمنان؟

* مەبەست لە سەرەتاکانی جەنگی جیهانی دووەم ساڵەکانی چل تا چل وپێنجە. من لە ساڵی سی و شەشەوە هاتومەتە کۆڕی خەبات کردن، واتا تەمەنم شانزەساڵی بووە، چەند هاوبیریک لێک کۆ دەبوینەوەو بەئاواتی ئازادی کوردستان دەژیاین. بەرلەوە لە حیزبی ژ.ک (ژیانەوەی کورد) ببمە ئەندام لە دوو حیزبی دەڵەمە و نیوەونیوچڵ بەناوی حیزبی ئازادیخوازو حیزبی خاڵەمەلای داودی بەشدار بووم کەئێستا باسیان دەکۆڵەکەی تەڕیشدا نەماوە، لەسەرەتاکانی جەنگی جیهانی دووەمیشدا چومە ناو ژ.ک کە ئەو حیزبە داوای سەربەخۆ بونی هەموو کوردستانی مەزنی دەکرد ... وەختێ لەژێر تەوژمی باری سیاسی دا ژ.ک بە حیزبی دیموکراتی کوردستان ناونراو تەنیا داوای حوکمی زاتی کردن بۆ کوردستانی ئێران کرابە ئارمانج. من لەسەر عەقیدەی - ژ.ک - خۆم مام و ئیتر کارتی حیزبەکەو تائێستاش کارتی ئەندامەتی هیچ حیزبێکم وەرنەگرتووە.

بیرو بڕوای کوردایەتی من لەوەندەدا خۆلاصە دەبێتەوە کە کورد گەلێکی سەربەخۆیە ولاتیکی یەکپارچەی هەیە بەلام بەسەر عێراقو ئێران و تورکیاو سوریا دابەشکراوە کە هەندێک کوردیش لە سۆڤیەت و لوبناندا هەن، ئەوا وەک ڕۆژنامەی گەل و گۆڤاری پێشەنگ دوزیویانەتەوە لە پاکستان و ئەفغانستانیش دا هەین.

واتا تاقە میللەتیکەو بەشبەشکراوە ... کەوابوو تا کوردستان هەموو بەشەکانی نەبنەوە یەک و تا کورد بەسەر هەموو کوردستانی نیشتمانی خۆیدا دەستی نەڕواو بەوپەڕی ئازادی نەژی من ئاواتم پێک نەهاتووە. جا ئەگەر دەڵێم لەپاش حیزبی ژ.ک نەبوومە ئەندامی ڕەسمی لە هیچ حیزبیکدا، مانای وانیە دەسم لەخەبات هەڵگرتبێ، هەر لەو ڕۆژە کە ئاوارەی عێراق بووم دەگەڵ حیزبی پارتی هەمزە، دەگەڵ پارتی برایم ئەحمەد، خۆلاسە دەگەڵ هەر کۆمەڵ و دەستەیەک کەداوای ئازادی کوردستانیان کردووە، جا بە هەر ناوێک بێ بەپێی توانا هاوکاریم کردووە. تەنانەت دەگەڵ شیوعییەکانیشدا زۆر بە ئیخلاس کارم کردووەو یاریدەم داون ...

ئیمانم بە کوردایەتی کردن و ئازادیخوازی کە هەرلەمنداڵیەوە خۆم پێوە گرتووەبێ زیادو کەم وەک ئیمانی ئەو سۆفیلکەو موسڵمانە نەخوێندەوارانەیە بە ئیسلامەتی. کابرای موسوڵمانیبەراستی. ئەگەر ئاغا موسوڵمانەکەی تالانی بکا ئەگەر هاوسا موسوڵمانەکەی ژنەکەشی لێ هەڵبگرێ، مەزراکەشی بسوتێنێ، بە هەزار فێڵ و حیلە دەستی ببرێ و گزی

لێ بکا . قەت بەخەیاڵی دا نایە کە لە داخان دەست لە خوداو پێغەمبەر بەربدا تەنیا هەر دەڵێ فلان گزیکار موسوڵمانی چاک نیە و دوعای خراپی لێ دەکا

جا ئەگەر دەپرسی چۆنە کەوتویە ناو زۆنگاوی خۆفرۆشی و ناپاکیت نەکردووە. ڕەنگە ئەگەر باوەڕت بەم تەرزە ئیمانەم بە ئازادی کوردستان ببێ وەرامی خۆت وەرگرتبێ .

پێشم وایە هەتا لاوانی کوردی ئازادیخواز وەک ئیمانیان بەئاین توندە ئاوا ئیمانیان بەئازادی نەبێ لەخلیسکان ئەمین نابن و لەوانەیە فریوی پارەو قسەی لوسی دوژمنان بخۆن ..

- لەماوەی ئەم نیو سەدەیەدا زۆر لاوی کورد خۆی بە قوربانی ئازادی کردووە. لە زۆر جێ شۆڕشی هەڵگیرساندوەو دوژمنانی داگیرکەرزۆر بێ ڕەحمانە شۆڕشیان لەناوبردووە. زۆریش کوردی خیانەتکار بۆ تێکدانی شۆڕشی ئازادیخوازی یاریدەی داگیر کەرانیان داوە. زۆر لەوانەی کە زۆر بە دڵسۆزمان زانیون لەپڕ لەپشتەوە خەنجەریان لێ داوین . ئەگەر لەو شۆڕشانەدا سەرنەکەوتوین و شکاوین و بڵاو کراوین . دیسان گیانی ئازادیخوازی هەر ماوەو بگرە پەرەشی ساندوە، چینی نوێتر و بە ئیمانتر جێگەی شەهیدانی ڕێگەی ڕزگاری گرتۆتەوە . کوری باب کوژراو جگە لە ئازادیخوازی تۆڵەی مقدسی لە دڵدایە .

بەهرەی گەورەی خەباتی ئەم نیو سەدەیە بڵاو تر بوونی ئیمانی ئازادیخوازییە کە هەموو کوردستانی تەنیوەتەوە .

دەشتوانم بڵێم ئەم شۆڕشەی دوایی بارزانی کە عێراقی ناچار کرد دان بەمافی خودموختاری - حوکمی زاتی - دا بنێ لەدەسکەوتە هەرە گرینگەکان بو.. جا ئەگەر ئێستا هێزی فاشیستی بەعسی عەفلەقی صدامی بە خەیاڵی خۆی پەشیمان بۆتەوەو دەیەوی حەقەکەمان نەدا. بەڵگەیەکی گرینگی ئیمزا کردوە، کورد عەرەب نیەو خاوەنی سەرزەوینێکە . کەلەپاش صدام هەر حوکمێکی تر بێتە سەر عێراق ناچارە دان بەو ڕاستیەدا بنێ و پتر لەو هەقە بەشمان بدات هەروەها ئەم ئیعترافە بۆ پارچەکانی تری کوردستانیش بۆتە ئارمانجێک و دەوڵەتەکانی تریش ئەمڕۆ ناسبەی وەک عەرەب دەڵێن "ئاجلاً ئەم عاجلاً" ناچار دەبن مافی ئازادی کورد بیسەلمینن.کەوا بوو شۆڕشی بارزانی لە دەسکەوتە زۆر گرینگەکانمانەو لە گشت دەسکەوتێکی تر بەنرخ ترە .

- بەبڕوای من لە هیچ دەورو زەمانێکدا کورد هەل ودەرفەتی وا باشی بۆ هەڵ نەکەوتوە کە ئەم جەنگەی عێراق و ئێران لەئارادایە،ئەگەر ئێمە ئیمڕۆ ئەوەندەمان عەقڵی سیاسی هەبوایە کە دەسخەرۆی دوژمنان نەبین و بۆ ئەوان یەکتر نەکوژین و ئیختلافاتی گەورەیی خوازی° بێ محتوا وەلا بنێین . ئەگەر لەم ڕۆژە هەموو دەستە ئازادیخوازەکان یەکتر بگرنەوە لە نەردینی سیاسەتدا دوشەشمان هێناوەو بە هاسانی دەتوانین خۆمان وەک هێزێکی بە ئیعتبار و پتەو نیشانی دونیا بدەین .

پێشەوا قازی محمد سەرۆک جمهوری مهاباد کە بۆ گفتوگۆ هاتبوە تاران دیدەنی لە ئیحسان نوری پاشا کردبو. ئیحسان نوری بە پێشەوای گوتبو .. ئێمە خۆمان وەک خێڵێک دێتە بەرچاو کە هیچ پەناو پەسێومان نیە . بەفرو بارانیشمان بەسەردا دەبارێ ... بابە هەمو لایەکتان هەوڵبدەن کۆلیتێک، ناو ماڵێک سازکەن کە پەنای پێ بەرن .

ئەوسا لەسەر ڕەنگ کردنی دیوارەکانی کە ئایا زەرد بێ ، یان سووربی، یان شین . شەڕیش بکەن قەیدی نیە .

بەڵام هێشتا خانوتان نیە لەبەفرو باران بتانپارێزی لەسەر ڕەنگی دیواران کێشەبکەن زۆر بێمانایەو لەسەرمان دەمرن. من ئەم قسەم زۆر بەدڵە .. پێک نەهاتنمان لەسەر چیە؟ لە سەر بەرنامەیە. یەک دەڵێ باکۆمۆنیست بین ، ئەم دەڵێ نەخێر کۆمنیستی چین باشە، یەکی تر دەڵێ ڕەنگەکەی ئەنوەر خۆجە بۆدیواری

ماڵەکەمان ـ کە مالیشمان نیە ـ زۆر مناسبە، کۆمەڵێک جوێن بە مارکسیەت و مارکس و لینین دەدا ئێمەش وەک کابرای عەرەب ( بین مانا و مانا ضیعت لحانا ). کاکە با ئەو شەڕو کێشە لەسەر ڕفحەدانێین پێکەوە هەمو لایەک قوڕو بەردو تالاش پەیدا کەین و خانوێکی وا بەرپا کەین کە ناوی کوردستانی ئازاد بێ و لە بەفری قونبولەو گوللەتۆپمان پارێزێ. ئەوسا لەسەر ڕەنگ کردنی خانوەکەمان کێشەدەکەینو خوا کەریمە لەسەر ڕەنگێک هەر ئیتفاقدەکەین.

با ئەوانەی سەرکردایەتی حیزبەکان دەکەن کە ماشاللە یەکجار زۆرن هەرکەسەش دەیەوێ بۆ خۆی گەورە بێ. بۆماوەیەک هەریەکێ پلەیەک بێتە خوار تا دەستمان دەگاتە دەستی یەکتر و هەموو خەباتمان ڕوی لە دوژمنانی موشتەرەک بکەین. لێم ڕونە دەگەینە نەوعی ئازادی ئەوسا باسی گەورەیی و زەعامەتی شتێکی واقیعی بکرێ قەیدی نیە. ئەوسا مەزهەبیک بەسەر مەزهەبێکی ترا تەرجیح بکرێ مانعی نیە. تۆ کەیانێکت هەبێ، خەڵکی دنیا بت ناسن. ئەوسا ئەم کێشەیەش بکەین کەیانەکە هەروەک خۆیەتی .. ئەوا دەبینین ئەم هەمو کودەتا و ئینقلاباتانە لەم دنیایەدا ڕوودەدا ، حاکم دەگۆردرێن، بەلام کەیانە کە هەروەک خۆیەتی و گۆڕانی بەسەردا نایەو هەمو کەس ئیعترافی پێ دەکا ...

**٢ـ ڕۆڵی ڕۆشنبیری چیە لە خەباتی نیشتمانی کوردستاندا ؟**

"ڕۆشنبیری" ئەم وشەیە بەدەری کورد گوتەنی هەوێرێکە زۆر ئاو هەڵ دەگرێ.

ڕۆشنبیری بە خوێندەوارییەوە گرێدراوە.بە کەسێک دەڵێن ڕۆشنبیر کە زۆر خوێندەوارو زانا بێ و ئاگای لە ڕوداوەکانی کۆن و نوێی دنیا بێ و دەرس لەو ڕوداوانە وەرگرێ و بە قازانجی گەلی خۆی و هەمو خەڵکی دنیا دەکاری بێنێ. کەوا بو ئێمە با جارێ باسی خوێنەواری خۆمان بکەین.

نازانم بەر لەوە ئیسلام پەیدابێ کورد لە چ بارێکی خوێندەواری دا بووە. بەلام ئەوەندە دەزانم لەژێر حوکمی ساسانیان دا ، تەنیا نەجیب زادەو نبلا حەقی دەرس خوێندنیان هەبوەو ئەگەر ڕەعیەت گوتبێتی با کوڕی من بخوێنێ گوناهی گەورەبوەو کوشتویانە.. لە سەرەتای ئیسلامەوە تا زەمانی عەبدولمەلیک بن مەڕوان لە ئێران و میسرو شوێنی تر بەزمانی خەڵکەکەی وڵاتەکە نوسراوە. عەبدولمەلیک حوکمی کردوەک، دەبێ لە سەرانسەری قەڵەمڕەوی ئیسلام دا هەر عەرەبی بنوسرێ و جگە لە زمانی عەرەبی کەس حەقی نیە بەکاربێنێ.

گەلی کورد زۆر دڵپاک و بێ فڕو فێڵە.. ئیسلامی کە قبوڵ کردوە زۆر بەڕاستی بۆی تێکەوتوە. کوردیش وەک ئێرانی و تورک و ... بەزمانی عەرەبی خوێندویە و ثەقافەتی عەرەبی وەرگرتوەو چین لەدوی چین لەعەرەب عەرەبتر بۆ ئیسلامیش دڵسۆز بوە و لەپاپا کاثۆلیکتر بوە.

دنیا گۆڕاوە خەلافەتی عەباسی نەخۆشکەوتوە جارێک ئێرانی لایەکیان لێ برداوەو جارێک تورک تێی ڕۆهاتون ، ئێرانی گەراونەتەوە سەر زمانی فارسی خۆیان ، تورکیش تورکیەکەی خۆیان بوژاندۆتەوەو پەرەیان پێداوە، بەلام کورد لە سایەی دعایەی مەلاو شێخانی سەر بە دەوڵەتی بەناو خەلیفەی ئیسلام تازە ئاوڕی وەسەر زمانەکەی خۆی نەداوەتەوە. عەرەبی زمانی قورئانە و موسوڵمان لەسەریەتی هەر قورئان و ئەو عیلمانە بخوێنی کە قورئانی پێ بزاندرێ. ئەوی بۆ ئێمە ڕون بۆتەوە لە سەرەتای قەڕنی یازدەی هجری شەرەفخانێک گەل و میللەتی خۆی وەبیر هاتووە کە تاریخیان بۆ بنوسێ، بەلام بە فارسی ، چونکە ئەو دەم فارسی هەم لە ئێران هەم لە ناو خوێندەوارانی تورک زماندا زۆر باوبوە. هەر لەئەواخری ئەو سەدەیەشدا تەنیا خانی پەیدا بوە کەبەڕاستی بە ڕۆشنبیری کورد حیساب بکرێ. بەکوردی باسی دەردی کورد و دەرمانی دەردی کوردی بۆ کردوین. خانی بەو داستانەی

شۆڕشێکی ئەوەندە گەورەی بەرپا کرد کە هەتا قیامەت بڵێسەی بەرز بێ . لە سەدەی سێزدەهەمی هجریدا حاجی قادری کۆیی کەبە شانازییەوە خۆی بە یەکێک لەشاگردانی خانی دەزانی ئالاکەی خانی تەکاندو بەرزی کردەوەو لەناو سۆرانیان دا شەکاندیەوە .

ئیتر لەم دوو ڕۆشنبیرانە بەولاوە تا ئەم چەرخی بیستەمی میلادیە کەسێکی وامان نەبوە لای وابێ دەبێ بە کوردی بخوێندرێ و بیری کوردایەتی بە زمانی خۆماڵی بەناو کوردا بڵاو بێتەوە .

جا لەو سێزدە قەڕنەدا کورد یان بە عەرەبی یان بە فارسی یان بە تورکی خوێندویەتی . واتا ثەقافەتی بێگانەی فێر کراوە . هەستو شعوری قەومی لێ شاردراوەتەوە و کەوتوتە ژێر تاثیری هەستو شعوری ئەوانەی کە بەزمانەکەی خوێندون . بگرە بەشێکیش هەر تواوەتەوەو بۆتە بێگانەی تەواو . لە قەڕنی سێزدەهەمی هجریەوە هیندێک شاعیرمان لێ پەیدا بوون کە ویستویانە بەزمانی خۆیان شیعر بنوسن و ئەویش لە تەقلیدو لاسایی عەرەبۆ عەجەم و تورک دەرنەچون ..

لەسەرەتاکانی ئەم سەدەی بیستەمی میلادیەوە، شیعری ئازادیخوازانە، ڕۆژنامە، کتێب کە بۆ ڕۆشن کردنەوەی بیری کورد و کوردایەتی کردن بێ دەستی پێ کردوە . کە هەوەڵ جار لە ئەستەمبوڵ و دواجار لە عێراق سەری هەڵداوە . ئەویش هەمیشە لە بن سێبەری ترساندنی داگیر کەرا ژیاوە ..
کەوابێ ئەگەر ئێمە بێژین کە بون و مەوجودیەتی هەر گەلێک بە ڕۆشنبیریەکەیەوە بەستراوە . کە هەرواشە ، ناشێ بێژین کورد میللەتێکی شەشهەزارساڵەیە . دەبێ بڵێین ئێمە عومرمان لە قەڕنێک تێ نەپەڕیوە و هێشتا بەرامبەر بەگەلانی تێ گەیشتو نابالغین و مومان لێ نەهاتوە ..

**٣ـ با بێینە سەر پەیوەندی نێوان خەباتی چەکداری و ڕۆشنبیری ، ئێوە چون سەیری ئەم پەیوەندییە دەکەن ؟**

بەبڕوای من بەبێ فەرهەنگ و ڕۆشنبیری تەواو، بەبێ ڕیگەو خطە دانانێکی زانایانە هەزار هێندەش خۆ بەکوشت بدەین ناگەینە کوێستانی مراد .

لەم ڕاپەڕینی ڕۆشنبیریە لەم قەڕنەدا کوردیش بە پێی توانا توانیویەتی تا حدێک خۆ بنوێنێ وهێندێک لەو کەلینە بەرین و هەراوەی بێ ثەقافەتیە پڕ کاتەوە . بەلام هێشتان زۆرمان ماوە کە بیگەینێ و بە ناشکوری نالێم چەکوچی دوژمنانیش بێ وچان لەسەر سەرمانەو بەهەمو باران ڕێگە لە خوێندەواریمان دەگرن .

**٤ـ ئەی چ ئەرکێک لەسەرشانی نووسەرانی کوردە بۆ یەکخستنی شێوە زمانی کرمانجی سەرو لەگەڵ کرمانجی خوارو؟ ئایا لە چارەکە سەدەی دوایی دا هیچ پێشکەوتنێک بەدیدەکرێ لەم ڕووەوە؟**

بەداخەوە دەبێ بڵێم هێندیک لە نوسەرانمان زۆرجار حەولی ئەوەیان داوە کە سۆرانیو بادینانی لێک جیا کەنەوە . کە ئەمەش بزانن یا نەزانن خزمەتکردنە بە ئامانجی داگیرکەرانی کوردستان . ئەگەر ئێمە دەست لە سیاسەتی ئیقلیمی بەردەین و کوردی کوردبین و بەس . ئەوسا بە چاوێکی ورد بینانە سەیری فراوانی کرمانجی ژوروو کرمانجی خوارو بکەین دەزانین کە لەسەدا نەوەد زمانمان موشتەرەکە وەک من بیزانم ئەمان لە زاراوەی عەرەبی عێراقی و عەرەبی میسری زۆر لێک نزیکترن .. یەکگرتنی ئەو دوو زاراوەیە لە هەموو شت هاسانترە . بەلام هیچ شتێک بەبێ زەحمەت و خەبات دەست ناکەوێ .

ئەو کوردەی عەرەبی و فارسی و تورکیو ئینگلیسی و فەرەنسی و چەند زمانی تر وەک بلبل فێر دەبێ . کە هەر زمانەی بە چەندین ساڵ زەحمەت فێر بوە . ئەگەر دڵسۆز بێ وهەر شەشحەوت مانگ خۆی بەو دو زاراوەیەوە ماندوکا وای فێر دەبێ کە هیچ گرێ و گۆڵی

لەبەر نامێنێ . ئەو دەم نوسەرەکە دابنیشێ ئەوی دەینوسێ لەم دو زاراوەیەدا دیقەت بکا کام وشە سوکترو لەبارترو بۆ گوێ مۆسیقی ترە دای بنێ . لای وا نەبێ ئەگەر وشەی سۆرانی خستە ناو کرمانجییەوە کافر دەبێ . وەختی لەبەغدا لەسەر داوای وەزیری شئونی شیمال قەرار وابو کتێبەکانی دەرسی منداڵان دەسکاری بکەینەوە . کە هەر فریای کتێبی هەوەڵ کەوتین گەلێک وشەی کرمانجیم خستبوە ناو سۆرانیەکە. سەرلەهەوەڵەوە هەم نوسەرانی سۆرانی توڕە کردو هەم هێندێک لە نوسەرانی کرمانجی ژوروی قەڵس کرد . هەر کەسە بەرەو سیاسەتی ئیقلیمی دەکێشا ..بەڵام لە نەتیجەدا هەردوک لا زۆریان بەلاوە پەسەند بو . هەمو لا پێی ڕازی بون .

خۆم لە نوسینی شەرەفنامەدا ئەم سیاسەتەم ڕەچاوکردوە . وەک مافورێک کە ڕایەڵەکەی سۆرانی بێ و تێوەدان و پۆیەکەی کرمانجی ژورو و لوڕی و هەورامی بەو کەسیش نەیگوتوە کارێکی خراپت کردوە . بەڵام بۆ هاسانتر کردنی ئەم یەکگرتنی لهجەو زاراوانە .زۆرمان پێویستی بە لوغەتنامەیەکی گشتی هەیە کە نوسەر بتوانێ کلماتی مترادف زوبەزو پەیدا بکا . ئەویش جاری بەناشکوری نەبێ نیمانە . من کارێکم کردوە تا ئەندازەیەک بەکاردێت بەڵام لەچاپدانی زۆر مشکلەیە .

**٥- مامۆستا هەژار بیرو ڕاتان چیە سەبارەت بەو پیتانەی بۆ نووسینی زمانی کوردی بە کار دەهێنرێن. ئایا بەتەواوی لەگەڵ دەنگەکانی زمانی کوردی دەگونجێن ؟**

پیتەکانی کە ئەمڕۆ پێی دەنوسین کە پاشماوەی خەتی ئارامی چەندین هەزارساڵەیە هەرچەند ئێمە بە ئیعراب بە حروفەوە دەینوسین و لەعەرەب و فارس وارد و باشترو هاسانترمان کردوە . بەڵام ئەگەر ناچاری نەبێ ئەبەد بەکاری کوردی نوسین نایە

چاکترین خەت بۆکوردی نوسین ئەو خەت و ئەلف و بایەیە کە ئێستا لە کوردستانی تورکیا باوە، بە بڕوای من لە هەر ژمارەیەکی پێشەنگ دالەیەکدو صفحەدا دەرسی خەتی لاتینی بنوسرێ . میثالیش بە هەردوک خەت بهێنرێتەوە کەم کەم چاوی خوێندەوارانی پێ ڕابێنن. باشە .. بەڕاستی لە باری ئەمڕۆدا گۆڕینی خەت زۆر دژوارە . لەلایەکەوە خەڵکی عێراق و ئێران فێری نەبون . لەلایەکی تریشەوە ئەم خەتە عەرەبیە کە کۆنە میراتی ئارامیەکانە بە ناوی خەتی قورئان ناونراوەو لەوانەیە مەلا و کاڵ فتوای کوفرمان بۆ دەرکەن - لە ڕاستی دا لاتینی نەبێ بۆ کوردی لەنوسینی بێ گرێ و گۆڵ بە مراد ناگەین.

**٦- ئێوە یەکێکن لەو کەسانەی بە چالاکی بەشداری جموجوڵی ڕۆشنبیری کوردی و جێ بەجێ کردنی خوێندنی کوردی بوون لە ساڵانی ١٩٧٠ تا ١٩٧٤ ئایا چۆن ئەو سەردەمە هەڵدەسەنگێنن .**

بۆ پەرە پێدانی خوێندەواری کوردی لە ساڵانی حەفتا تا حەفتاو چوار کارێکی زۆرکرا بەڵام ناچارم ئینتیقادێکی چکۆلەم هەبێ . ئەویش ئەمەیە :کە چ بۆ مەجمەعی عیلمی ، یا بۆ کتێبی مەدرەسی . چاومان هەر لەوانەبوو کە شەهادەی بەرزیان هەیە کەچی خاوەن شەهادە بەرزەکانمان هێندێکیان بۆ خزمەت بە زمانی کوردی بە کار نەدەهاتن .. لە لایەکیشەوە چونکە دەوڵەت پارەی زۆری ئەدا بە نووسەران " کل مَن هَبّ و دَبّ " تەماح دەیگرت و بە واسیطەو واسیطە کاری خۆی تێ ڕادەکرد. زۆر کەسی وا هەبوو کە هەر بۆ ئەوەی پارەکە وەرگرێ ، خۆی دەسەپاندو دەچو لەبەر کەسی تر دەپاڕایەوە یان بەکرێی دەگرتن کە لە جیاتیان بنوسن . زۆر نمونەی وام لە بیرە کە نامەوێ ناویان بێنم . بەڵام دیسان بە تێکڕایی خزمەتێکی زۆر گەورەی بە ئەقافەتی کوردی کرد .

---

**دەردەدار ئەڵبەت زوبانی دەردو حەسرەت تێدەگا**
**چاوی بیماری دەزانێ ، ناڵە ناڵم بۆچیە!**

**(مەحوی)**

# چەند تێبینییەک لەسەر بیرەوەرییەکانی نوری شاوەیس

د. ڕەحیمی قازی

بەرلەهەموو شتێک بەپێویستی دەزانم پێتان ڕابگەیەنم کەبەووردی و قووڵی نووسراوەکانی ناو گۆڤارەکەتانم مووتالاکردو بەتەواوی هاتمە سەر ئەو باوەڕەیکە "پێشەنگ" لەهەڵ ومەرجی ئێستادا هەڵوێستێکی دروست و باشی ڕەچاو کردووە، زۆر بەنرخ و باڵایە، لەناحیەی سیاسی و ئیدلۆژی و پەیرەووباوەڕەوەزۆر پێشکەوتووەلەحاست زمان و ئەدەبەوە سەرڕاست و تێگەیەنەرو ساکارو پوختە و هەروەها جێگەی شانازییەکە بەشێکی نووسراوەکانی بەتیپی لاتینی چاپ دەکرێن و لەو ڕووەوە لەتەواوی بەشەکانی کوردستان خوێندەوارانی کورد ئەتوانن سوودی لێ وەربگرن ....

لەیەکەمین جارا هاتمە سەر ئەو بڕوایە کەبەنووسینی ئەو چەند دێڕەی سەرەوە کۆتایی بەنامەکەم بهێنم .. بەڵام بیرم کردەوە کەئەگەر لەونامەیەدا بیرو ڕای خۆم لەسەرڕیزە مەسەلەیەکی مێژوویی کە پەیوەندییان هەیە بە بیرەوەرییەکانی مامۆستا نووری شاوەیسەوە دەرنەبڕم نامەکەم کەم و کووڕی دەبێ . سەرپاکی ئەوەش لەمەڕ ئەو سەردەمەیخەباتی گەلەکەمان بۆ ڕزگاری و سەربەخۆیی نەتەوایەتی نێزیکەی ٣٠ سی ساڵە لێکۆڵینەوەی زانستیم بەڕێوەبردووەو چەند کتێب و نووسراوەیەکی زۆری زانستیم لەچاپداوەو سەر چاوەی تەواوی نووسراوەکانیشم بەڵگەو سەنەدی ئارشیفن.

١ـ ماموستا ئەنووسێکە ،بارزانییەکانکەچوونە یەکێتیسۆڤێت (٣٠٠)کەس بوون. لەڕاستی دا ژمارەی بارزانییەکان٤٩٩کەس بوون‌پیرەمێردێکی کوردی تورکیەشیان لەگەڵ خۆهێنابوو کە وەک بەڵەد چی لەچۆمی (ئاراز) بیانپەڕێنێتەوەو بەوییەوە ببونە ٥٠٠ کەس .(لەدوای پیاچوونەوەبۆمان دەرکەوت کە نووسینی "٣٠٠" لەبری "٥٠٠" هەڵەی چاپخانەبووەو هەرکاتی خۆی لە بەشەعەرەبیەکەدا کە ڕۆژنامەی گەل بلاوی دەکردەوەو هەروەها لە کاتی چاپکردنی بیرەوەرییەکان لەشێوەیکتێب بەزمانی عەرەبی چارەسەری ئەو هەڵەیە کراوە ـ پێشەنگ ـ.

٢ـ مامۆستا ئەنووسێ کە "مەلامستەفا ناڕەزایی دەردەبڕی بەرامبەر بەپارتی کۆمۆنیستیئازەربێجان‌بەتایبەتیبەرامبەر سکرتێرەکەی کە بابرۆڤ بوو (دروستەکەی باغراوفە )هەروەها ئەنووسێ کە مەلامستەفا باغراوف و بیریای تاوانبارئەکرد بەوەیکەبەکری گیراوی عێراقن..و یا ئەڵێ کەباغراوف ئەیویست کوردستان ببێتەپارچەیەک لەئازەربایجانی ئێران. هەر لەپاش ئەمانە ئەنووسێ" بەڵام مەلامستەفا کەوتبووە نێوان باغراوف و قازی محەممەد و ئەم دەیەویست مەسەلەکە هێمن بکاتەوە (لاپەڕەی ٦٠ ژمارەی ٥ ).

بەرلەهەمووشتێ ئەوانەی کەناشارەزان لە بەسەرهاتەکانی ئەو سەردەمە بەخوێندنەوەی ئەم قسانە ڕەنگە وایان بۆ دەرکەوێتکە لەیەکیەتی سۆڤییەت پێشوازێکی باشیان لە پەناهێنەرەکانی بارزانی نەکردووە . ئەوەلە ئینساف و ڕاستەقینە بەدوورە . من خۆم یەکێک بووم لەوانە کە لە پێشوازو جێ بەجێکردن و دابین کرانی بارزانییەکاندا بەشداریم کردووە . بارزانییەکان پاش قەدەرێک مانەوەو لە چەند قەزایەکی ئازەربایجانی، لەقەراغ شاری باکۆ لە ویلایەکی تایبەتی گەورە لەیەک جێ نیشتەجێ کران. مامۆستا و دکتۆرو دەرمانخانەو کتێبخانەو سینەماو...خزمەتیان دەکردن . لەحاست خواردن و پۆشاکەوە ئەوی پێویست بێ لە ئیختیاریان دا دانابوون و پتر لە بیست مامۆستا دەرسیان پێ دەگوتن .

بەڵام مەلامستەفا داوای لەبەرپرسانی سۆڤیەت دەکرد کە چەک و ئەسلەحەی قورسی بخەنەئیختیاریەوە کەبچێ بە گژ هوردوی ئێران و عێراقدا ... تەبیعی یە کە ئەمەداخوازێکی وانەبوو کەلەو سەردەمەدا بەجێ بگەیەندرێ. جا مەلامستەفاش خۆی توڕە دەکردو ناڕەزایی دەردەبڕی .نووسینی ئەوەش کە باغراوف و بیریا ، بەقسەی مەلا مستەفا ، بەکرێ گیراوی عێراقن ، بەر لەهەموو شتێک شەخسیەتی مەلا مستەفا ئەهێنێتە خوارێ و نەدەبوو قسەی وا لە چاپبدرێ .

ئەوەشکە گوایا باغراوف دەیەویست کوردستان ببێتە پارچەیەک لەئازەربایجانی ئێران بەتەواوی لەڕاستەقینە بەدوورە . هەربێ ئەوەش بەگوێرەی دابەشکرانی جوغرافیایی ئێران بەشێکی گەورەی کوردستان خراوەتە سەر ئازەربایجانی ڕۆژئاوا (ئەیالەتی چوار ) کەناوەندەکەی شاری ورمێ یە جیا لەوانە مەسەلەیەک لەگوریدا نەبوو کەمەلامستەفا ئەهوەنی بکاتەوەو بکرێ بەوەکیل. یەکیەتی سۆڤیەت ئەوکاتەشوولە هەموو کاتێکی تریش دا پشتیوانی لەبزووتنەوەی ڕزگاری نەتەوایەتی گەلی کورد کردووەو دەیکات .

٣ـ ماموستا دەنووسێ (ئەوماوەیەش " لێرەدا مەبەست کاتی پەنابزدنی بارزانییەکان بۆ یەکیەتی سۆڤیەتە"ژ.ک یئێران نیازیان هەبوو پارتی دیموکراتی کوردستانی ئێران دابمەزرێنن . مەلامستەفاش داواکرابوو کەلەویدا بەشداربێ. بەڵام مەلامستەفا دژی ڕەحیمی قازی بوو لەبەرئەوەنەچوو) . (لاپەرەی ١٠ ژمارەی ٥ ) . مەعلووم نیە ئامانج لە ژ.ک ی ئێران چی یە؟ پاشدامەزرانی حیزبی دیموکراتیکوردستانی ئێران لەسالی ١٩٤٥ دا ئیتر کۆمەڵەی ژ.ک نەماو تەواوی ئەندامەکانی بوون بە ئەندامی حیزبی دیموکرات .

لێرەدا مەسەلەکە بەم جۆرەیە: کاتێک بارزانییەکان لە قەراغ شاری باکۆ لەیەک جێ وەخڕ هاتن و کاروبارو ژیانیان لەهەموو ڕوویەکەوە بەڕێک و پێکی بوو، لەگەل مەلا مستەفا هاتینە سەر ئەم بڕیارە کە بەئامانجی بەڕێوە بردنی کاروباری تەشکیلاتی و سیاسی و کۆمەلایەتی وسەرۆکایەتی کردنی بەڕێی و جی بەسەر پرۆپاگاندا کەبرێتی بوو لەڕۆژنامەو ووتارنووسین و شارەزاکردنی بارزانییەکان لە چلۆنایەتی جیهانی و هتد، ئۆرگانێکی سەرۆکایەتی سیاسی پێک بێنین .ئەوەبوو کە کۆمیتەی ناوەندی دەرەوەی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران.مان پێک هێنا. مەلا مستەفا بە سەرۆکی کۆمیتەی ناوەندی و ئەمنیش بە یاریدەری سەرۆک و بەرپرسی پرۆپاگندە دیاری کرام. میرحاج و شێخ سولەیمانی برازای مەلا مستەفاش لەڕیزەی ئەندامانی کۆمیتەی ناوەندی بوون. هەتا ئەوکاتەی کە بارزانییەکان ڕانەگوێزرا بوون بۆ کۆماری ئۆزبەکستان.بەیەکەوە تێدەکۆشاین، ڕۆژنامەمان دەردەچواند ووتارمان دەداو هەموو حەفتەیەک جارێک بە سەرۆکایەتی مەلا مستەفا کۆبوونەوەمان دەبوو. ئیتر نازانم مامۆستا شاوەیس لەسەر چ ئەساسێکی نووسیویە مەلامستەفا ئامادەنەبوو؟ هیچ ئەساس و بناوانێکی نەبووە کە مەلا مستەفا لەدژی من بێت. ڕاستە لەساڵەکانی دوایی کاتێک مەلامستەفا لە مۆسکۆ نیشتەجێ بوو، چەند کەسێکی لەو کوردانەی کەدەرحەق بەیەکێتی سۆڤیەت نەمەک بەحەرام دەرچوون و ئێمە ناچار بووین لەڕیزەی خۆمان یا نوەدەرخمین کەوتنە ‎ئحەول وتەقەلا‎ بۆ پێک هێنانی ناکۆکی و ناتەبایی لەنێوان مەلا مستەفاو ئەمن دا و دەنگ و باس و شایەی جیاواز جیاوازی دوور لە ڕاستەقینەیان بڵاودەکردەوە. بەو بۆنەیەوەچەند دانیشتنمان پێک هێنا و بۆمان ڕوون بۆوە کە بۆ ناتەبایی و ناکۆکی نێوانمان هیچ ئەساسێک نییە. چەند نامەیەکی مەلامستەفام لەلایە کە لە مەسکەو ڕا بۆی ناردوم و بەخەتی خۆی نووسیویەو لە هەمووی ئەونامانەدا بە ئاشکرایی وەدەردەکەوێ کە مەلامستەفا تا چ ڕادەیەک ڕێزی بۆ داناوم و ڕازی بوونی خۆی لە کاروباری ئەمن دەربڕیوە. (لەکاتی خۆی دا ئەو نامانە لەکتێبێکی جیاوازدا وەڕوئە- خەین).

٤- مامۆستا دەنووسێ "لە ساڵی ١٩٤٧ دا کۆنفرانسیدا مەزراندنی پارتی دیموکراتی کوردستانی ئێرا نبەسترا ....و ئەو کاتە مەلا مستەفا و میرحاج و دوکتۆر مراد هەموو لە مەهاباد بوون" (ژمارەی ٥ لاپەرە ١٠).

لەو ساڵەدا هیچ کۆنفرانسێکی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران نەبەستراوەو ئەوەی کەلەسەرەوە باسکرا بە نێوی کۆنفرانس نەبوو.

مەلا مستەفاو میرحاج هەتا مانگی ژوئەی ساڵی ١٩٤٧ لە شەڕێ دا بوون لەدژیهوردووی دەوڵەتەداگیرکەرەکانی ئێران و عێراق و تورکیەولەوڕۆژەدا پەنایان برد بۆ یەکێتی سۆڤیەت و ئیتر لە مەهاباد نەبوون. بەڵام دکتۆر مراد (مرادی ڕەزم مادەر) کەلێرەدا ناوی براوە، پێوەندێکی بەمەلامستەفاوە نەبووە. ناوبراو ئەفسەری حکومەتی نەتەوایەتیئازەربیجان بوو، نەک هی هێزی پێشمەرگەی کوردستان ...

٥- مامۆستا شاوەیس لە بیرەوەرییەکەی دا ڕیزە مەبەستێکی باسکردووە کە بەداخەوەپێی پێشەوای نەمری گەلی کوردقازی محەممەد ئەگرێتەوەو .بوختانی پێ کراوە و جێگەی گلەییە کە گۆڤاری (پێشەنگ) بەبێ لێکۆڵینەوەوبەبێ بەلگەوسەنەدێک ئەوانەی لەچاپ داوە. ئەویش لەوکاتەدا کەتەواوی هێزە نیشتمانپەروەرو شۆڕشگێڕەکانی گەلی کوردو ئادەمیزادی پێش کەوتووی جیهانخۆیان ئامادەدەکەن.چل ساڵەی کۆماریمەهاباد وەک جێژن و سەرکەوتنی مێژوویی بزووتنەوەی ڕزگاری نەتەوایەتی گەلی کورد بەیاد بکەن.

مامۆستا دەنووسێ: (ئەوکوردانەی پەنایان بردبووە بەر ئێران باری کۆمەلایەتی و ئابوریيان زۆر خراپ بوو... ئێرانییەکان بایەخیان پێ نەدەدان و قازی محەممەدخۆشی یارمەتی کەم دەدان.. من خۆم یەکێک بووم لەوانەکە خۆم ئامادە کردبووعێراقبەجێ بهێڵم و بڕۆم بۆ مەهاباد.تا لە کۆماری مەهاباد خزمەت بکەین، بەڵام هەوالمان بۆهاتەوە کەقازیمحەممەد حەزی بەو کارە نەدەکرد. لەوەدەچوو لەئێمە بترسێ کە بکەوێتە ژێر دەستەلاتی ئێمە) (ژمارەی ٥ لا ٨).

بارزانییەکان لەساڵی ١٩٤٥ پەنایان بۆ ئێران هێنا. ژمارەی چەکداریان چوار هەزار کەس و ژمارەی ژن ومنداڵیش نیزیکەی هەزار کەس بوو. بە گوێرەی ئەسپاردەی کۆمیتەی ناوەندی حیزبی دیموکرات ژن و منداڵی بارزانییەکان لەگوندەکانی دەورو بەری میاندوئاو و مەهابادو بۆکان و نەغەدە و شنۆ نیشتەجێکران. خانوو سوتەمەنی و جل وبەرگیان بۆ دابین کراو هەر خێزانەی چەند سەرێ بزنو مەڕی پێدرا. بەپێی ئەسپاردەی قازی محەممەدلەتەواوی شارەکانیکوردستان کەلەژێر دەسەلاتی کۆمیتەی ناوەندی حیزبدا بوون حەفتەی ڕۆژێک بە"ڕۆژی یارمەتی بە هاونیشتمانانی بارزانی" دیاری کراو لە چەند جێگەی دیاری کراوی شار نوێنەرانی حیزب ڕادەوەستان و خەڵکی شار بەگەورەو چکۆلەوە دەهاتن و ئەوەندەی پێیان کرابا یارمەتییان دەدا. بەڕاستی ئەوڕۆژە وەک جێژنێکی کۆمەلایەتی و نیشتمانی و هاودەردی لێ هاتبوو. بەچاوی خۆم دەمدیمنداڵی بچوک پیلاو یان پاڵتۆی بەری دادە- نا و تەحویلی نوێنەرانی حیزبی دەدا: دوکاندارەکان ئارد و قەندو چاو ڕۆن و برنج وکوتاڵ و پێڵاو و جلو بەرگیان دەهێنا یان پارەیان دەدا. ژنان بازنەو گوارەو یەخەبەرۆکی زێڕیان دەهێنا کە بۆ بارزانییەکان خەرج بکرێن. لە لایەکی تریشەوە هێزی چەکداری بارزانییەکان هەموو کران بە پێشمەرگە و تێکەلاوی هێزی پێشمەرگەی حیزبیدیموکراتی کوردستان کران.مەلامستەفا کرا بەیاریدەدەری سەرۆکی هێزی پێشمەرگە و بۆژیان و بەرێ چوونیخۆیی و نیزیکەکانی هەل و مەرجێکی زۆرباش لەمەهاباد بوپێک هێنرا.

بێجێ نیە لێرەدا ووتارێکی قازی محەممەد وەبیربحەینەوە لەبابەت بارزانییەکانەوە.قازی محەممەد بەڕێزییەکی زۆر گەورەی بۆ بارزانییە قارەمانەکان دادەناو لەخۆبوردن و خەباتی نیشتمان پەروەرانەی بارزانیەکان هەمیشە وەک نموونەیەک نیشان ئەدا. قازی لەووتارێکی خۆیدا دەڵێ:

((کورد نەتەوەیەکە کە هیچ کاتێک لەخەباتی دژی ئیستعمار و فاشیستەکان دەستی نەگێراوەتەوە. تەواوی جیهان دەزانێ کەلەعێراق چییان بەسەر کوردان هێناوە و هەرچەند تۆپ و تانکیان بۆسەر کوردان هان دا نەیانتوانی هەستی ڕزگاریخوازی ئەم گەلە بکوژێننەوە. شاهیدی زیندوی ئەم ڕاستەقینەیە جەنابی مەلا مستەفای بارزانی و عەشیرەتی قارەمانی بارزانە کەلەسەر بیری پاک و خاوێنی ڕزگاری خوازی وازیان لەماڵ و منداڵ و نیشتمانی خۆیان هێناوە لەنێو گەلی کورددا زۆر کەس و کوڕی واهەن کەنیشانیان داوە بۆ فیداکاری لە پێناوی ئازادی لە خۆبووردوونەترسن و لە ڕێگەی دیموکراسی دا، ماڵ و منداڵیان نایەتە بەر چاو ئەوانە بەنەتەوەی ئێمەو بە هەموو جیهانییان نیشاندا کەبۆ لەباوەش گرتنی یاری خوشەویستکە ڕزگاری و دیموکراسیە باکیان لە هیچ شتێک نیە. ئەوکوردانە پاکی و فیداکاری و پیاوەتی خۆیان بە جیهان نیشاندا. پێشڕەوی ئەوانەش برایانی بارزانین ...)) ڕۆژنامەی "کوردستان" بەرواری ٣٠ ژوئیەی ساڵی ١٩٤٦. جیا لە بارزانییەکان لە کوردستانی عێراقەوە نیزیکەی ١٥ کەسی تریش هاتبوونە مەهاباد و ئەوانەش کەهەموویان ڕووناکبیرو خوێندەوارو دڵسوز بوون بەنیشتمان، لەکاروباری فەرهەنگی و ئەدەب و ڕۆژنامەنووسی و گوتنی دەرس بەزمانی کوردی بەتەواوی هێزی خۆیانەوە تێدەکۆشان و دەورێکی باڵایان هەبوولەپەرەپێدان و بەرەوپێش بردنیزمان و ئەدەبی کوردی. شەخسی قازی محەممەد بەڕێزییەکی زۆری بۆئەو نیشتمانپەروەرانەدادەنا و تەنانەتکاک عوسمان دانش. کەماموستا شاوەیس لە چەند جێگەی بیرەوەرییەکەی دا باسی دەکاتەخۆشەویستی پێشەوا بوو، هەرلەماڵی پیشەواش دەماوەو ببوو بەکێک لە هاوپرسەکانی پێشەوا. ئیتر باسی ئەفسەرە قارەمان وکارزاو لێچوو ونیشتمانپەروەرەکانی وەک عیزەت عەبدول عەزیز، خیراللە، مستەفا خوشناو، محەممەد قودسی، نووری ئەحمەد تەها و ..هتد ناکەم کە ببونە خۆشەویستی هەموو لایەک و هێندەیان بڕوا پێهەبوو کەلەلایەن حیزب و کۆمارەوە پۆستی هەرە گرینگی هێزی پێشمەرگە خرابووە ژێر دەسەڵاتیئەوانەوە.

ماموستا شاوەیس دەڵێ: ((خۆمان ئامادە کرد بڕۆین بۆ مەهاباد و لەکۆماری مەهاباد خزمەت بکەین، بەڵام هەواڵمان بۆ هاتەوە کە قازی محەممەد حەزی بەو کارە نەدەکرد)).

لەسەرەوە بۆ ڕەددی ئەو بیرە کەبەمانای باوەڕنەکردنی قازیمحەممەد بەکوردەکانی عێراقە، چەند نموونەیەکمان نیشان دا. لێرەدا مەسەلەیەکی تر لە گۆڕێدایە کە کاک شاوەیس بەهیچ جەشنێکی بەلایدا نەچووە.

بۆ ڕوون کردنەوەی مەسەلەکەو شارەزاکردنی نەوەی ئەو ڕۆژ گەلەکەمان لەگەڵ بەسەرهاتەکانی ئەو سەردەمە بە پێویستی دەزانم هێندێک بەکورتی لەسەر ئەو مەسەلەیە بدوێم.

لەوسەردەمەدا، یانی کاتی دامەزرانی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران و ڕاگەیەندرانی کۆماری نەتەوایەتی و دیموکراتیکی کوردستان، عێراقبەتەواوی کوردستانی داگیرکراوی عیراقبەتایبەتی لەژێر حوکمات و دەسەڵاتی ئینگلیسەکان دا بووە، یەکەمین ئەرکی سەرشانینوێنەرانی ئیستعماری ئینگلیس لەکوردستانی عێراقبریتی بوو لەوەی کە نەهێڵن بەرەو پێشچوون و سەرکەوتنی شۆڕشی گەلی کورد لە کوردستانی داگیرکراوی ئێران کاربکاتە سەر کوردستانی عێراق و بەهۆی ناردنی خوفیە و دەستپەروەردەکانی خۆیان بزووتنەوەی دیموکراتیکی کوردستانی ئێران لە ڕێگەی ڕاست هەڵە بکەن و بیخەنە ژێر کارتێکردن و دەسەڵاتی خۆیانەوە. خوفییەکانی بەناوبانگی ئینگلیس لە کوردستانی عێراق لەوێنەی لاین، ئەدمۆنس، گۆر، کارونیلمید، دیولس ستاپینگ، میریس و هتد بۆ بەجێگەیاندنی ئەو ئەرکە کەحەول و تەقەللایەکی هەمولایەکیان لە قەڵادزەو هەولێر و ڕەواندزو کەرکوک و موسل و سولەیمانی دەستپێکردبوو، بۆ یەکەمین جار سەیدمحەممەدو سیدیقی کوڕی سەید تەهایان نارد بۆ مەهاباد، ناوبراو بە سوود وەرگرتن لە نفوزی شێخەکانی نەهری دەیەویست خۆی بخەزێنێتە ناو شۆڕش وبزووتنەوەی گەلی کورد بخاتە ژێر کارتێکردنی سیاسەتی ئیستعماری ئینگلیس، بەڵام کارێکی پێ نەکرا، دیسوی ئاوەژووی خۆی وەڕووخست و لەمەهابادیان وەدەرنا، هەر ئەو پووشووە (مەبەست سیدیقی سەید تەهایە) لەپاشان لەلایەن نووری سەعیدەوە کرا بە نوێنەری پەرلەمان لە بەغدا.

یەکێکی تر لەو خوفیانە کە ئینگلیس ناردبوویانە مەهاباد کابرایەک بوو بە نێوی ڕەسوول ناجی هەر بە یارمەتی ئەو هاونیشتمانە کوردانەی کەلە عێراقەوەهاتبوون و لە قوولایی دڵەوە بۆکۆماری مەهاباد تێدەکوشان، بە زووترین کات وەڕووکەوت کە ڕەسوول ناجی خوفیەی ئینگلیسە ڕەسوول ناجی گیرا و کاتی لێپرسینەوە پێلە زۆر شتان نا کە گرینگییەکی زۆری هەبوو بۆ کۆماری مەهاباد وتێکۆشانی حیزبی دیموکرات. بۆ نموونە ناوبراو گوتبووی کاربەدەستانی ئینگلیس لەکوردستانی عێراق لەوێنەی ستاپینگ، ئیدمونس، و لاین، پێیان ئەسپاردووە کە لەگەڵ کاک مامەندی کولیج، گولزارخانم، شێخ عەبدوڵلای گەیلانی، ڕەشید بەگی حاجی ئاغا و تەهاتەیر پێوەند ڕابگرێ و پێیان بڵێت هەتا پێیان دەکرێ خۆیان لەقازی محەممەد و سەرۆکایەتی شۆڕش نیزیک بکەونەوە (چەند کەسێک لەمانە تەنانەت بە ئەندامی کۆمیتەی ناوەندی حیزبیش هەڵبژێردرابوون)، بەڵام پاشگیرانی ڕەسوول ناجی و وەدەستکەوتنی ڕیزە بەڵگەیەک لەمەر خۆفرۆشییان بەشی زۆریان تەنبێ کران و دوورخرانەوە.

جیا لەمانە، ڕیزەیەکیش لە ئەندامانی کۆمەڵی "هیوا" لە عێراق کەکەوتبوونە ژێر کارتێکردنی ئیستعماری ئینگلیس دەهاتنە مەهابادو حەولیان دەدا جێپێی خۆیان خۆش کەن و بزووتنەوەی دیموکراتیکی گەلی کوردلەڕێگەی ڕاست هەڵەبکەن.. بێ شک لەهەل و مەرجێکی بەوجەشنەدا قازی محەممەدو سەرۆکایەتی حیزب نەیاندەتوانی وریابوونی شۆڕشگێڕانەی خۆیان لەدەس بدەن، خۆیان بخەنە نێو گۆمی ئیحساساتی نەتەوایەتییەوە و دەرگای حیزب و شۆڕش بەڕووی هەموو

کەسێک دا والا بکەنەوە . . .

ماموستا شاوەیس هەر لەو بەشەدا دەنووسێ :"لەوەدەچوو لەئێمە بترسێ ( قازی محەممەد ) کەبکەوێتە ژێردەسەلاتی ئێمەوە". بەرلەهەموو شتێک مەعلووم نیە ئامانج لەو " ئێمەیە " چ بێت و کێ بێت ؟ لەوسەردەمەدا لە کوردستانی عێراق هیچ ڕێکخراوەو کۆمەڵەو هێزو پارت و حیزبێکی سیاسی ئەوتۆ نەبوو کە لەناحیەی ئیدیۆلۆژی و بیروباوەرەوە یا لە ناحیەی چەک وهێزەوە بتوانێت بزووتنەوەی مەهاباد و شەخسی قازی محەممەد بخاتە ژێر دەسەلاتی خۆیەوە . ئەو سەردەمە لە کوردستانی عێراق لقی حیزبی شیوعی تێدەکۆشی و بێ شک ئامانجی ماموستا شاوەیس ئەوەنییە . هێزی چەکداری بارزانییەکانیش ئەوسەردەمە تێکەڵاوی هێزی پێشمەرگەی مەهاباد بوون ،مەترسییەکی بۆ قازی محەممەد نەبوو.

لێرەدا ئەو پرسیارەش دێتە گۆڕێ کەئەگەر بیرو ڕا و تێکۆشینی ماموستا شاوەیس و هاوڕێکانی( یانی ئێمە بە قەولی خۆی ) بۆ ڕزگاری و سەربەخۆیی کوردستان بو ، بۆچ دەبا قازی محەممەد لەوە بترسێت ؟مەگەر قازی محەممەد بۆ ڕزگاری و سەربەخۆیی کوردستان حەول و تەقەلای نەدەدا ؟!

لەوسەردەمەدا هێشتا پارتی دیموکراتی کوردستانی عێراقیش وەک ڕێکخراوەیەکی سیاسی نەهاتبووەگۆڕێ - پارت بۆخۆی - لەژێر کارتێکردنی مەهابادا دامەزرا . ماموستا شاوەیس پێی لەوە ناوەو دەنووسێ :" لەوکاتە ئێمە لەژێر کارتێکردنی بزووتنەوەی کوردستانی ئێران دا بووین" (ژمارەی شەش ، لاپەڕەی ١٠ ) .

هەروەها ماموستا شاوەیس باسی ئەو چاپخانەیە دەکاتکە هەمزە عەبدوڵلا لە مەهابادەوە بردی بۆ سولەیمانی. بەلام بەداخەوە نانوسێت کە ئەو چاپخانەیە دیاری قازی محەممەد بوو بۆ هێزە نیشتمانپەروەرو دیموکراتیکەکانی کوردستانی عێراق ئەوە بۆخۆی نموونەیەک لە بڕواو بەڕێزی پێشەوا لە هێزە نیشتمانپەروەرەکانی عێراق بوو .

٦- دەربارەی ڕۆژەکانی دوایی کۆماری مەهاباد و تێکوشین و خەباتی پێشەواو پێوەند لەگەڵ بارزانییەکان کاک کەریمی حیسامی لەوەلامی بیرەوەرییەکانی ماموستا شاوەیس دا بۆ ڕوونکردنەوەی چەند مەسەلەیەکی باس کردووە کە نامەوی لێرەدا دووپاتەیان بکەمەوە . بەلام لەوبەشەشدا هێندیک مەبەست هەن کە پێویستە پتر ڕوونبکرێنەوە .

بەرلەهەمو شتێک پێویستە ئەوەی بلێم کە ، مەلا مستەفا لەو سەردەمەدا جارێک نا ، بەلکو دووجار سەفەری کرد بۆ تاران . جاری یەکەم پاش شەڕەکەی لای (ساڵحئاوا )ی نیزیک بەسەقز بوو . ئەو دەم سەرۆکی ستادی هوردوی ئێران ڕەزم ئارا لەمەلا مستەفای گیرا بۆوە وەک میوانی ستادی هوردو بچێت بۆ تارانێ ، ئەوسەفەرە بەنهێنی پێکهات و مەلا مستەفا لەو بابەتەوە پرسی بە قازی محەممەد و سەروکەکانی تری حیزب نەکردبوو . جاری دووهەمیش ئەوکاتە بوو کە کاک کەریم باسی کردووە یانی هێشتا پێشەواو سەرۆکەکانی تری کۆماری مەهاباد نەگیرابوون کە مەلا مستەفا چوو بۆ



تارانێ .....

لەبیرەوەرییەکەی ماموستا شاوەیسەوە وادیاردەکاتکە پاش داگیرکرانی سەرلەنوێی مەهاباد و تێکچوونی کۆماری دیموکراتیکی کوردستان بەتەنیا بارزانییەکان بە چەکداری مانەوەو هێزی پێشمەرگە بەتەواوی تێدا چوو .بەلام ئەوە وانییە . ڕۆژێک پێش ئەوەی کە هوردوی ئێران مەهاباد داگیر بکات ، یانی لەڕۆژی ٢٠ی دیسامبەری ١٩٤٦ دا بە گوێرەی پێشنیاری قازی محەممەد هەرچی چەک و قورخانە لە عەمبارەکان داهەبوو هەموویان لەنێو پێشمەرگەکانی مەهابادی و دێیەکانی دەوروبەری دا دابەش کرد و (١١٥٠ ) پێشمەرگە بەفەرماندەیی کاک حەمەدی مەولوود لەمەهاباد وەدەرکەوتن و چەند مانگ لەگەڵ بەشە هوردووەکانی ئێران و سوارەی سەرۆک عەشیرەتە خۆفرۆشەکان لەشەڕێدا بوون. لە لای تەرگەوەڕ و مەرگەوەڕ و مەڵبەندی دەوروبەری ماکۆ نیزیکەی ١٥٠٠ پێشمەرگەی کۆماری مەهاباد بەسەرۆکایەتی کاک زیرۆی بەهادری چەند مانگ خۆڕاگرییان نیشان دا لە بەرامبەر هۆردووی ئێران دا . لەسەر یەک خۆ ڕاگری هێزی پێشمەرگەی کۆماری مەهاباد پتر لە حەوت مانگی خایاند و ئەوە لاپەڕەیەکی زێڕینە لە مێژووی خەباتی قارەمانانەی گەلەکەمان بۆ ڕزگاری و سەربەخۆیی و ئەو وێژراوەیەی ماموستا شاوەیس کە دەڵێت بەتەنیا بارزانییەکان چەکیان ڕاگرت و شەڕیان کرد ( ژمارەی ٥ لاپەڕەی ٩ ) بەتەواوی لە ڕاستەقینە بەدوورە .

٧- ماموستا شاوەیس دەنووسێ:" وەک لەمەلامستەفام بیست ئەمریکاییەکان پەیمانیان بەقازی محەممەد دابووئەگەر شەڕ نەکات و خۆی تەسلیم بکات هیچی لێ ناکەن و لە سێدارەی نادەن. بەلام ئێمە لەو ماوەیەدا ئەو شتانەمان کپ دەکرد بۆئەوەی قازی محەممەد وەک شەخسیەتێکی ئایینی و پێشەوایەکی کورد ڕێزی لێبگیرێت و بمێنێتەوە" (ژمارەی ٥ لا ٩ ) .

بەرلەهەموشتێک دەبێ ئەوەی بلێم کە تەنیا قسە ناتوانێ ببێتە بەڵگە ،جیا لەوەلێرەدا ، یانی لەوقسانەدا،لە دژی قازی محەممەد شتێکی وانییە کەلەلایەن ماموستا شاوەیس و هاوڕێکانییەوە ( دیسان ئێمە ) کپ بکرێت و یا بەقەولی ماموستا شاوەیس وەک "سەلبی یەتێکی " قازی محەممەد وەبەر چاو بکەوێت .

سەربەرزی و شانازی بزووتنەوەی دیموکراتیک و نەتەوایەتی کوردستانی ئێران لە ساڵەکانی ٤٥-١٩٤٦دا ئەوە بوو کە ئەو بزووتنەوەیە دژی ئیستیعماری و بەتایبەت دژی ئیستیعماری ئەمریکی بوو. دروشمی دژی ئیستعمار لە ژوورووی هەموو مەسەلەیەک داندرابوو. جا لەبەرئەوە ئەمریکاییەکان بەتەواوی هێزی خۆیانەوە تێدەکوشین ئەو بزووتنەوەیەو بە تایبەتی سەرۆکی بزووتنەوە قازی محەممەد بخەنە ژێر کارتێکردنی خۆیانەوە. بۆ ئەوە بەڵگەوسەنەدێکی یەکجار زۆر بەدەستەوە هەن کە بەداخەوە لە تاقەنووسراوەیەک دا ناگونجێ. بەڵام بۆ نموونە چەند بەسەرهاتێکی دەخەینە بەرچاو..

بەرلەهەموو شتێک فەرز بکەین قازی محەممەد بەقەی ئەمریکاییەکان شەڕی نەکردو بەفێڵ و فریودان خستیانە نێو گرتووخانە و لە پاشانیش کەچی لە سێدارەیان دا. ئەی بەڵێن و پەیمانی ئەمریکاییەکان چی لێهات؟! ئەوە لەگەڵ ئەو قسانەی کە گوایا مەلامستەفا بۆ کاک شاوەیسی گێڕاوەتەوە یەک ناگرن و لە چوارچێوەی مەنتیقدا ناگونجێت...

بەڵێ، ڕووخانی کۆماری مەهابادو لەنێو بردنی تەواوی شوێنەکانی دیموکراسی و لەسێدارەدانی سەرۆکەکانی بزووتنەوە هەمووی و هەمووی بەگوێرەی پیلانی ئیستعماری ئەمریکا نەک هەر جارێک، بەڵکو گەلێک جار پێشنیاریان بە قازی محەممەد کردبوو کە ئەگەر بێتو لەسەر مەسەلەی کوردبەڕێوەبردنی سیاسەتی دەوڵەتی‌ئەمریکا بگرێتە ئەستۆ ئامادەن هەموو چەشنە یارمەتییەکی بکەن. ئەمریکاییەکان بەباشی هەستیان بەوە کردبوو کە قازی محەممەد تا چ ڕادەیەک خۆشەویستی گەلی کوردەو بەڕێزی و نفوزی لەنێو کۆمەڵانی گەل دا لەڕادەبەدەرە، ئەوان نەک هەرکاتی بوونی قازییەکان لە گرتووخانەدا، بەڵکو چەند جارێکیش پێش‌ویش‌کاتی دیتنی قازی ئەو پێشنیارەیان هێنابووە گۆڕێ.

تەنانەت لە هاوینی ساڵی ١٩٤٥دا کاتێک‌کە تازە حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێراندا مەزرابوو کونسولی ئەمریکی لەتەورێز چووبووە دیتنی قازی محەممەدو لەڕێڕەوی قسە و باسدا گوتبووی دەوڵەتی ئەمریکا ئامادەیە ماشینێکی زۆرتان بداتێ. قازی نەمر لەوەڵام دا گوتبووی "ئەمن‌کەری کوردەواری بەماشینی ئەمریکا ناگۆڕمەوە" (ئەو قسە کورتەو پڕمانایەی پێشەوا لەگەلێک چاپەمەنی کوردی دا، بە تایبەتی لەڕۆژنامەی (ژین) کەلەسولەیمانی دەردەچوو بەدرێژی چاپکراوە).

هەوڵ و تەقەللای ئەمریکاییەکان بۆ کارتێکردن لە قازی محەممەد بەتایبەتی کاتی بوونی قازییەکان لە گرتووخانەدا بە تەواوی وەڕووکەوت. وەکی مەعلوومە هەرچەند ڕۆژێک پاش‌گیرانی قازییەکان لەلایەن مەحکەمەی عەسکەری یەوەحوکمی خنکاندنیان درا، بەڵام لەنهێنی دا ڕاگیراو پتر لە ٣ سێ مانگ ئەوحوکمە بەجێ نەگەیەندرا. لەوماوەیەدا چەند جار قازییەکانیان لە مەهابادەوە بۆ تاران برد و چەند کار بەدەستی ئەمریکی، لەوریزەسەفیری ئەمریکا لە تاران جۆرج ئیگلتن چاویان بە قازییەکان کەوتبوو ووت و وێژیان لەگەڵ کردبوون. ڕۆژنامەی (ئازەربایجان) بەو بۆنەیەوەنووسیبووی" گیان لەبەری و ئیرادەی دانەنواوی‌تایبەتی قازی محەممەد لەگرتووخانەی تاریکی دوژمن دا گەلێک پتەو ترو قایم تربوو. قازی بە جۆرج ئیگلتنی ووتبوو کە گەلی کورد چاوەڕێی هیچ خێر و چاکەیەکی لەدەوڵەتە ئیستعمارییەکان نیە و بەتەنیا بەپشت ئەستووری بە خەبات ڕزگاری و سەربەخۆـخۆی بەدەست دەهێنێت".

کاتێک قازییەکان لە گرتووخانەبوون فەرماندەی‌هووردوی ئێران لە کوردستان جەنەراڵ هۆمایۆن نزیکەی ٥٠ پەنجا هەزار تمەنی بەرتیل لەکەس و کاری قازییەکان ئەستاندبوو کە، حەول بدات قازییەکان لەمەترسی خنکاندن نەجات بداتە پاش‌قەدەرێک پارەکەی گێڕابۆوەو گوتبووی "چارەنووسی قازییەکان بەدەس‌ئەمریکاییەکانەوەیە، بچنەلای وان‌ئەوان دەتوانن حوکمی خنکاندنیان بگۆڕن یا ئازادیان بکەن ...".

کاتی مەحاکەمەکەی قازییەکان کە بەڵگەکانی لەپاشان وەدەس‌کەوت، سەرۆکی مەحکەمەی عەسکەری مەهاباد بە قازی دەڵێ دووکەس لەئەفسەرەکانی ئامادە لە مەهاباد بەوەکیلی خۆی دیاری‌بکات. قازی محەممەدیش‌نێوی دوو ئەفسەری دیکە دەبا کەلەتارانێ نیشتەجێ بوون. سەرۆکی مەحکەمە تووڕە دەبێ و دەڵێ: "ئەتۆ بەئانقەست دەتەوێ ڕێڕەوی‌مەحکەمە وەدرەنگێ بخەی، بەڵکو بتەوێ لە لەندەنەوە وەکیلت بۆ بێت؟" قازی محەممەدی نەمر لە وەڵاما دەڵێ: "ئەگەر پێوەندێکم بەلەندەنەوە هەبایە کارم بەو ڕۆژە نەدەگەیشت ..." ئەو قسانە کورت‌بەڵام زۆر بە مانان. ئەوانەوگەلێک بەڵگەو فاکتی لەو چەشنە تەنانەت‌لە نووسراوەو کتێبەکانی ئەو کۆنەپەرستانەش‌کەلەمەڕ مێژووی کۆماری مەهاباد نووسیویانە وەبەرچاو دەکەوێت. بەتایبەتی لە کتێبەکەی نەجەف‌قوولی پیسیان، سولەیمانی ح.، ئیگلتون، ئارش ڕۆزفیلت، دێرک‌کی‌نی‌ئین و هتد.

لەکۆتاییدا دەمەوێ ئەوقسانەی قازی محەممەد بخەمە بەرچاو کە لەوەڵامی نوێنەرانی ئەمریکی دا لەقوژبنی زیندان گوتبووی: "من دووڕوونیم و چاویشم چاک‌دەبینێ. ئەمن دەزانم ئێوە چتان لەمن دەوێ. بەڵام من بیرو باوەڕ و مەسلەکی خۆم ناگۆڕم. من ناتوانم خەیانەت‌لە نەتەوەکەم بکەم. من و نەتەوەکەم دەستی برایەتی و دۆستایەتی یەکیەتی سۆڤیەت‌مان گرتووە. ئەوە وەزیفەی موقەددەسی ئێمەیە ....".

ببورن نامەکەم درێژەی کێشا. بەڵام بە هەیوایم نرخێکی بچووکی هەبێت‌بۆ ڕوونکردنەوەی ڕیزە مەبەستێکی مێژووی ڕزگاری نەتەوایەتی گەلی کورد.

باکۆ - ١٩٨٥

# جاشنامە

حەسەنی قزڵجی

دیارە هەر بوارێکی ژیان ئەدەبی تایبەتی خۆی هەیە ، جوامێری و ئازادی و ڕاپەڕین و شۆڕش و پێشمەرگایەتی و خۆشەویستیو جوانی دروستکەری دەیان و سەدان و هەزاران پارچەی ئەدەبی جۆراو جۆرن ...بەپێچەوانەی ئەوانیش نامەردی و ترسنۆکی و مل کەچ کردن و ناپاکیش خانەی تایبەتی خۆیان هەبووە ..کەدیاردەیەکی نوێ سەرهەڵدەدا ئەدەبێکی نوێیش چاوهەڵدێنێ دیاردەی جاشی و جاشێتیوخۆفرۆشتن و ناپاکی کردن بەرامبەر گەل و نیشتمان، ئەم پارچە ئەدەبییەی هێناوەتە بەرهەم بەپێنووسی ئەدیبێکی کورد کەنەیتوانیوە لەبەردەم ئەو دیاردە ناشیرین و ناقۆلایەدا بێدەنگ بێ.

---

جاشنامە

پێشەکی : الجاش فی اللغة ـ جاش لە (لوغەتا )ـ بەبەچکەی گوێ درێژ دەگوترێ. گوێ دریژ کەدێز بێ یا بۆز، ڕەش بێ یا سپی، فەرقناکا ،بە بەچکەکەی هەر ئەڵێن جاش . ئەمە جاشیموتلەق بەڵام ئەگەر دایکی جاشەکە ماین بێ، ووشەی " هێستر "ی بەدواوەدادێ وپێی دەڵێن" جاش هێستر " . بەجاشی یەک ساڵە ئەڵین یەکبڕ ،هی دووساڵە دووبڕ، هی سێ ساڵەسێبڕ یا بەربار. لەپاشان دەبێتە کەری تەواو" لەقەبی حمار" وەردەگرێ ... بەڵام جاشی غەیرە تەبیعی کە لەمەو دوا باسیان ئەکەین لەم "لەقەبە" بێ بەشەو هەر بە جاشەتی دەمێنێتەوە . جاش لە باری تەمەنەوەفەرقیان هەیە. هی بچووک پێی ئەڵێن جاشک یا جاشولە، بەهی گەورەتردەگوترێ جاش. پێویستە ئەم فەرقە لەبیر نەچێ، تا هەموویان بەنەبقیزەیەک لێ نەخوڕدرێن .

بیرەوەری ـ گوێ درێژو جاشی(تەبیعی) لە ئەدەبی کوردی دا بەخەراپە باسیان نەکراوە :

(( چوارکەرم هەبوو، بەڕۆژ بەردو لموچەویان ئەبرد

بەینی بەین اللە منیش مەمنونی ئەم چواربارە

خۆزەڕەی هەرچواریان یەکیان ئەگرت کەیفم دەهات

وەکعەتابەم بۆبڵێن ، مەشغوڵی ئەم نەقارە بووم

(( سەلام ))

(( کەرێکم بوو چ کەر؟ وەکبا وباران
کەرێکم بوو چ کەر، بارکێشی دەوران ))
((کەرێکم بوو چ کەر؟ چەشنی سەیارە
کەرێکم بووچ کەر؟ وەک شێری مەیدان ))
((کەری نۆحی نەبی باپیری ئەوبوو
لەگەڵ گوێدرێژی عیسا خاڵ و خوارزان ))

(قانع )

---

جاش لە ئیستلاحدا : مانای جاش لە ئیستلاح دا بەپێی ئەهلی ئیستلاحەکە ئەگۆڕێ ،بۆ نموونەلە شەرع دا بەوکەسە ئەڵێن کەژنێکی تەڵاقکەوتووی بەسێ تەڵاقە لێ مارە ئەکەن، تابتوانن لە پاشان لە مێردەکەی مارە بکەنەوە. ئەم جاشە لەشەرع دا ڕێزی لێ ئەگرنو پێی ئەڵێن : (محلل) . بە حکایەت ئەگێڕنەوە: کابرایەک تەڵاقی خواردبوو، پرسی بەمەلایەک کرد. ئەومەلا یەش چەشنی تەڵاق خواردنی کابرای بۆ مەلایەکی گەورەتر نووسیو داوای فتوای لی کرد. مەلای دوهەم لەوەڵامی مەلای هەوەڵدا نووسی :

" عیلاجی نایە مەگەر بەتەحلیل
جاشێکی دەوێ مل قەوی وەک فیل".

جاش لە ئیستلاحی عەسکەری دا : بەو هێزە غەیرە عەسکەرییانە ئەگوترێ کە لە ئەفرادی گەلی ژێر دەست و ئیستعمار کراو بۆ ماوەیەک بە جل و بەرگی خۆیان بە پارە بەکرێ گیراون، چەکیان دراوەتێ و لە دژی نەتەوەکەی خۆیان شەڕیان پێ کراوە. وەکو هێندێ لە لەشکری ئینگلیز لە هیندوستان و لە موستەعمەرەکانی دیکە. یا وەکو ئەو زۆڵە کوردانەی لەژێر سەرکردایەتی ئەفسەری ئینگلیزی (لونگ ریگ) دژی شێخ مەحمود شەڕیان ئەکرد. ئەمانە ماوەیەک پێیان ئەگوترا جاش پۆلیس، پاشان بوون بە جاشی ڕووت.

جاش لە ئیستلاحی سیاسی دا :

لەگەڵ پەرەگرتنی خەباتی ڕزگاریخوازی گەلەکانی موستەعمەرە و بەشخوراو و غەدرلێکراو ئیستعمارکەرەکان و حکومەتە زاڵمەکان بۆ خەڵەتاندنی ئەو میللەتانە، دەستیان کرد بەگرتنی کرێ گرتەی جۆر بەجۆر وەک: نوێنەری مەجلیس، ڕۆژنامەنووس و تەنانەت سازکردنی حیزب و کۆمەڵی بەکرێگیراویش. بەم جۆرە مانای جاشیش فراوانتربوو.

جاش لە مانای سیاسی دا بریتی یە لە: هێندێ ئەفرادی زۆڵ لەگەل و میللەتێک کە بۆ قازانجی خۆیان دژی گەل و میللەتەکەیان ئەکەونە کار و دەبنە بارە بەری دوژمن.

بەشی یەکەم

تاقمەکانی جاش:

جاشەکان دەستە و تاقمیان زۆرن. لێرەدا تەنیا باسی ئەم چەند دەستەیە دەکەین :

١- جاشی سادە.
٢- جاشی دەرەبەگ
٣- جاشی شێخ و بەچکە شێخ
٤- جاشی حیزبی

بیرەوەری: ئەوەی لێرەدا باسی دەکرێ تەنیا نموونەیە. قاپی جاشنامەکە دانەخراوە، هەر کەسگازی لێ گیراوە، یا لۆشکی لێدراوە و جاش زیاتر دەناسێ، ئەتوانێ لێی زیاد بکا.

١- جاشی سادە : ئەمانە هەندێ کەسی ساویلکەن ئاگایان لەهیچ نیە و لەبەردەستی دەرەبەگەکاندان و ناچارن بەقسەیان بکەن، وەکوو جاشەکانی خولەزێباری و خەلیفە حمد وهی تر.

(( ئەمانە هێندێ سادەی گێژو وێژن
مطبعی جاشی گەورەی هەرزە بێژن ))

جاشە گەورەکان فیکەیان بۆ دەکەن، تەماعیان وەبەردەنێن و پێیان ئەڵێن :

ڕۆڵە وەرە ببە بەجاش - جاشێکی شەشدانگ هەراش
بچۆرە ناو ڕەوەی عەماش - ئیتر ناڵ و کورتان بەلاش
بەرتۆم هەزاران عەلبەجۆ
هەزاران بێ ئاقڵ وەکە مال - بۆخۆی گەیی بەماڵ و حاڵ
وەک قایمقام لە چەمچەماڵ مەئیوس مەبە جاشی مناڵ
بەرتۆم هەزاران عەلبەجۆ
(( سەلام ))

ئەوانیش هەڵ ئەخەڵەتێن، بەربار دەبن، پشتیان بۆ کورتان ڕائەگرن، بەڵام گەلێکیان چاویان ئەکرێتەوە، تێ دەگەن، کورتان فرێ ئەدەن و دەبنەوە بە ئینسان.

٢- جاشی دەرەبەگ : ئەمانە کێن، قانع لە زمانی ئەوانەوە ئەڵێ :

" دڵم زۆر لێ ئەدا ئیمڕۆ، بڕۆم گاجووتێ بڕفێنم - کەسێ بکوژم، کەرێ بدزم، کەوابوو من لە ئاغانم "

ئەوانە ئەم دەرەبەگانەن هەرکەس پارەیان بداتێ ڕاوی بۆ ئەکەن و هەرکەس کاو جۆیان بداتێ باری بۆ ئەکێشن. ساڵی ١٩٣٢ کە هێزی هەوایی بەریتانی بارزانی بۆمباران ئەکرد کلحی ئاغای ڕێکانی، فارس ئاغای زێباری، وشێخ ڕەشیدی لۆلان جاشی ئینگلیز بوون و پەلاماری بارزانیان ئەدا. ساڵی ١٩٤٤ لە شۆڕشەکەی بارزاندا ئەمانەی خوارەوە جاشی نووری سەعید بوون و یارمەتی حکوومەتی بەغایان ئەدا.

" شێخ ڕەشیدی لۆلان، مەحمود خەلیفە، کلحی ئاغا و مەحمود ئاغای زێباری، ئەسعەد شێنەیی "

ساڵی ١٩٦٣ ئەمانەی خوارەوە و گەلێکی تریش

جاشی عەبدولکەریم قاسم و لەپاشان هی عارفەکان بوون :

محمد کلحی ئاغا و محمدامین ـ ڕێکانی
محی الدین جەنگیزئاغا وعزالدین ـ هەرکی
محمد ئاغا ، محمد فارس و عبداللطیف ـ زێباری
محسن ئاغا ـ برواری
شێخ جەلال و براکانی ـ بریفکانی
برایم ئاغا ، محمد عەزیزئاغا ـ
عبدالواحد حاجی ملۆ ، عبداللەئاغای شرفانی و عەلی ئاغای شمکانی ـ مەزووری
دیۆلی ئاغا و جەعفەر ئاغا و طاهر ئاغا ـ دوسکی
شیخ ئەحمەدی سورچی و هی دیکەلەم تاقمانە .

٣ـ جاشی شێخ ـ یا شێخی جاش :

ئەوانەی کە بەزەکات و خێرو سەرقەڵەمانەی خەڵک و چاوبەستنی موسڵمانە ساویلکەکان دەوڵەمەند ئەبن ، لەپاشان ئەچنە ڕیزی دەرەبەگەکانو وردە وردە لەحکومەتیش نزیک ئەبنەوە . هێندێکیان خۆیان بەسەری پیری یا کوڕو کاڵیان بە شلکی دەبنە جاش . ئەمانە تا دەبنەجاش بە مەرحەلەیدەرەبەگی دا تێدەپەڕن. مومکنە ئیعتیراز بگیرێ کەئەمانە لەعالەمی جاشەتی دا ڕەوەیەکی جیاواز نین و هاوکورتان و هەوساری جاشی دەرەبەگن . لەوەڵامدا ئەڵێین: ڕاستە . لەناو ئەو دوو ڕەوەیەدا ، لەدوو لاوە جهتی موشتەرەک هەیە . یەکیان ئەمەیە کە هەردوولایان خاوەن مڵک بوون، یا ئێستاش بالفعل خاوەن مڵکن. ئەوی دیکەش ئەمەیە کە ئێستا هاو تەویلەو هاو هەوسارن .

بەڵام لەڕاستی دا لەیەکتریش جیاوازن ئەمان ریشیان درێژە ، ئەوان ڕیشیان تاشیوەیا کورتە ،ئەمان عەباو عەمامەیان هەیە ، ئەوان لەکورتەک و پانتۆڵ و ڕانک وچۆغەدان.منتها ئەوەیە کە ئەمانە ( عموم وخصوص من وجه )یان هەیە . هێندێ شێخ جاش نین و هێندێ دەرەبەگ جاشن. لەبەرئەمە کورتان ناچێتە سەرپشتی هەموو شێخ و دەرەبەگێک و هەمووشیان پشتیان بێ کورتان نیە ... ئەمەش بیرەوەری بکەین باشە کەهێندێ لەشێخەکان دەستی سەگەتیشیان هەیە بۆنموونە : خۆیان بەدرۆ بەگەلومیللەت هەڵدەپەسێرن و لای خەڵک خۆیان سیس دەکەن ، کوڕو کاڵیشیان دەکەنە جاش . جا بۆیە لە ئیستلاحی عامیانەدا بەوانە ئەڵێن (کەرسەگ)

٤ـ جاشی حیزبی :بەوانەدەڵێن کەلەپێشدا لە حیزبێک دا بوون و پاشان بە فەردی یا بەکۆمەڵ لەو حیزبە دەرکەوتوون و لەدژی حیزبەکە بۆ قازانجی حکوومەت کەوتونەتە کار وناوی حیزبەکەیان داگیر کردووەو بەو ناوە وەگێڕە شێوێنی دەکەن .

فەرقی ئەمانە لەگەڵ جاشەکانی تر ئەوەیە کەئەمان زۆریان ڕوناکبیرن و تەنزیمێکیشیان هەیە . بەناوبانگترینی ئەم جۆرە جاشانە لە نووسینی ڕەسمی دا بە ( مرتزقەی تازە)یا بە ( اخواننا الاکراد) ناو دەبرێن. ئەمانە زۆر سوڕانەوە نەیانتوانی ببن بەهیچ ،ئەمجار گوتیان لە فۆلکلۆردا هاتووە ( کەر بچێتە بەغا دەبێتە هێستر ) لەبەغا نەیانتوانی ببنە هێستر بەڵام بوون بەجاش . لە تەویلەی میری دا حەوانەوە ، دەستیان کرد بەزەڕین و جووتە هاویشتن جهتی موشتەرەکی ئەمان لەگەڵ جاشی دەرەبەگ ئەوەیە کە تفەنگچییان هەیە و بەپارە کورد دەکوژن .....

مومکینە کەسێک بپرسێ ڕووناکبیر چون دەبنە جاش؟ لەوەڵام دا ئەڵێین:" مثلهم کمثل الحمار یحمل اسفارا ) .

## بەشی دووەم:

لەبەشی کەربازاڕی دا ، هێندێ قسەی نەستەق و پەندی پێشینان و نەقڵ و حکایەت لەبارەی کەرو کەربازاری .

١ـ کەرێکم دا بەکەرێ ،سندان لەبناگوێیدەرێ.
٢ـ هەردووکیان جاشی کەرێکن .
٣ـ کەر بەدەنکێ جۆ ئەزەڕێ .
٤ـ کەری ناو جۆگەلە لەهەردولا دەلەوەڕێ .
ئەگەر ئەوێ نەبوو ؟ دەورو بەری .
٥ـ لەجاشێکیان پرسی : ئەگەر جاشەوان فەوتا چ دەکەی ؟ زەڕاندی گوتی: تا خوا پشتێ بدا کورتانیش ئەدا .

## ژیناوەری زانایانی کـــــورد لە جیهانی ئیسلامەتـــــی




گوڵانی ساڵی ١٩٨٥ لەچاپخانەی مهارت ـ لـە تاران ئەم کتێبە چاپکراوە کە لە نووسینی برای بەرێز ( محەممەدصاڵح ئیبراهیمیمحەمەدی) یە کەناسراوە بە ( شەپۆل ) . بریتی یە لـە هەشت سەدو شەست و شەش لاپەڕەی قەوارەگەورە کە تەرخان کراوە بۆ لێکۆڵینەوەو باسکردنی ژیان و بەسەرهاتی زانایان و ئەدیبانی کورد لە جیهانی ئیسلامی دا .

ماموستا شەپۆل لە کتێبەکەی دا باسی زۆر زاناو ئەدیبی کوردی کردووە وەک " مەولانا خالید ، مەلا ئەبوبەکری موسەنیـــــف ، سەهرەوەردی ، شێخ عبدالقادر گەیلانی، شێخ عوبەیدوڵلای نەهری ، وەفایی ، حوسەین حوزنی موکریانی ، کامەران بەدرخان ، مەلای‌جەزیری، پەرتەوی هەکاری ، عەلی قزلجی ، مەلا جامی، مەلا عەبدوڵلای داغستانی، مەلاعەبدولرەحمانی پێنجوینی ، میرزا عەلی قازی ، نورنیســـا خانم ، ئوستاد ئەحمەدی تورجانی زادە، حاجی قادری کۆیی ، بێسارانی ، مەحوی، زێوەر، فەقێ تەیران ، مەستورە ، نالی ، بێتووشی ، سەیید عەلی ئەسغەری کوردستانی، تاهیر بەگی جاف ، پیرەمیرد، گیویی موکریانی ، صەیـدی هەورامی ، سەی یاقو ، دڵدار ، قەناتی‌کوردو، عەرەب‌شەمۆ ، ئەحمەدی خانی ، شێـخ ڕەزای تاڵەبانی ، حەمدی ، گۆران ، شێخ سەعیـدی پیران، شێخ مەحمودی نەمر ، شێخ ئەحمەدوشێخ سەلامی بارزانی ، باباتاهیری عوریان،لەگەڵ دەیان ناوداری تری کورد ...

ماموستا " شەپۆل " بەم دیارییە بەنرخەی خزمەتێکی مەزنی پێشکەش‌بە خوێندەوارانـی کورد کردووە بەتایبەتی لەکوردستانی ئێـران بەوەی‌کە زانیارییەکی زۆری لە دووتوێـی کتێبە بەنرخەکەی دا کۆکردۆتەوە . شایانـی باسە کە سێ هەزار دانە لەم کتێبە چاپکراوە و ئەمەبەشی یەکەمەو تەواوی کتێبەکەبریتیـیە لەچەند بەرگێک کەنیاز وایە یەک بەدوایەکا چاپ بکرێن و بخرێنە بەردەست خوێنەرانی کورد.

## ســروە

گۆڤارێکی ئەدەبی ـ فەرهەنگی یە لەلایـەن (ئینتیئشاراتی صلاح‌الدین ئەیوبی/ یەوە بڵاو دەکرێتەوە. تائێستا دوو ژمارەی گەیشتۆتـە دەستمان ، ژمارەی یەکەم بەهاری ١٩٨٥ وئەوی تر هاوینی ١٩٨٥ چاپکراون .

"سروە" گۆڤارێکی قەشەنگ و ڕێک و پێکـە لەڕووی دەرهێنانی هونەرییەوەو قـەوارەی ٢١×٢٨/٥سم و ژمارەیەکی بریتی یە لـە ٩٨ لاپەڕە وژمارە دوو ١٠٠ لاپەڕەیە .

لەدووتوێی‌ئەم گۆڤارە ساوایەدا چەندەها بابەتی بەسوودو نایاب خراوەتە بەرچاوی خوێنەران لە لێکۆڵینەوەی ئەدەبی ، مێژوو ، جوگرافیا ، شیعر، چیرۆک ،گۆشەی منداڵان وگەلێک بابەتی جۆربەجۆری ناسک‌وتەڕو پاراو ..

بۆ ئەو خوێنەرە بەڕێزانەی دەیانـەوی گۆڤاری " سروە " یان دەست‌بکەوی یابەرهەمو نووسینی‌خۆیانیان بۆ بنێرن ، دەتوانن بەم ناونیشانە پەیوەندی بەدەستەی نووسەرانـی " سروە " بکەن :

جمهوری ئیسلامی ئێران ـ
ارومیـە ـ خیابان شهید باکری ـ نیشکوی ساعد ـ انتشارات صلاح‌الدین ایوبی ـ مرکز نشر فرهنگ و ادبیات‌کردی ) تەلەفون ٣٥٨٠٠ .

# دووری

## جەلالی میرزا کەریم

شەوێ نی یە ..
پەنجەکانی ،
ئازیزی دوور
لەدەروازەی دڵم نەداو
چاوی نوستووی هیواکانم
لەسەر ڕۆخێ خەونەکانا ..
هەڵنەستێنێ و
نەمباتەوە ..
ناو کۆڵانی سەر هەڵگرتووی
کاروانی ئەو ئەستێرانەی،
کوژانەوە
نەخێر .. بەژنی ئەو مۆمانەی،
توانەوە

— — —

ڕۆژێ نی یە ..
وورشەکانی
ئاسۆی سنوور
باڵی هەناسەم هەڵنەکاو
لانەی مەلی سەرگەردانم
لەتارمایی یادەکانا ..
هەڵنەفڕێنێ و
نەمکاتەوە ..
نەخشەی ووڵاتێکی سوتووی
ڕێی دوێنێی ئەو پشکۆیانەی
لەناکاوێک دامرکانەوە
نەخێر .. تەرمی ئەو خۆزگانەی
بۆ لای یاریان نەبرانەوە .

— — —

ئەزانم ڕێی ،
ماچی لێوی خۆر هەڵاتنی شارەکەم
.. ترسناکە .
ئەزانم زێی ،
پەڕینەوەی بەرەو لای خۆشەویستەکەم
.. زۆر سامناکە .

ئەزانم ڕووی،
نشێوەکانی سەر سنگی بەهارەکەم
.. بێ گوڵزارە
ئەزانم بروسکەی جوانووی
ناو چاوی کوردستانەکەم
.. بریندارە

— — —

ڕەنگە .. وا زوو
نەگەمەوە ،
سەر ئەو گۆڕەی ..
ئەم فرمێسکەی بۆ ئەڕێژم .
ڕەنگە .. وا زوو
نەگەمەوە ،
ناو ئەو وەرزەی
شەتڵی هیوای نەورۆزی نوێی بۆ ئەنێژم .
بەڵام .. کرێوەو زریانی ،
چیا سەر بڵندەکانم ..
هەمیشە لەبەر چاوایە
ئاودانی ،
ووڵاتی هەژارەکانم ..
وەکو سێبەر لەگەڵایە
لافاوی ئاگر هەڵسانی ،
ناوجەرگەی سەنگەرەکانم ....
لەناخایە .

(ئەمریکا /١٩٨٥)

# 13 سوارێن بەهدینان

أ. وارباران

دەم ئێڤاربی ..
رۆژێ کەزییێت خو ڤەدهینان
تاڤییێت رەشوارێ مە د نخاڤت!
سالێ کراسێ ستویر دهاڤێت
بالاڤا خو ..
دانابی سەر ، کانی بهاریەکا بهەلم
چەرمێ عەفریتێ سەرمایێ
" ئەیهووت " و " زەنکل" و "عنتەر"
لسەر پشتا خو رادکرن و
کەپەنێ باڕۆڤا دگڤاشت! ،
ژ نشکەکێ ڤە ..
شریقێن کەفتە وەلاتی
گول و خەنجەر ژ بنی هژیان!
هەر چار چیا ..
خو چەماندو ژ کویراتیا برینا گریان
رۆژ بی رەژوی
ستێر ژ ئاسمانێ پالا رژیان! ،
ئاڤیستایێ ..
پەڕ رەشکرن
دار بەرویا تا .. لێ قڕیان
رەڤدە رەڤدە کۆتر فڕین
بێدەنگیێ .. ڤەگرت جیهان! ،
روندکێت گەرمێت گیڤا را
ل ، ناڤ جەنگەلێت بولیڤیا
وەک بارانێ هاتنە خارێ!
برنجێ ڤێتنامێ بەلگێت خو وەراندن
سپارتاکۆس کەفتە نیهارێ ،
هنکی من زانی کاروانێ ..فارس-جەنگۆ
هەر سێزدە سوارێن بەهدینان
حوو مێڤانداریا دیرۆکێ
چوو وەغەرێ

* * *

هەیڤ و رۆژو یازدە ستێرا
ئەڤێ جارێ ..
نە ژ بو یوسف ،
بو چیایی سپی .. بو بەرێ سپی
ژ بو " لالەش " سوجدە دبرن! ،
سێزدە سوارێن کوردستانێ
فارس .." دوازدە سوارێن مەریوان " !
جەنگۆ .."دوازدە سوارێن گەرمیان "
هەر سێزدە سوارێن بەهدینان،
وە .. چەند رویبارو تخوبیبێن درەو بڕین
بوسێن دژمنا شەقکرن !
رێل و رەوال
تیلبەند ، سیرمە .. وە بڕکرن
پێکڤە هوین هاتنە وەلاتی
دا جارەکدی ..
هیڤی یا ل ناڤ خەونێت زاڕۆکا بچینن !
کەڤنە تەڤنێت سایکس ـ لۆزان
.. هەلوەشینن
ستڤانکێ شیرین یارا من
ب گوللێت تفەنگا ڤەهینن !
س،
ە
ن
ا
ت .. !
ئەو بویکا پەری لێ کەفتی
ئەو کولیلکا نە بشکڤتی ..
کۆڤەندا وێ بگرن .. بگرن
بهژینن !
لێ دەرەبەگ و فاشیستان
وە سازانی ..
پشتی وە دێ .. گەرناسێن وەلاتی روینن
رێنجبەر ئێدی دێ مرن و
سەرێ خو قەت نا هەلینن !
نە هەڤالین ..
نەخێر .. نەخێر ،
خەونێت وان زوی زوی دێ فڕن !
میلێت چەرخا ..
بو پاشیێ نازڤڕن
کانییێت رەسەن زوها نابن
رویبارێت خورت و ژیهاتی
کەلیا ڤەدکەن ..
چیا دبڕن !
حەیفە حەیفە رۆژەک بێتن
تفەنگێت وە ..
ل کۆچک و جڤاتێن بەگلەرا
ئێخسیر ببن
ل ناڤ هزار دەستا بگەڕن
خەلک ببێژن ..
ئەڤا هەنێ
کەڤنە تڤەنگا فارس بی
کەڤنە تڤەنگا جەنگو بی
نهۆ خانێت وان ها فڕن !
کۆمێت کەڤزێ تێدا د چەرن ، ـ
کوردستان ، وەلاتێ خەما
کەڤنەوارێ برین و کۆڤەندو سەما
هەردەم کۆچک و جڤاتێن وێ
ژ گەنجا دپڕن !
بەرو دارا
گوندو شارا ..
ئەڤروکە د گەل وە پەیمانە
تڤەنگێت وە زوی هەلگرن ! ،
هەستی یێت وە دێ بن خەنجەر
گۆڕێت وە دێ بنە ڤۆلکانەکا تژی هزرو باوەر
ژ بلنداهیا ..
هێدی .. هێدی
وەکی بارانەکا پلێ
دێ ڤەگریت هەمی وارا !
تەڤ گیانەوەر ..
هەمی زیوان و خەمە گوڕ
دێ کەڤنە ناڤ شەڕگەها لەهی و رویبارا
پەرێت دیرۆکێ گۆڤانە ..
وارێ مە وارەکێ بزاخە
هەر چپکەکا خوینێ بکەڤیت
دبیتە گازو ..
چرایەکێ نوی هەلدبیت
روون دکەتن رێکا رێنجبەرا
گەش دکەتن رێکا هەژارا !!

(( هاڤینا ١٩٨٥)

---

* پێشکەشە بەیادی یەکەمین سالەی شەهیدانی کوردستان ... شەهیدانی پارتی گەل ..." فارس ، جەنگۆ ،شەمۆ ، لەگەڵ هاوڕێکانیان .

## MİR-HOV

Di warê jînê bi vî navî hatî navandin,
Di serê te da gelek pîsî hatine çandin,
Destê felekê berê te da herçiya neqenc,
Kuştin û talan,Xudbînî,kambaxî û sed renc,
Ji bo çakî û qenciyê her dij û neyarî,
Ji bona kam û daxwaza xwe wek gurê harî,
Qelsên xwe dixî bindestîyê bê dilovanî,
Bi zirt û fortan tu diçiyê,ew bi nezanî,
Xwe dispêre sersiya te,lê tu neqencî,
Bêbext û dilreş,çav li xwînê,her xwedî rencî
Rûmet ji xwe ra te kir mertal,lê qet nerastî
Hergav veşartin pîsîyên xwe di vî kirasî
Bê ûşt dikarî bi hezaran kesan bikujî
Xwîna rebenan ,belengazan bê tirs bimijî
Devê xwe pakî,bêjî xelkê:Ez dilovanim,
Xêrxwazê welêt,piştmêrê gel,qencê cîhanim
Mafir te evin rewş û tevger tu her kirêtî
Çakî te nîne,dongî reşî,çepel û şêtî
Divê gelek fihêt bikî ku tu mirovî
Çav li sitem,zirt û xapan bêvac û hovî.

**OSMAN SEBRÎ**

## SOSIN

Min sosinek dît nava mêrgêda,
Tevî sosina xwera gul dida.
Ji wan sosinê mêrgêda geştir,
Bîn û bengzê wê ji gişka xweştir.
Çavê min lê girt,ez berbi livyam,
Çûm ber sekinîm û serda çivyam.
Lê ez metel mam ser stuê wê xar,
Keserek kete dilê minî jar.
Min go:Sosina delale çev sût,
Bejin bilind û naz,tuyî li vir xût,
Lê gelo ka çiye mena stuê xar,
Ku anîm ber te,kirim tengezar.
E,go: Şairê bê hiş û sewda,
Te çima kul û derdê min tevda,
Xweşe ev mêrga, qet qusûr tune,
Çi bikim yazix ne yara mine.
Wî wextê qewxê, bê û baranê,
Ez avîtim rast,vê mêrga hana,
Xwezî bidîma te li miskenê min,
Hêja bidîta teyê rengê min.

**RİZALYÊ REŞÎT**

## WÊ BÊ..

Bê hogir û bê heval bihara xweş ne başe,
Bê kilam û bê reqas bihara xweş ne başe,
Bê gul û bê gîha bihara xweş ne başe,
Bê bax û bê baxçe bihara xweş ne başe,

X X X

Bê dê û bê bav bihara xweş ne başe,
Bê xûşk bê bira bihara xweş ne başe,
Bê qewm û bê pismam bihara xweş ne başe,
Bê xayî û bê xudan bihara xweş ne başe,

X X X

Bê gur û bê guman bihara xweş ne başe,
Bê mecal û bê mikan bihara xweş ne başe,
Bê bask û bê qanat bihara xweş ne başe,
Bê cî û bê war bihara xweş ne başe,

X X X

Wê bê roj, gişkê bêjin bihareke çi xweşe,
Teva zêrîn, xemla dinê, îro pir geşe,
Per-baskê dijmin dadiwere-dadiweşe,
Mecbûr bûye ji Kurdistanê ew vedikşe.

**EZÎZÊ GERDENZERÎ**

## DÊ ME HEBÎT

L,tarî şeva her şikestê
L,her bêdengîyek ji xew
J,keftina her kesî
Payiza gul werandîn
Dîwarên ber teng tarî
Sotna gunda d,gel warî
J,deng denga her kesî
J,çip çipa her xwînê
L,pir kirna bendîxana
Li werîna gul û nêrgiza
Qet netirsin j,keftinê
J,bêdengî û nivistinê
Demê her deng û hewarek
Têne êk wek alayek

Spêdê ronahîyek ya hey
Nalîn hewareka hey
Hizaran kes radibin
Biharên sor dê hebin
Rondkên dayka û nîharî
Dê her hêtin diyarî
Deng û hewar radibin
Gerêt xwînê çê dibin
Yan kuştina jar û cwana
Gul heldidin d,nav gulan
Birsê û derdê warsotinê
Zulm û zorê û xwîn rijtinê
Qîrî û nalîn xwînjank
Dê me hebît her çirayek

ŞEHÎD **CENGO**

# PALE




Hejmara 7 a govara PALE derket,ev govare,ku desteka rageyandinê a Komîta Pale ya ser bi partîya me ,Partîya Demokrat a Gelê Kurdistanê, bi herdu zimanên Kurdî,bi tîpên Erebî, û Erebî der dikeve 50 lapereye û çendîn gotar û nivîsarên ramyarî û çandeyî û dîrokî têda hatîne belavkirin.Herwisa jî deng û basên Kurdistanê û zordarîyên rijîmê û caş û xwefiroşa li ser xelkê bêgunehê Kurdistanê di vê hejmarê da hatîne nivîsandin.

Sergotara vê hejmarê li jêr navê"Helwîstê me li ser borîna salekê bi ser berfirehbûna Bereyê Nîştimanîyê Demokratîk ra hatîye nivîsandin.

Di sergotarê da PALE dibêje:"Azmûnên cîhanê û yên gelê Iraqê jî selmandîne ku her demê bereyê gel bi nûneratîya rêkxistin û partîyên nîştimanî yekgirtîbûye,hîngî serketî bûye û karîye rêberîya cemawerî bike û dam û dezgahên rijîmên zorkar biperçiqîne.Û herdem ew yekîtî nemabe jî wan nekarîye xwe ragirin li hember dezgahên polîsîyên rijîma...Bereyê Nîştimanî yê Demokratîk di xebatên xweyên borî da,nemaze piştî berfirehbûnê,pir destkeftên bi destve anîn di hemî warên bereyî da çi di warê rêkxistinîda û yan jî di warên ramyarî û rageyandinî da û herwisa jî di warê çalakîyên Pêşmergehên qareman da , Eve tevda mirovî hêvîdar dikin Bereyê Nîştimanî yê Demokratîk bibe bereyekî berfirehî nîştimanî bi pişkdarîya hemî hêz û partîyên nîştimanîyên Iraqî,û yan hernebe harîkarîya nêzîka wan hêzan bi Bereyê Nîştimanî yê Demokratîk ra.."




Van rojan berhevokeka nû ji alîyê çapxana Jîna Nû ve hate çapkirin û belav bû.Di wê berhevokê da hemû hejmarên govara RONAHI hatîne civaddin,ku tevda 28 hejmarin ya yekê di I ê Nîsanê 1942 an da û ya dawîyê di Adara 1945an da hatîye çapkirin.

Di destpêka berhevokê da bi dirêjî li ser rewşa derketina hejmarên Ronahî hatîye nivîsandin. Û herwisa jî xwedî û berpirsyarê govarê Mîr Celadet Bedirxan qanc bi xwendevanan ra daye naskirin.




Li dawîya sala 1985 ê nivîskarê têkoşer mamosta Kerîm Husamî pirtûkek bi navê " Komarî Demokratî Kurdistan (Mehabad) " bi zaraveyê soranî û bi tîpên Erebî çap û belav kir.Li destpêka Isal jî heval Elîşêr ew pirtûk wergerande ser zaraveyê kirmancî û bi tîpên Latînî nivîsand,û Weşanên Jîna Nû jêra çap û belavkir.Ev pirtûke ya ku bi helketina borîna 40 sala bi ser damezrandina Komara Demokratîk a Kurdistanê hatîye nivîsandin qûnaxeka giring ji xebata neteweyî ya gelê Kurd xuya dike û rewş û kawdanên damezrandin û roxandina komarê bi hûrikî şirove dike.

Xwendevanên hêja ji bo peydakirina van du pirtûka dikarin ji vê adrisê ra binivîsin:WEŞANÊN JÎNA NÛ-POST BOX 240 I2- 750 24 UPPSALA - SWEDEN "

wê ra bimîne.Ev zarokên ku ji xwîna wî ne,bibine mîratxwerên wî.Jin jî bû beşek ji terş û talanê zilamî,kete jêr darê wî ,wekî gayek yan pezek di kire û difroşe.Bi vî rengî jin û zarok jêra dimî nin.Lê dîsa bav giringî da kuran.Li paş mirina wî mal û sermaye ji bo kuran dima,lê keç bê par diman li gel diya xwe,divîbûku ji hoza bav derke vin .Li vir çewsandin destpêbû û wilo mêjûvek nû li jiyana mirov da hate danîn,sitemkar û sitembar bela bûn,çînek serdest û çînek bindest dîyar bûn ,dijayetî peyda bû,zilam bi destekî hasin li jinê da.Markis û Englis herdu mamostayên mezin dibêjin ku çewsandina çînayetî cara pêşîn li nav bera jin û mêr da peyda bû.Çewsênerê pêşî mêr e yê ku tuxmê jinê çewsandî.Jin perşikestî bû ji ber bihaneyeka çewt û xwehr; divê jin dawpak(damen pak)be,serfiraz û bi rûmet be.Ev zaravên nû li çaxê bavîtî belî bûn,lê tenê ji alîyê jinê bûn .Zilam dîsa serbest bû li hemî tevgerên xwe. Ev zaravên ha bûne hevsarek di stiwê jinê da,roj bi roj nivz bû,bê nirx bû û dûr ket ji komel,cih jêra nema,bê maf ma,hemî bîr û bawerî derheqê wê berevajî bûn.Çi pesnekî xirab û niviz û karên bê rê dane pal navê jinê ve.Qencîya wê bû xirabî,zanîna wê bû nezanîn,rastî bûn çewtî,pîrozîya wê gunehkarî.Jin hîçe, çêbûye ji bo anîna zaroka we kî çawa zilam pez û dewaran xwedî dike da ku bizên û malê wî pir bibe.Herweha jin jî xwedî di kir ji bo zarokên wî gelek bibin bi taybetî tuxmê nêr ta ku karker û çekdarên wî zehf bibin,hoza wî mezin bibe,û ew jî dibe zilamek bihêz û bi nav û deng.Di nêrîna mêr da hebûna tuxmê jinê di malê da agirekî bi tirse;eger pêket rûreş dibe , Bi vî awayî hemî ol û ayînên kevin dijî jinê rawestan.

Li sedsalên navîn da jin bû wekî parek ji zevîyên derebega,bê maf û ziman bû li jêr darê beg da.Jiyan û man û nemana wê li jêr destelatîya xwedîyê zevî da bûn.Herweha jî mafê pehlewanê wê çaxê bû eger eger çi rengê azarî û zor û sitem bi serê jina xwe bike,lêdixist û dida mêrekî din herweha difrot.Eger ji mal diçû rêyeka dûr ,jina xwe dikir bendîxana malê da ji bo serfiraz bimîne û kes peywendîyan pêra neke.Li wê çaxê heger temenê kur biba 7 sal ji bindestê diya xwe derdiket.Li paş mirina bavê xwe dibû berpirsyarê dê,û mal ji destê wê digirt û ew dibû semyanê malê.

Çend nimûne ji çewsandina jinê:

Li Hindostanê

Di şaristanîya kevin da eger mêr dimir divîbû jin jî xwe bikuje,herweha jorek serbixwe li kurcekê li paşîya malê da ji keç û dê ra ava di kirin,jorekî wekî bendîxanê,dergeh û pencere di girtin,şev û roj pîrek li hundir dima,yanku der ketin û tevger jê ra nebû.Jinê jiyana xwe hemî li hundirê wî jorî derbas dikir,da ku kes ji mê rên biyanî pîrekê nebîne û ew serfiraz bimîne.

Pîreka Hindî bi serbilindî û paye digot tîrêja rojê li ser rûyê wê neketîye,yan ku wê roj nedîtîye.

Li Çînê

Li çînê bi rengekî din jin hatîye çewsandin û êşandin.Jina Çînî jî wekî ya Hindî bendgîra malê bû .Her çende dergeh û pencere li ber negirtîne,lê ew pêbend bû li destpêka jiyana wê da, ku hîn zarok,xunceyek ji gulîstana jinê ye.Lingê wê bi terîşeke caw hişk û dijwar girê didin, maweyek dirêj lingê keçê girêdayî dima.Gerra xwîna radiwesta û ling ziwa dibû,li encam da bêhêz û lawaz dibû.Girêkên goşt bel dibûn bi şêweyekî kirêt û nespehî.Ev karê han bi serê keça xwelîser dikirin ji bo wê nêrîna mêr ya çewt û pîs derbarê jinê

## JÎ LAPERE(44)

yê"I954,"Antolôyya Nivîskarê Kurdê Sovêtî"I957, û "Efrandinê Nivîskarê Kurdayê Sovêtîyê Ermenistanê"I96I .

Sala I984 an dîwana wî "Kofîya Dya Min" ji alîyê Sovêtkan Grox de hate çapkirin.Va li jêr emê helbestekê ji wê dîwanê vebijêrîn:-

KULAV-REŞO

Kulav-reşê min,delalê dilê min  
Tu va kerîyê pêz,dikşînî berbi çyê,  
Ax,xwezîl îro min jî bizanbûya  
Tê ku bihêwirî bi xwe vê şevê  
Li ber wan kanya,ku ez jî zanim  
Yan ber wê gola Elegeza me  
Kîderê ba dike şinge-şing,  
Ava zelal, nerm ser hevra diçe,  
Delalê dilê min gazî pêz dikî  
Dengê te zîze mîna dengê şêra,  
Ax,xwezîl îro min jî bizanbûya  
Tu yê li kîderê bî,Kulav-reşê min  
Kulav-reşê min,xwezîl vê şevê  
Baran û teyrok bibarya ji ezmên  
Bi bilûra xwe te pez bajota,  
Boha sitarê bihataye oba me,  
Û ez biketama bin kulavê te  
Bikşanda bîna teya xweş,delal  
E'nya min te ra bibaye meydan  
Bi ramûsana lê bikira seyran  
Kulav-reşê min,delalê dilê min.

# JI DÎROKA CEWSANDINA JINÊ

KEÇA KURD

Çewsandina pîrekê(jinê) ji demekî dirêjve de-
st pêkirîye,pêtir ji 5000 salan've pîrek pêbend
bûye,bê maf maye; ji kelheka bilind û pêpelûkeka
(dereceka) pîroz,ji textê xudayetî hate xwar û
kete jêr pê,miroveka bê nirx û biha,bê cih li ko
mel da.Ew mirova ku jîngeha mirovayetî bû,ew da-
yika ku rojekê ji rojan xudaya zevî bû,parêzgeha
mirov bû,rêber û rêzana jîyaneka seretayî bû.Çun
kî mirov li ser destê wê rêça jiyanê kelaşt.

Pîrek cara pêşîn naveroka zevî naskir û peywe
ndî li gel kir û fêrî çandinê bû,herwiha bi miro
van da naskirin.Ewe ya ku mirov dayî û xwedî ki-
rî,ewe ya ku komelgeh dirust kirî û bi rêve birî
li maweyekî dirêj ku destelatdarîya wê destpê di
ke ji kotahîya çerxa hovêtî û heta kotahîya çer-
xê berberî. Hîngî çax çaxê jinê bû,komelgeh û êl
û hoz û zarok yên jinê bûn,çaxê dayikê bû yango
çerxê zêrînê jinê bû.Aborîya malê yan hozê li de
stê jinê bû û birêvebirina karê êlê bi tekbîra
wê bû.Jinê bi hêza milê xwe û têkoşîn û west ci
hekî bilind ji xwe ra peyda kir.Mêr bê çar bû
ser jêra dadixist,çunkî zilam bê sûd bû jibilî
nêçîrê ti jê nedihat bike.Ev hoyên ha bûn,hiştin
ku jin bibe serkanîya efsane û dîroka gelek mile
tên cîhanê.

Li serdema dayikê de çewsandina çînayetî neha
tibû naskirin,bindestî û serdestî nebû,çunkî ser
mayekê taybetî çênebûbû,berhem tevayî bû,xwedî
kirinek hevpişk bû,mirov gerekê hev bûn, amîrên
berhemî seretayî bûn û bi rengekî sakar bûn.Çew-
sandina çînayetî xîşkezo(miwazî)ye li gel pêşke-
tina sermaye
tina sermaye û komkirina wî li destê mirov da

Li qûnaxa diduwa ji çerxê berberî çaxê ku
mêr terş(pez û malat)kedî kirin,garanên û kerî-
yên pez peyda bûn,sermayekî mezin kom bû li jêr
destê wî da.Zilam bû xwedîyê terş û talanekî gi
ran.Xwedîkirina pez û dewaran pêwîstî mêrga bû.
Xwedîyê sermaye destkir bi dagîrkirinê ji bo çê
rîya terşê xwe,gelek cî û zevî dagîrkirin.Herwe
ha çêlek û ga ji bo cotî bikar anîn.Bi vî awayî
çandin ji destê pîrekê derxist.Li dawîya çerxê
berberî hesin peydabû,çekên şerî û bergirîyê pê
çêkirin û herweha amîrên çandinê jî,û awayên
berhemînanê hatine guhartin û bi rengekî baştir
çêbûn.Berhem zehf bû,sermaye kom bû, mirov dew-
lemend bû,mêr bihêz bû ,dest danî ser her tiştî
sermayekî taybetî li cinê berhemê tevayî çê bû.
Dîsa mêr per şikestî bû beramber destûreke ke-
vin .Li gora vê destûrê zarok bi navê dê bûn.Li
paş mirina bav zarok bê par diman ji mîratê ba-
vê xwe,û li gel dîya xwe diçûn hoza bavê dayikê
çunkî malê bavê parvedibû li ser xuh û birayên
bav yan jî zarokên wan ta ku mal bimîne li nav
hoza bav de.Zilam xwest vê destûrê bişkîne,û li
gor daxwaza xwe destûreke nû danî,çawa ku malba
ta tekane pêk hat li navbera jin û mêr da mehir
hate birîn.Ev rengê malbatê ku li ser bingehekî
berjewendî ava bûye ta niha wusa maye,her wekî
Markis û Înglis dibêjin: Peywendî li navbera mê
rî û jinê da li ser hîmên evîndarî û hestekî he
vpişkî û xwerist tucar ava nebûye,lê belê ev re
ngê dawîyêye ya malbata tekane,li ser pergalên
aborî hatîye dirust kirin.Herçende malbata jin
û mêr ya tekane hebû,belê girêdaneka bêbend bû,
herdu la ser bi xwe bûn.Girêdana jin û mêr yan
cudabûna wan bi destê her yekî ji wan dibû,gava
bixwesta .Lê dîsa paş mirina bav zarok li gel
dayika xwe diçûn mala bavê diya xwe.Lê ev rengê
paşî ji damezrandina malê girêdana jin û mêr bi
şêweyekî taybetî bû ,jin pêbend bû bê dev û zi-
man bû dûr ket ji komel û karê wê nema.Ev guhar
tin hemî ji bo ku guman li ser bavîtîya mêr ne-



mîne,terş û sermaye neçe ji kesê ra û ji zarokên

# BI HELKEFTINA BORÎNA 77 SALAN JI JIYANA CASIMÊ CELÎL



**AMED**

Helbestvanê Kurdê Sovêtistanê yê mezin Casimê Celîl di sala 1908 an da, li gundê Quzulqulê nehiya Dîgorêyî,Qeza Qersê(Kurdistana Bakur)ji dêya xwe bû.Di zarotîya xwe da Casimê Celîl roj û şevên payîz û zivistanan di odan da û roj û şevên buhar û havîna di hembêza sirûştê da borandîne.Ew li gund neçûye dibistanê ji ber ku di zarotîya wî da dibistan tinebûn.Dibistana wî ode û sirûşt bûn.Bi vî tonî zargotineke dewlemend ji wan odan hilanî ku di mandê de bû hîmê efrandinên wî.

Di biçûkanîya xwe de,Casimê Celîl şer,sitem, kuştin û xwîn rijandina sala I9I8 an bi çavê xwe dîtin.Raste ew di wî şerî de sax ma,lê bi rêyekê mirov bawer nake ku çito canê xwe reha kir.Heta niha jî,helbestvanê hêja kesera dîtina gund,dê,xûşk,bira,pismam,mirov,hogir û hevalên ku di wî şerî de wendabûnî dikişîne.

Piştî ku ew sax digihêje Ermenistanê dikeve sêwîxana Alêksendrapolê(niha Lênînakan e),paşê dikeve a Celaloxlîyê(niha Stêpanavan e) .

Çaxê ku Ermenistana Sovêtî ava dibe,rêdikeve Casimê Celîl û bi tîpên Mêsrop Maştos (ê ku elîfbaya Ermenî danî) hînî xwendin û nivîsandinê dibe.

Sala I927 an Partîya Komunîsta Ermênistanê wî dişîne Bekûyêku di dibistana Pişkavkazê a leşkerî de bixwîne.Sala I930 î dikeve Partîya Belşevîk ji bo ku xwe bi gişkî pêşkêşî karê avakirina hevpişkîyê di welatê xwede bike.Peyra,cîye xwe diguhêze û diçe dibistana Tiblîsê a leşkerîyê.Di sala I93I an de, wî dişînin Rewanê(Yêrîvanê) û dibe dîraktorê Têxnîkoma Kurdî a pişkavkazê,ya ku taze vebûyî.

Di destpêbûna salên 30 î da, Casimê Celîl , Ereb Şamîlov,Hecîyê Cindî,Emînê Evdal, Cerdoyê Gênco,Ehmedê Mîrazî û Wezîrê Nadirî li dora rojnama " Rya Teze" dicivin û hîmê toreya Kurdên Sovêtistanê datînin.Sala I932 an ta sala I939an Casimê Celîl dibe serwêr û rêdaktorê berpirsyarê para toreya Kurdî di çapxana"Haypêthratê" de. Di bin rêdaktorîya wî da gelek pirtûkên rêzanî, bedewtî,wergerandî û hînkirinê çapbûne. Di sala I934 an de,di konfiransa kurdzanîyê da a hemtifaqîyê li Rewanê ew beşdar dibe.Di sala I938ê dikeve Fakûltêta instîtuta Rewanê a hînkirina ziman û toreyê û di sala I94I an da kuta dike . Di van salên xwendinê da Casimê Celîl li Rewanê dibe dîrêktorê dibistana Nar-Dose a orte(Navîn) û bi hêvarê dixebite.

Di sala I955 an da,di meha çilleyê de beşekî kurdî di Radyoya Ermenistanê de vedibe û Casimê Celîl dibe rêdaktorê berpirsyarê beşê xeberdana Kurdî.Di destpêka salên 70 Casim dibe rêdaktorê berpirsyarê çapxana Hayastanê(niha Sovêtakan Groxe). Ji salên 30 î de helbest û ristên Casimê Celîl di rojnama Rya Teze de belav dibin.Wisajî di van salanda efrandinên H.Tûmanyan,A,Pûşkîn û ên dinê wî wergerandine zimanê Kurdî û çapkirîne.Di sala I954 an da,berevoka wî"Elegez" bi zimanê Ermenî ronayî dibîne.Salekê bi şûnda ber hevoka wî " Beyt-serhatîyê Kurdîyê Hub-hizkirinê" bi wergerandina Ermenî li Rewanê çap dibe . Peyra,di sala I957 an da berevoka wî "Kanya Wetenîyê"ji alîyê Haypthratê ve hate belav kirin. Wisa jî ,sala I960 î dîwana wî "Rojê Min" dîsa ji alîyê wê çapxanê ve tê belav kirin.

Sala I968 an berevoka wî " Doroyamî Vrênên " (Rê û dirbê We'de da)bi zimanê Ûrisî li Moskvayê hate belavkirin. Sala I970 dîwana wî "Kilamê Çya " ji alîyê Hayastanê de çap dibe.Pênc salan şûnda dîwana wî " Oda Kurda " dîsa jî alîyê wê de çapdibe. Sala I980 dîwana wî " Kurdê Bengî", ji alîyê Sovêtkan Grox de çap dibe.

Efrandinên Casimê Celîl di pir rojname û govarên Sovêtî de çap bûne; wekî Pravda,Îzvêstîya Eskerê Sor,Pîonêr Kanç, Avangard,Sovêtakan Hayastan,Komûnîst,Grakan Têrt ...û hwd.

Casimê Celîl çend efrandinên dinê jî êd nivîskarên Kurdên Sovêtistanê nivîsandine û rêdaktorîya wan kirîye wekî"Efrandinê Nivîskarê Kurdayê Sovêtîyê" 1948 ," Nivîskarê Kurmanca Sovêtî-

BO LAPERE ( 42 )

# QENATÊ KURDO ÇÛ HEQÎYA XWE



Roja 3I/Çirya Pêşîn/I985 ê dîsa stêreka asmanê edebyata Kurdî rijîya,Piştî ku bi mirina seydayê Cigerxwîn li dawîya sala I984 ê stêrek vemiryay.Vê carê zana û şarezayê ziman û çanda kurdî Profîsor Qenatê Kurdo çû heqîya xwe.Bi bihîstina vî xeberî gelê me tevda û nemaze nivîskar û zimanvan pir xemgîn û dilnexweş bûn,çima ku seydayê Qenat bi rastî xetîrek bû di rêya me da, bi nivîsandin û lêgarînên xweyên kûr û zanistî edebyata Kurdî zengîn kir,û gelek rê û derî ji zimanvanan ra vekirin û gelek kujîyên tarî di edebyata Kurdî da jêra ronkirin.Bi perwerdekirina kadroyên pispor û jêhatî bingehê ziman û edebyatên Kurdî mikum kirin.

Qenatê Kurdo sala I909 ê li gundê Sûzirê li wîlayeta Qersê li Turkîye ji diya xwe bûye , û li sala I9I8 ê ji ber zordarîya destelatdarîya Tirka revîye û tevî malbata xwe çûyne Ermênya û paşî li bajêrê Tiblîs paytextê Komara Gurcistana Sovêtî binecih bûne.Qenat li wir ketîye ber xwendinê.

Sala I928 ê li ser pêşniyara Komîta Navînîya Partîya Komunîst li Ermenistana Sovêtî Qenat û 28 xortên kurd ji bo xwendinê li zankoyê çûne Lênîngirad.Di zankoyê da wî û hinek hevalên xwe govareka kurdî derxistin.Sala I94I ê berevanîya nameya xwe kir ji bo Diktorîyê.Sala I955 ê bûye mamosta di Para zimanên Rojhelatê di zankoya Lênîngirad da . û sala I959 ê bûye Serokê Para zimanê Kurdî di Zankoya Lênîngirad da .

Roja 8/II/I985ê,li Lînîngiradê,di "merasîm"eka fireh da,ku Enstîtûta Lênîngirad a Rojhelatnasîyê,bi serokatîya Ekîmoşkîn.O.Fiyadorovîc, jêra pêk anîbû,termê Qenat xistine nav gorî,di"merasîm"a da gelek dost û nasyar û hevkar û şagirdên wî,û zana û ronakbîrên Sovêtistanê amadebibûn ,û di civînêda gelek gotar hatine xwendin,ji wana ; gotarek bi navê Enstîtûya Rojhelatnasîyê li Lînîngiradê,gotarek bi navê Komela Kurdî a Kargêr li Enstîtûya Rojhelatnasîyê,gotarek bi navê rêkxistinên Partî Demokratî Kurdistan/Îraq,û Partî Demokratî Gelî Kurdistan,û Partî Sosyalîstî Kurdistan/Îraq,û Partîya Hevgirtina Gelê Kurd li Sûrîya û Partîya Demokrat^a Kurd li Sûrîya"Elpartî " li Sovêtistanê,û çend gotarên din bi navên komele û yekîtîyên xwendevanan li Ewrupa .Herwisa gelek têligrafên partî û rêkxirawên kurdî û yên zanayên Sovêtistanê jî hatine xwendin wekî telegrafa Ekadîmîka Zanistîyên Sovêtistanê.

Bi vê helketinê Partîya me,Partî Demokratî Gelî Kurdistan,têligrafek ji malbata seydayê Qenatê Kurdoy ra şand û têda dilnexweşîya xwe bi bihîstina vî xeberî xuya kiribû û di wê têligrafêda hatibû(..Çûne heqîya seydayê Qenat ziyanèka mezin bû,ne tenê ji çand û zanînê ra belkî ji gelê Kurd tevê ra..) .

Eve jî hinekin ji berhemên seydayê Qenat :

-Destûra Zimanê Kurdî,Yêrîvan I956,bi Kurdî.
-Ferhenga Zimanê Kurdî(Ji bona dibistanan),Mosko,sala I957 ê.
-Zimanê Kurdî,Mosko,sala I96I ê bi Rûsî.
-Ferhenga Kurdî-Rûsî ,Mosko.,sala I960 ê .(34000 gotin têda hene.)
-Destûra zimanê Kurdî,zaraveyên başûr û bakur , Mosko sala I978 ê ,bi zimanê Rûsî.
-Nivîsandin û wergerandina çîroka Sêva Hacî, bi Rosî,I962.
-Dastanên gelerîyên Kurdî li ser Rostamê Zal, bi Rosî,I978.
-Zimanê Kurdî,Firankfort,I98I.
-Tarîxa Edebyata Kurdî-I-, Stokholm, I983.
-Nivîsandin û wergerandina çîroka DÎMDÎM,bi Rosî
-Ferhenga Kurdî-Rûsî,Mosko sala I983 ê(bi zaraveyê Soranî),25000 gotin têdane.
-Çend deqqên folklorîyên Kurdî,sala I978 ê Korê Zanyarî Kurdî li Bexda wergerande ser tîpên Erebî û çap kir.
-wergerandina pirtûka ( Impery...izm bilindtirîn qûnaxa Sermayedarîyê ye-Lenîn)ji Rûsî bo Kurdî.

Herwisa seydayê Qenat bi deyan gotar û lêgerînên zanistî di govar û rojnamên Ku..î û Sovêtî da li ser ziman û dîrok û çanda kurdî belavkirîne.

lêvizîonê pêşdahatinêd wê komê nîşan dikin . Em gelek temaşaçîyara tevayî reqasa wîye çapik-çel engva heyr-hijmekar man.Dema min çendekî pêşda pêra bi têlêfonê xeberda wî bi kurdîke delal û zelal bersîva min da.Gava min jê pirsî,ku ne axir bajarê Groznîêda kurd tunene,ew ji ku usa kurmancî hîn bûye,ewî bersîva min da û got,wekî gava ew dya xwera wextêda ji Kurdistana Îranê hatine,dya wî tenê kurdî zanîbûye û pêra hetanî niha jî kurdî gotina dike.

Ebdulle Muhemed bi koma xwera tevayî gelek cara çûye Moskvaê û Hordananê,Vladîvostokê û Sûrîaê,Mozambîkê û Taşkentê.

Gava hemû artîstên Sovêtistanêye Kurde profêsîonal,usa jî rêjîsorê têatra Yêrîvanêye pantomîmaêye ( têatra bê zar) sereke Paşa Polatov alîê dereca xweda xweyê xwendina bilindin,Lê paşa du înstîtût xilaz kirine-yek Moskvaê,yek jî Lênîngiradê.Têatrê wî awahî li YekîtîSovîêt sê hebin.Serkarê yekê ji wana ewledê kurde.Ew çend pêşdahatinêd têatra xweda êlêmêntê folklora kurdî daye xebatê.Ew yek famdarîye,çimkî nava deba kurdada,erf-edetê meda derecêd pantomîmaê hene, çawa ji bo nimûnê,wextê kosegeldî digere, gava bûka teze bûktîê dike û cîêd mayîn.Çawa em pê hesyan,têatr hazir dibe bi motîvê pîêsa"Memê û Eysê" spêktaklêkê ya bêdeng nîşanke .Pîês nivîskar Xelîlê Çaçan Mûradov nivîsîye.Têatra pantomîmaê,ku Paşaê Reşîd Polatov serokatîê lê dike van axirîya tevî fêstîvala cahila û xwendkaraye hemdinyaêye I2 bû li Moskvaê û hêjayî diplomê bû.

Wextêda miqaleke Paşa Polatov rojnema Kurdîye "Rya teze"da çap bûye bi sernivîsara"Pantomîma nava deba kurdada".Lê derheqa wî û têatra wîda gelek rojneme û kovarêd Sovêtistanêda miqale çap bûne.

Eva çend sale ,ku du ewledê kurda-xwîşk û bira Vladîmîr û Natêla Qasim têatra Lênîngradêye akadîmîêye opêraê û balêtêda dilîzin. Ewana artîstêd balêtêye naskirîne. Vladîmîrê Qasim Ecemov dilqêd serekeda dilîze.Ewî hetanî niha dilqêd usaye dijwarda lîstîye,çawa ku dilqê Romêo balêta Prokofyêve "Romêo û Cûlîêt"-da,Armên balêta Aram Xaçatûryane " Gayanê"da û yêd mayîn Hetanî niha xûşk û birêd binecîê bajarê Tbîlîsîêyî wextekê tevî têatra xweye bi nav û deng çûne welatêd Avstrîaê,Mongolîaê,Îtalîaê,Komera Almanîaêye Dêmokratîê û hunerê xwe nîşan gelek gelêd dinyaê kirine.

Artîstekî kurdî mayîn Hesenê Qulîye.Eva çend salin ku ew artîstê têatra Yêrêvanêye dramatîkîêye.Nava wan salada gelek dilqada lîstîye. Gava ewê têatrê spêktakla "Hamlêt" danî,Hesenê Qulî dilqê keşîşda kivş kirin,û ewî bi lîstika xweva maşoqê hunurmendîê zendegirtî hîşt.Hazira ,herwaha rojneme û kovarêd komarê qîmetekî bilind dane hostatîya wî. Hesenê Qulî kînoşikla da jî dilîze.Van axirîya gava kînofîlma bi navê "Pişt hevt çyada"nîşan dan ,dilqekî serekeda ewî dilîst.Ew wedekî dirêj bûye rêjîsorê têatra Elegezêye kurdaye gelêrîê.

Artîstêd kurd xwezma,dereca sîrkêda pirin,mesele,Sertîv Mînêralov wextêda kloûn(mesqereçî - henekçîê) sîrka Tbîlîsîê bûye,gelek sala Nazî Şîrayra tevayî usa jî sîrka Yêrêvanêda lîstîye Têmûrê Dasinî fokşçî-laqirdçîê sîrka Tbîlîsîê bûye û pêra jî li fîlarmonîa Gurcistanêda,wextê konsêrtêd êstradaê pêşda hatîye.Niha ew navça Gurcistanêye Gardabanîêda ,li qesra kûltûraê serekê koma artîstêd sîrkêye.Ezîzê Bişar niha artîstê sîrka Tbîlîsîêye.Sîrkêda ew du janrada dilîze,cîkî çawa fokisçî,cîkî jî terewila kedî dike.

Bilî van artîstêd profêsîonal,usa jî gelek artîstêd kurdaye xwexwehînbûyî hene li têatrêd Tbîlîsîê û Elegezêye kurdayê cimetîêda.Gelek artîstêd xweyê şuret û merîfeta pir 40-î zêdetir radîokompozîsîaêd xeberdanêd radîoa kurdîda lîstine.

Dêmek,we derc kir,wekî artîstêd Sovîêtistanêye kurd digihîştine çito açixîya ne tenê nava kurda û çend komarada,lê usa jî temamîya welêt û welatêd derekeda jî.

## PÎROZBAHÎ

Bi helkeftina cejna Newrozê a pîroz, bîrhatina serketina KAWEyê hesinkar , nûnerê hêza rêncberan,bi ser Ejdehak ê zordar û xwînmêj,desteka nivîskarên govara PEŞENG gerimtirîn pîrozbahîya ji hemî kur û keçên netewê kurd ra pêşkêş dike.Sala nû ji pêşmergehên qeremanên Kurdistanê ra,ji pale û cotkar û rêncberên Kurd ra,ji malbatên şehîd û girtîyan ra,û ji hemî pêşmerge û heval û hogirên partîya me,Partîya Demokrat a Gelê Kurdistanê,ra pîroz dike.Û her bi vê helkeftinê silav û rêzên germ ji canê hemî şehîdên Kurd û Kurdistanê ra dişîne.Û hêvîdare ku sala nû sala yekgirtin û mikumkirina xebat û têkoşînê be li dijî dijminên faşîst û şovênîst,ejdehakên roja îro, ji bo nehêlana zordarî û kedxwarîyê û ji bona azadî û serxwebûnê.

# ARTÎSTÊN SOVÊTISTANÊYÊ KURD ÊN PRFÊSÎONAL

## -TÊMÛRÊ XELÎL MÛRADOV-

Damekê, gava derheqa pêşdaçûyîna kurdêd Yekîtî Sovîêtda dibû xeberdan,mirov nikarîbû nava miqalekêda derheqa açixîêd her derecada bigota. Lê îro ew destanîn haqas gelekin,ku em mecbûr dibin paraveyî ser dereca bikin û derheqa her derecekêda cihê bêjin.Carna jî usadiqewime , ku derheqa destanînêd kurdekî Sovîêtistanêda miqalek jî têrê nake,ku bê ber çava,ku ew bi saya qeydê meyî sosîalîstîê, nava jiyanê da mîaserkirina sîaseta Lênînîêye miletîê gihîştîye çi destanîna .

Benda meye îroyînda emê tenê derheqa derecekê pêşdaçûyîna çanda me- dereca hunurmendîê,diha rast,derheqa artîstêd Sovîêtistanêye Kurdda wera gilîkin.

Vê demê bajarê Yekîtî Sovîête Moskvaê,Lênîngradê,Yêrêvanê,Tbîlîsîê,Groznîê û bajarêd mayîn da gelek artîstêd Kurde profêsîonal hene.Nav-dengê hineka ji wana temamîya welêtda eyane,derheqa wana û hostatîya wanda gelek cara rojneme û kovarêd Sovêtîê û welatêd derekeye cihê-cihêda hatine çapkirinê,gava gilî hatîye ortê, gotine filan artîst eslê xweva kurde.Bi saya van yeka gel û neteweyên welatê me nasîya xwe dane pêşdaçûyîna Kurdêd Sovêtîê.

Îro dota Kurd Nazî Şîray artîsta sîrkêye dinêeyane,ewledê kurd paşa poladov rêjîsorê têatra Yêrêvanêye pantomîmaêyê serekeye,Ebdulê Muhemed reqasvanê koma bajarê Groznîêye bi navê "Vaynax"-e, Vona û Natêlla Qasim artîstêd balêtêne li bajarê Lênîngradê,Zîna Telo dengbêja koma Tbîlîsîêye"Rêro"-e û gelekêd mayîn.

Niha derheqa wan artîsta û hinekêd mayînda ezê bi hûrgilî binivîsim:

Nazî Şîray...Ev nave navekî nase bona gişka . î ewê nav bi xwe qazanc kirîye.Dota Kurd Naza Şîray eva 35 sala zêdetire,wekî ser dikê sîrkêd Yekîtî Sovîêt û welatêd dereke,cilê Kurmancîyê reng-rengî xwekirî temaşevana hewas-hijmekar dihêle.Artîsta komera Ürisêtêye Sovêtîêya Sosîalîstîêye Fêdêratîve emekdar salêd cihê-cihê sırkêd Tbîlîsîê,Yêrêvanêda lîstîye,lê paşê çûye sîrka Moskvaê û hetanî niha jî wêderê pêşda tê. Lîstika wêda hejmarêd usa hene,ku hetanî nihajî cihanêda kesîra li hev nehatîye wana biwekilîne Mesele,ew du defê biçûk digre destê xwe, hevra berdide,defa destê rastê ser milê wêra derbaz dibe diçe ser milê dinê,defa dinê jî wî awayî,, ber hevra ser patika wêra derbaz dibin û ne hev dikevin,ne jî dikevin.Lê ênsîklopêdîa ermenîaye Sovêtîê hejmareka xweda derheqa Nazî Şîrayda nivîsîye,wekî hejmarêd wêye"Heykelêd tûnc"sertaca lîstika wêye.

Çaxê ez Moskvaê çûme mêvanîya wê,ewê derheqa xwe û lîstika xweda ha minra gilî kir:-Hejmara mine lape hizkirî ewe,gava ez cilê Kurdî xwedikim,bi desta defê dixim,lê bi herdu linga jî ser haceta anegor miqamê Kurdî lê dixim. paşê nas-nenas min pirs dikin:Ew çi sazbendîye,ya kîjan miletîye?Ez jî kubar bersîva wana didim, ku ya Kurdîye û ez jî Kurdim.Paşê gilî tê ser gelê min,û ez wan ra şirovedikim.

Belê Nazî Şîray her dera-ji Yêrîvanê girtî hetanî Parîzê,ji Lênîngradê hetanî Îranê,Turkîaê hetanî Amêrîkaê,her dera timê jî navê Kurdêd Sovîêt bilind xwey kirîye,mala xwe bi xalîçê Kurdîye bedewva xemilandîye.

Jina Kurd timê ji sazbendîê hiz kirîye li şaya,govenda,bindarûka sitiraye.Bingevanê lîtêratûra ermenîya,xêrxwezê gelê Kurda-Xaçatûr Abovyan wextêda gotîye,ku her kurdek bi ruhê xweva dengbêj yanê jî hozane.Lê tenê bi saya qeydê Sovêtîê mecal kete Kurda,ku hunerê xwe,zên û firasetê xwe nîşanî bi hezara temaşavanêd miletêd cihê-cihê bike.

Dota Kurda Zîna Telo çend sala bûye alîkara rêjîsorê têatra Tbîlîsîêye ser navê Grîboêdov paşê bûye dengbêja koma sitiranêye bi nav û deng,ya bi navê"Rêro".Çend plastînkêd(selik)sitiranên wê derketine.Ew bûye rêjîsora têatra Tbîlîsîêye kurdaye gelêrîê.Wêra tevayî kubreka kurmancî lêye.Lema jî gava çend sala pêşda paytextê Komera Gurcistanêye birastîê rêdaksîona xeberdanêd radîoêye(pêlweş)kurdî hate vekirinê, ewê teglîf kirin û ew bû dîktora(peyvkar, xeberdan kir) wê radîoêye pêşin.

Derheqa artîstê koma Çêçêno-Îngûşîaêye avtonoma emekdar Ebdullê Muhemedda em dikarin bêjin ku ew eva 25 sala zêdetire wekî reqasvanê koma bi navê "Vaynax "e serekeye.Ew ser dika mînanî teyrekî baz direqise û ser afîşa wêneyê wî awa hî hatîye kişandinê.Gelek cara ji Moskow bi tê-

# BI HELKEFTINA 30 SALÎYA ŞIVAN PERWER

Roja 27/I2/I985 ê Enstîtuya Kurdî li Parîs , bi harîkarîya Rêkxistina Têkoşer li Belcîka, bi helketına 30 salîya hunermendê mezin Şivan Perwer şahyaneka mezin li bajêrê Broksil çêkir. Di vê şahyanê da nêzîkî 700 kesan amadebûn,ji wana nûnerên gelek pârtî û rêkxistinên Kurdî û Tirkî û biyanîyên pêşverû .Herwisa xanima Fatoş Gunay jina rehmetîyê Yulmaz Gunayê nemir jî di şahyanê da amade bibû,ku di gotara xwe da Fatoşê dilxweşîya xwe bi wê helkeftinê xuya kir û qala rolê Şivan Perwer kir di xizmeta Doza Kurdî da di rêya stiranên xweyên şoreşgêrî da,yên ku li nava gel da wisa belavbûyn heya rijîmên dağirker jê bitirsin.Ji lewra kar û xebatên wî hêjayî pîrozkirinê û rêzlêgirtinê û piştevanîyêne,û afrandinên wîyên hunerî destpêka qûnaxeka nû di dîroka muzîka Kurdî da nîşan dide.

Şahyanê bi gotara Kendal Nezan rêberê Enstîtuya Kurdî li Parîs destpêkir,ewî got :"Dibe şahyane çêkirin bi helkeftina ji dê bûnê karekî ne asayîbe di nav gelê meda,lê hunermendê me Şivan Perwer bi xwejî ne yî asayîye,ewî di demekî kurt da karî dengê xwe bigehîne her dera Kurdistanê û rolekî mezin di huşyarkirina gel da bilîze,jilewra ev şahyane jî tenê rêzlêgirtine ji wî rolê mezin ra yê ku hunermendê meyê xort di xizmeta Doza Rizgarîya Gelê me da gêrandî.

Piştî xwendina çend gotaran ji alîyê mêvanan Şivan li pêş mêvanan rawestîya û supasîya wan kir,û got:" Ez je wera soz didim ku cihê bawerîya we bimînim,û her çî ji min tê pêşkêşî Doza pîroza gelê xwe bikim,di rêya pêşxistina stiran û muzîka Kurdî da bi rewşa Tevgera Rizgarîya gelê Kurd ra."

Paşî Şivanî û Gulistanê bi hevra çend nimûnên stiranên xweyên şoreşgerî pêşkêşkirin. Herwisa gelek nameyên pîrozbahîyê ji hêz û partîyên kurdî,û ji hinek endamên perlemantoyê Belcîkî jî di şahyanê da hatine xwendin,û nama rêkxistina partîya me jî di nav da hate xwendin.■

---

dayîye.Ji keçên xwe ra vê rastîyê bêjin.Bê xebata wan ne ew ne jî Kurdistan xilas dibe.Maf tên sitandin,lê nayên dayîn.Mirov ji bona mafên xwe pars nake.Şêr şêre ,çi jin e çi mêr e...

Pirsyara 5) Tu paşeroja strana polêtîkîya Kurdî çawa dibînî ?

Bersiv) Sitranên poletîkî êdî ji gel ra bûye mal.Ber ku jiyan bi xwe politîke .Hizkirina welat ,bê fikrên politîkî nabe.Îro bi sedan sitranên politîkî û welatparêzî wek kulîlkên Deşta Heranê geş dibin,çiyan û çeman dixemlînin.Di pelên kulîlkên Nevrozê de neqşdibin.Dawîya wan ronahîya ha ji Suleymanîyê heta bigre Mehabadê,Diyarbekrê diçirise,diberiqe.Tu kes,tu qewet nikare vî agirî bivemrîne.Bo ku tov hatîye avêtin.Sîmbil tijî bûne ,qeweta çi milan nagihije van simbilên têr û tijî. Ez li hatinê bi çavên hêvî û bi dilekê germ dinêrim.

Pirsyar 6) Kênca(te'sîra) dûrîyê ji welatî li ser Kurdên mişext(Mihacir) çiye?Û wezîfa mişexta li Ewrupa çiye ?

Bersiv ) Bi dehezaran gelê Kurd li derveyê welat dijîn.Pirranîya wan nikarin biçin welatê xwe.Karûxebata wan tiştekî pirr başe.Eger îro li Ewrupa mesela kurd tê naskirin û pêşva diçe,xebata wan kesan di vî warî de nayê inkar kirin.Xasma muzîk û çanda Kurdî bi serbilindî şaxûbaxên xwe dide û digihije gelê me.Em gelek vê rewşa ha baş bi kar bînin û li hev xwedî derkevin.Lê mixabin xebata me hin netêre.Tiştên ku em dixwazin hîn nahatine cî.Hêviya min ji partî û rêxistinên me eve ku destên xwe bidin hev û alîkarîya çanda gelê Kurd bikin.

Pirsyar 7) Eger gotineka te ji Xwendevanên GEL û PÊŞENG ê ra hebe kerem bike.

Bersiv) PÊŞENG û GEL di warê çanda Kurdî da gavên baş davêjin.Em bi xebata wan kêfxweşin.Hêvîya min ewe ku bikaribin hebûna xwe bi domînin.Û herwisa jî cih bidin Klasıkên Kurdî û hunermendên kevin bidin naskirin û ji wan hunermendên nemir şevan pêk bînin û xelata belav bikin.

Bijî Kurdistan,bijî pêşmergeyên qareman■

# HEVPEYVÎNEK BI HUNERMEND A NAVDAR GULISTAN RA



Pirsyar I) Kurtîyekê ji jiyana xwe,û çawa tu ketîye warê hunerî da ?

Bersiv ) Ez li sala I960 ê da li gundekî Ruhayê bûme.Em Heşt xwîşk û bira ne.Ez gava ketim sala pênca ,mala me çû bajêr.Lê tu firq di navbera gund û bajêr da tunebû.Bo ku gelê bajêr jî kurd bûn.Lê roja ku min dest bi dibistanê kir,wê çaxê min firqeka mezin dît.Jiber ku min bi tirkî nezanîbû.Kurdîya min qedexe bû.Ez li dibistanê tim kehr û lal bûm.Min newêribû devê xwe vekra,mamostê tirk min ceza dikir.Ji ber ku ku tirkîya min bi darê zorê û bi teperepê çêbûbû,ji wê rojê heta niha min ji tirkîyê hiznekir.

Em werin ser muzîkê:Ez jî wek her keçeka Kurd bi çanda xwe mezin bûm û min çavên xwe pê vekirin.Malbata min malbateke muzîkalbû.Muzîk perçek ji jiyana me bû.Her çiqas muzîka Kurdî qedexe bû jî,qeweta hikumata Tirkan nedgihişt çanda me ya hezar salî.

Bêguman di warê muzîkê da rola Şivan ser min zehfe.Şivan mamostê min e.Bê Şivan min nedkarîya gava bavêta .

Pirsyar 2)Çend stranên te hene û giringtirîn karên teyên hunerî çine? û te çi pirojên nû hene?

Bersiv)Sitranên min pirrin.Di warê sitranan de zimanê Kurdî pirr dewlemende.Wek bîreka bê binî ye,wek kaniyeke geşe.Mirov jê çiqas vexwe,hew qas tîn dibe.

Çawa hûn jî dizanin ,pirranîya sitranên min li ser Kurdistanê ye.Lê carna jî ez tiştên folklorîk jî dibêjim.

Ji bona min tu tişt di dinê de ji hizkirina Kurdistanê giringtir tune ye.Ez bi vê bawerîyê û bi van çavan li meselê dinêrim.Çand û muzîk çekên giranbuhane ji bo azadîya gel û ji bo Kurdistaneke serbixwe...Ez dixwazim vî çekî baş bi kar bînim.

Di meha Adarê de wê Sêlika min(Rekord)û kasetek derkevin.Stiranên min hem gelêrîne,hem jî nû ne.Ü dîsa jî, di meha Sibatê de me filmek çêkir.Film rewşa Kurdistanê tîne ber çav.Film seetek û nîve û bi kurdî hatîye kişandin.Di filmê da ez û Şivan dileyzîn.Ez bawerim,ev tişt destpêkeke başe ,ji bo sînema Kurdî.

Pirsyar 3) Dîtina te li ser rolê hunerî di xebata gelê me da çiye?

Bersiv)Tu gel heta niha bê huner û hunermendan xilas nebûye.Bo ku hem huner,hem jî hunermend ji nav gel derdikevin.Perçekî ji van in . Ku mirov bikaribe huner û hunermendên xwebaş bi parêze û li wan xwedî derkeve,ê mirov zû bigihîje armanca xwe...

Divê em huner û hunermendan,ji bo şiyarbûna gel amade bikin.Ne ji bona menfeeta xwe ya şexsî .Mixabin îro hinek hunermendên me bi dijminê gelê Kurd ra didin û distînin.Gelê xwe înkar dikin.Gelê Kurd tucaran van rûreşan af nake.

Pirsyar 4)Dîtina te li ser rolê jina Kurd di Tevgera Rizgarîxwaza Kurdî da çiye?Ü gotina te ji jina Kurd ra çiye?

Bersiv) Di zimanê Kurdî da "JÎN" jiyane. Bê jiyan tu tişt nameşe.Xilasbûna Kurdistanê jî bi jiyanê ve girêdayî ye.Yanî bê xebata jin û keçên Kurd dawa me nîvco dimîne .Em nikarin gavek pêş de herin, û em naçin serî.Gelên ku jinên xwe diperçiqînin ,an jî wana naxin nava şerên xwe ew gelan tim û tim bindestin, sito xwarin.

Ger civatekî mafên jinê dabe û tu firq nexistibe navbera mêr û jinan ew civat pêş de çûye û gihiştîye armanca xwe...Perçiqandina jinên Kurd perçiqandina Kurdistanê ye jî .En ku bi dehezaran Pêşmerge tînin dinê û wana dişeynin serê çiyayên Kurdistanê dayikê menin...Ma newisa ye?

Ez dixwazim ji jinên Kurd ra waha bêjim: Keçên xwe bişeynin dibistanan.Ji bo ku ew jî wekî we newin perçiqandin.Firqîyetê nexin nava kur û keçan .Mafên me bi xilasbûna Kurdistanê ve girê

→ →

JÎ LAPERE( 57 )

nan , her wekî rijîma Seddamê faşîst kirî li gor programekê şovênîstîyê faşîstî ji bo guherandina waqi'ê netewayetî li Kurdistana Îraqê .

Ji layekî din jî conta faşîst a kolonyalîst li Tirkîya ya ku para mezin ji Kurdistanê bindest kirî bi ramyarîya nemirovane li rast gelê me li Kurdistana Tirkî têr nebû lê berdewam hereşe û kiryarên dijminkarî li dijî gelê me li parçeyên dinên Kurdistanê jî dike.Û demê ku gelê Kurd û kêmatîyên neteweyîyên wekî Ereb,Ermen,Laz û Çerkesan ji sadetirîn mafên neteweyî û demokratîk bê par dike bi bêşermî qala demokrasî û mafên mirovan dike ji bo musilmanan li Bulgaristanê û propagendên derew li dijî wî welatî belav dike.

Li ser wan hemî sextîyan ra jî sala I985 ê sala xebateka mikum bû ji Tevgera Rizgarîxwaza Kurdî ra ku rêya xwe berew pêş birrî, û hêzên pêşmergeha berdewam bûn li ser weşandina derbên giran bo ser dijminan . Û her çende doza Kurdî piştevanîya cîhanîya pêwîst bi destve ne anî jî lê karî gelek piştevanîyê ji tevgerên rizgarîxwaz û hêzên aştîxwaz û pêşverû û demokratîk di cîhanê da bi destve bîne.

Demê kêmasîyên Tevgera Rizgarîxwaza Kurdî bidîne berçavan dibînîn giringtirîn xala lawazîya tevgera me di belav bûnê û yeknegirtinê û bikar anîna çekîye ji alîyê hinek hêzan ve ji bo çareser kirina lihevnekirinên navbera xwe da ,eva ku ji pîlanên dijminan pêve xizmeta kesê nake.Em nerazîbûna xwe ji van kiryaran xuya dikîn û pêwîstîya giftûgoyên demokratîk ji bo çareser kirina wan dupat dikîn.

Ey hêzên pêşverû û berevanên mafên mirovan: Em gazî we dikîn dengê xwe bilindbikin li dijî şêweyên nijadperestî û koledarî yên ku têne serê milletê Kurd yê pêtir ji 25 milyonan,ev şêweyên ku armanca wan nehêlana hebûna netewayetî ,û her wisa dijî kiryarên qirkirinê û li sêdaredanên tevayî.Û ji we dixwazîn piştevanîya gelê me bikin.

Bêy çareser kirineka dadmend ji Doza Kurda ra û misoger kirina mafên netewayetî û demokratîk ji bo gelê Kurd aştîya dadmend di Rojhelata Navîn da pêk nayê.

Bila sala I986 ê sala xurt kirina xebata şoreşgerî be li dijî Împeryalîzmê û Kevneperestîyê û jibona avêtina gavên mezintir di rêya rizgarî û aştîyê da li herêmê û cîhanê.

BERÇÎLE/I986

- -PARTÎYA HEVGÎRTÎNA GELÎ A KURDÎ LÎ SÛRIYA
- -PARTÎYA SOSYALÎST A KURDİSTANÊ/TİRKIYA
- -PARTÎYA SOSYALÎST A KURDİSTANÊ/ÎRAQ
- -TEVGERA RİZGARÎYA KURDİSTANÊ-KUK,SE-
- -PARTÎYA DEMOKRATA PÊŞVERÛ A KURDÎ LÎ SÛRIYA
- -PARTÎYA DEMOKRAT A KURDİSTANÊ/ ÎRAQ
- -PARTÎYA DEMOKRAT A KURDÎ LÎ SÛRİYA(ELPARTÎ)
- -ALA RİZGARÎ
- - PARTÎ DEMOKRATÎ GELÎ KURDİSTAN
- - PARTÎYA PÊŞENG A KARKERÊN KURDİSTAN
- - PARTÎYA ÇEP A KURDÎ LÎ SÛRİYA

---

viştên ku li ser îdolojîka şoreşgêrî avabûyn ve girêdidin guherînên çonêtî"New'î" di desteke da çêdibin,ewê pêtir berhemî bidin û wê bizanibin baştir kelk "qazanc"ji serkeftinên xwe bistînin,û heya rewiştên wan jî tên guhartin û hîn dibin çawa doza xwe li pêş cemawerî û li pêş berpirsên xwe jî bidin xuya kirin.

Ew pêşmergehên ku di vê qûnaxê da diborin bi sanahî dest ji şoreşê bernadin û ji ber tengavîya û yan ji ber şkestinan bêhîvî nabin ,û herwisa serdabirinên maddî yên destelatdarîyê nikarin wan bixapînin,bi pêçewaney ew Pêşmergehên ku ji ber hestên neteweyîyên pak têne nav şoreşê lê zû zû ew vedmirin û jinav diçin ji ber kiryarên bi zordarî û kedxwarî yên berpirsyaran û pûte pênekirin bi wan û yan ji ber sextî û astengên ku tên pêşîyê û kesê tênegehandîne ku e ve hemî wê biborin û li dawîyê serketin her ji bo şoreşê û şoreşgêraye çunkî ew li gel bizava dîrokê bi rêve diçin.

## JÎ RAPORTA POLÊTÎKÎ YA PARTÎ DEMOKRATÎ GELÎ KURDÎSTAN

# ÎDOLOJÎKA ŞOREŞGÊRÎ DI PIRAKTÎKÊ DA

Têgehandina îdolojîkî wekî her kiryareka din a şoreşgêrî pêtivî hindêye ku serokayetî li pêşîya leşkerê xwe be,û pêwendîyên rastewxwe pêra hebin,ne ewqas li pêş be ku leşker serokatîyê nebîne û pêwendî pêra nemînin,çunkî hîngî serokayetî bi tenê rêveberîyê li xwe dike bêy leşker .Yan serokayetî li paş bimîne ku rêveberîyê li xwe jî neke,û yan paşketî û xweperest û kedxwar be ku dijî pêşketinê be û rêya pêşketina xelkî jî bigre,û bibe asteng di rêya Pêşketin û geşbûn û berew pêşveçûnê da.

Di piraktîkê da ji bo me derket ku destpêkirin ji wî astî ku xelk jêra amadeye pêtivî karîye di astên cihê cihê da li gel dupatkirinê li ser pêwîstîya çekdarîya serkirdayetîyê ye bi tîorîya şoreşgêrî û zanîna bikaranîna wê li hemî derên cîhanê û derxistina encamên kêrhatî ji taqîkirinên wê ,û ji xwe bayî nebûne ku wisa bizanibin ew tişta ji xelkî baştir dizanin.

Li gel pêşmergehan ku pêşengên çekdarên cemawerîne û heya niha piranîya wan nexwîndewarin divê li ser rêbîrên wekhevîya madî li navberawanda û dijayetîya hemî awayên çînayetîyê û şerê sadetirîn şêweyên wê kirine bêne dupat kirin û li hember wan dilgermkirin û handana berdewame li ser kiryarên mêranî û hezkirina karkirinê û xwe bi nirxên şoreşgêrîve girêdanê di sinc û rewiştanda.Çunkî pêşmerge hêzeka çekdare yanku ew destelatdarîne li her gundê ew têdabin,herçend destelatdarîyeka katî jî bin lê ew dikarin xasteka xwe li ser gundîyan bisepînin heya eger ji bo kajmêreka bitenê jî be .Ji lewra divê wan têbigehînin û hînî dan û standina xweş bikin bi cemawerîra û nemaze bi cotkaran ra,û divê wan têbigehînin ku ev xwe gorî kirine ne ji bona zengînbûnêye yan ji bo bibin xwedî destelatdarîya şexsî,belkî ji bo azadîyêye û rizgarîya cemawerî ji zordarî û kedxwarî û çewsandinêye.Çunkî eger ew bi xwe zordarîyê bikin hîngî wan tenê zordar guherandîne,vêca qazanca şoreşê çîye û çima cemawer şoreşê bikin?

Her wisa ji bo me xuya bû baştirîn rê ya têgehandina Pêşmergeha û çekdarkirina wan bi îdolojîya şoreşgêrî rêya korraye li ser erk û berpirsî û mafên wan û li ser şoreşê bi berfirehî,armancên wê ,sitratijî û taktîkên wê û dost û dijminên wê ye.Divê eve jî bi awayekî sade be û bi nimûnên pêşçav di komelî da û ji dîroka gel,û nimûne herçend ji pêşçavan nêzîktirbin têgehiştina wan jî senahîtire.Divê her tiştên helal û her tiştên heram ji Pêşmergey ra bi şêweyekî sade bên nivîsandin mîna ferman û şîretan û serdeste berpirsyarbe di her helkeftinekê da bixwîne û ji bo Pêşmergeha şirove bike.Herçendî korr zêdetirbin û bi rûdawên Kurdistanê û Îraqê û welatên nêzîk ve bihêne girêdan encamên wan wê baştirbin.Demê destpêkirinê li gel her destekeka nû ya Pêşmergehan gereke mirov zû çaverêy encaman nebe û belkî di heftîya yekan da mirov hest bi bêhîvîtîyê jî bike ji ber sarî û xwedûr hiştinê û nepirsînê û bawişka û bêdilîyê li guhdanê lê piştî demekî, dibe mehekê jî bikişîne,encam xuya dibin, û tên dîtin mîna baxçekê gula yek yek dibişkivin û dibînî berêkanê dikin di zanînê da,û rêzgirtina wan netenê ji mamostayên xwe ra belkî ji xwera jî pêtir dibe çunkî ew hînî hinek tiştan bûne ku berî hîngî nedizanîn,û ew hatine danîn li ser rêya rast di şoreşê da û jiyanê jî.Û demê têdigehin û xwe bi hinek nirx û sîstem û re-

# DOZA KURDÎ DI CIVATA NETEWEYÊN YEKGIRTÎ DA

Di civîna 38 ê da ya Civata têkoşînê li dijî kiryarên şovênîstî û ji bona parastina kêmatîyan,ya ser bi Neteweyên Yekgirtî, da ya ku di meha Tebaxa bûrî da hatıye girêdan sê rêkxirawan Doza Kurda xiste rû.

Li roja 23/Tebaxê, demê giftûgo dihatine kirin li ser jêderketinê ji mafên mirovan û azadîyên bingehîn li hemî welatên cîhanê Xanima Vîrna Xiraf (ya zêrevan ji" Komela cîhanî ji bona maf û azadîyên gelan") bala civatê daye ser berdewamîya jêderketinan ji mafên mirovan û gelan û azadîyên wan yên bingehîn,yên ku gelê kurd li hemî parçên Kurdistanê jêra dibe qurbanî ,û got çawa Neteweyên Yekgirtî Doza Kurda pişt guhê xwe xistîye,çunkî wan mafê çarenûsê xwe heye li gorey yasayên Neteweyên Yekgirtî û dan bi serdarîya neteweyîya wan hatîye dan di peymana Sîver da û Civata Neteweyên Yekgirtî jî ,lê sala I923ê di peymana Lozan da ku hingî ji bo xizmeta berjewendîyên dewletên zormend hatîye girêdan hewildanên bi cih anîna peymana Sîver pûçkirin,û birastî eve kakila problema Kurdaye.

Paşî xanima PîpA Tîwxman bi navê"Civîyan ji bona mafên Kêmatîyan" dest bi axiftinê kir û gazinde kirin ji rewşa kurda li hemî parçên Kurdistanê ,û ji civatê xwest lı Doza Kurdî binêrin.Her wisa daxwaz kir giftûgoyên ramyarî li ser vê dozê bihêne kirin di Civata Tevayî ya Neteweyên Yekgirtî da .

Herwisa Bîkardo İspînûza ,yê zêrevan ji "Bingehê Ewrupa û Cîhana Sêyê" jî jêderketinên ji mafên mirovan û azadîyên mirovanî yên gelê Kurd nîşan kirin û got ev yeke bi serê gelê kurd tê piştî ku bûye kêmatî di wan welatên ku têda dijît ji ber parçekirina Kurdistanê ji alîyê Koledarên İnglîz û Firensî û Tirkî ji bona pitrola wê.Û got ku gelê Kurd mezintirîn gele di cîhanê da ku ne serxwebûna xwe standîye û ne azadîya pêşxistina xweya civakî û aborî.

# GEL LI SER XAKA WELATÎ

geş bibin û rêkxistinên xweyên partayetî û leşkerî û cemawerî pêş bixin û şêweyekî nîştimanîyê fireh bigrin.Piştî terora faşîstî li pêşîya van sextîyan da parvekirina axa rizgarkirîya kurdistana İraqêye ku Pêşmergeh dikarin bigehnê,û ev kare qet xizmeta xebata gelê me û daxwaz û armanc û yekîtîya wî nake.Divê gişt li ser vê diyardeya xirab rawestin ku rê li pêşketina şoreşê girtî û metirsîyeka mezin li ser paşeroja gelê me pêktîne.Divê bête lêkolîn û nexşên çareserkirinê jêra bêne danîn eger çend wext jî jêra pêwîst be.Vaye nêzîkî 9 salane li ser wê diyardê da bûrîn û jibilî lawazî û jihev belavbûnê tiştek jê derneket,û eger ew nemîne û hevgirtineka nîştimanî cihê wê bigre dibe axa rizgarkirî bibe kelayeka mikum li pêş dagîrkeran,û pêşekîyên pêwîst ji standina mafên netewayetî û dîmokratîk ra pêkbîne.Û her wekî me pir caranjî gotî dîsan dibêjîn:çi kêmanî nîne ku xwe ji hev ra biçemînîn,çunkî ew rê digre li xwe çemandinê ji bo rijîma faşîst û şovênîst û axayên wê yên İmperyalîst.Û herdemê yekîtîya şoreşê û hêzên şoreşgêr pêkhat hîngî derî vedibin ji bona serketinên li peyhev di rêya pêkanîna demokrasîyê û mafên netewayetîyên rewa da.

Pêwîste bînîn bîra xwe ku xebata çekdarî şanazîya gelê meye û diltenakera xemên wîyên zore û kewandina birînên wîyên kûre û tolevekirine ji kedxwaran jî, lê barekî girane û li ser rêyeka dûr û dirêje nemaze di peydakirina pêwîstîyên berdewam û pêş xistin û hêlana wê wekî karekî şoreşgêrî pak.

Vêca pêwîste li ser heval û hogirên partîya me û cemawer û dostên gelê me vê yekê paş guhê xwe ve ne havên û rolekî karîger bigêrin dibin barê xebata çekdarî da ya ku bi ser gelê me da hatîye sepandin û amirê bingehîn ji parastin û rizgarîyê ra.

Û bi nêrîna me divê tevayîya xebatên ramyarî û çekdarî û rageyandinî û têkoşînên partayetî û bereyî bajone ser coyekê ji bo pêkanîna bereyekî nîştimanî yê fireh ku hemî hêzên xebatkarên gelê me vegirîtin ji hêzên demokratîk û neteweyî û İslamî,çunkî her ew rêya diruste ji bo raperîneka giştî ya cemawerî û serhildaneka gelêrî ku dikare rijîma faşîstîya Efleqîya sedamî ji bin bibe û rijîmeka demokratîka helbijartî pêkbîne û mafên neteweyîyên rewa ji gelê kurd ra pêkbîne û İraqê vegerîne rêza rizgarîxwazîya Erebî û cîhanî.

# PARTÎYA KOMUNÎSTA IRAQÊ KONGIRA XWEYA 4 Ê GIRÊDA

Li Kurdistana rizgarkirî,li çiyayên bilindên welatî û di germe germa xebat û têkoşînê da, ji IO-I5 ê Çirya Paşîn a I985 ê Partîya Komunîst a Îraqê li jêr dirûşmê " Di cih da rawestandina şerî,û roxandina dîktatorîya faşîst,û ji bo pêk anîna Cêgirê demokratîk " kongira xweya çarê çê kir.

Kongirê bi gotara hevalê têkoşer Ezîz Mihemed,Sikretêrê yekê ê partîyê,destpêkir.Ew di gotara xwe da li ser giringîya kongirê axift,û ramyarî û xebatên partîyê şirovekirin,nemaze piştî ku partî ketîye warê xebata çekdarî. Herwisa bi dirêjî li ser şerê Îranê û Îraqê û pêwîstîya di cih da rawestandina wî peyivî.

Kongirê raporteka ramyarî û programekî nû û helsengandina xebata partîyê li salên I968-I978 ê belav kirin.Hewisa kongirê Komîta Navînî helbijart û Komîta Navînî jî di civîneke da endamên Mekteba Siyasî helbijartin û heval Ezîz Mihemed jî bi Sikretêrê yekê yê Partîya Komunîsta Îraqê helbijart.

Di programê nû da hatîye:" Partîya me, Partîya Komunîst a Îraqê, li ser rêbîra Marksist-Lenînîst li Doza Kurdî dinêre û helwîstê xwe jê diyar dike,ew jî dan pêdane bi mafê helbijartina çarenûsê xwe ye wekî hemî gel û neteweyan,çi biçûk çi mezin, ku cudabûn jî têda heye.Jilewra piştevanîya xebata gelê Kurd dike li hemî parçeyên Kurdistanê li dijî çewsandina neteweyî û ji bona misoger kirina mafê çarenûsî û yekgirtina wîya neteweyî,û her wisa jî piştevanîya xebata wî dike bi gelên ku pêra dijîn ji bo mikum kirina serxwebûna nîştimanî û demokrasîyê û pêşketina civakî... Û Tevgera Rizgarîxwaza Neteweyî ya gelê kurd dadinê ku parçeke ji tevgera demokratîk a şoreşgêr û hevpeymaneka bingehîye ji prolîtarîya Iraqê ra di xebatê da ji bo gehiştina armancên sitratîjîkî , û yekgirtina berjewendîya çînayetî û nîştimanîyên mezin yên çîna karkerên Îraqê û hemî rêncbera,û yekbûna têkoşîna wan,û berjewendîya pêşvebirina karê şoreşgêrî li Îraqê li ser hemî(î'tîbar)an dadinê. Partîya me piştevanîya xebata hevpişka herdu gelên Kurd û Ereb dike û yekîtîya bidil di vê xebatê da dijî Împeryalîzmê û Zayonîzmê û Kevneperestîyê, û ji bo na pêşketina demokrasîyê û pêçveçûna civakî.

# " BILA EM DENGÊ GELÊ KURD, Ê BÊDESTHELAT,BÎN "

Bila em dengê gelê Kurd ê bêdesthelat bîn" li jêr vê sernivîsê rojnama "ATLİM" organa Partî ya Komunîst a Tirkîya,hejmar (I70)/ I5/2/I986,gotarek li ser çewsandina gelê kurd , bi destên ceneralên faşîst,nivîsand.Di gotarê da hatîye:"Dema mamostayekî Kurd"Sedîq Bilgîn"piştî şikencekirinê gulebaran kirî(î'dam kirî),û desthelatdaran nikarî nîşanên şikencê li leşê wî veşêrin,û ev xebere li nav xelkî da belav bûy,komelek ji endamên perlemantoy yên Tirk ji partîya Civakî ya Gelêrî tevî çend rojnamevanan çûne Bîngolê, ji bo lêkolîna wê meselê.Piştî gelek dan û standina bi xelkê herêmê ra û peyivînê bi çend jinanra yên ku ew gulebaran kirin bi çavên xwe dîtîn li pasgeha polîsan li gundê Doxanlî,ew vegeryane Enqerê û ji belavok û dezgahên ragehandinê ra wisa gotin:"Si'et 4 ê spêdê roja I2/Îlonê/I980 ê ji bo xelkê deverên rojhelata Tirkî(Jî Kurdistanêra dibêjin.P)jîn rawestîya,xelk ketine jêr kontrulека tund,mirov ji tirsê pêve tiştekî di rûyê wan da nabîne,kesek ji wan nawêre bi dengê bilind bikuxe jî.Demê welatî dixwazin mafên xweyên yasayî bikarbînin kerb û kînên berpirsyara li ser wan zêdetir dibin.Eve du sal bi ser helbijartinan da derbazbûn û hêşta hukmê medenî li rojhelatê pêknehatîye û her qala wê jî tuneye.

Dibêjî berpirsyarên dewletê gişt li hevin li ser nehêlana mafên yasayî li rojhelatê .Gelek caran mafên yasayîyên welatîya têne qedexekirin tenê ji ber navê bajêrê wan Toncelîye(yan ku Dêrsime.P).Û perpirsyarên leşkerî û medenî kêfxweşin ku wan karîye rewşeka terorîstî di herêmê da pêkbînin. Xelkê wê derê bi tirs û lerz dijîn,heyanî nikarin ji egera tunebûna avê û rêya hatûçûyê û nebûna kar yan jî egera giranîya pêwîstîyên jiyanê bipirsin,û hêvîdarin ji dewletê ku mafên mirovatîyê biparêze."

Rojnama ATLİM di dawîya gotara xwe da dinvîse "Bila em dengekî bihêz bin ji gelê Kurd ra."

Her di wê civînê da jî Dr.Mubdir Elweys, emîndarê giştîyê Partîya Sosyalîst li Îraqê gotarek bi navê Bereyê Nîştimanî yê Demokratîk xwend,û têda zordarîyên rijîma faşîst a Seddam li ser gelê Îraqê,bi Kurd û Ereb ve, destnîşan kirin.Û qala şerê wêrankarê Îranê û Iraqê kir,û têkoşîna Bereyê Nîştimanî yê Demokratîk ji bo roxandina wê rijîmê û pêkanîna demokrasîyê di Îraqê da xuya kir.

Paşî partîyên Kurdistanî yên di kongirê da amade bûyî birûskek ji serok Qezafî ra şand û têda rêz û supasîyên xwe ji helwîstên şoreşgêrîyên wî ra xuya kirin,û piştevanîya netewê Kurd bi gelê Lîbya ra diyar kir li hember pîlanên İmperyalîzmê û zayonîzmê.

Herwisa biryarek di beyannama dawîyê ya kongirê da jî hatibû ji bo piştevanîya xebata netewê Kurd ji bo yekgirtinê û mafên xwe yên rewa.

Û Li rojên 2-4/2/1986 ê jî,li ser daxwaza serok Mu'emer Qezafî,Serokatîya Neteweyî ya hêzên şoreşgêrên Erebî civîna xweya duwê li bajêrê Terablusa Rojava kir.Wefda partîya me,Partî Demokratî Gelî Kurdistan,jî tevî wefda Bereyê Nîştimanî yê Demokratîk têda amade bû.

Di civînan da gotûbêj hatine kirin li ser rewşa niha ya Welatên Erebî û Rojhelata Navîn û Cîhanê.Bi direjî qala metirsî û alozîya dirumên leşkerî hate kirin di derya Naverast da û nemaze li hember sinorê golava Sirt a Lîbya,ku Emrîka bi tundî hereşa li cemawerê Lîbya dike.

Vêcarê jî dîsa birayê têkoşer Mu'emer Qezafî miletê Kurd ji bîr nekir,û di vê civîna fireh da çend caran hate ser Doza Kurda..Li roja yekê di gotara destpêkirinâ civînan da got hêzên Kurdî netenê ji bo rizgarîyâ Îraqê dixebitin,ew ji bo rizgarîya Kurdistanê jî xebatê dikin...Kurd netenê hêjay Otonomîye ew hêjay mafê çarenûsî û damezrandina dewleta Kurdistanê ye..Divê ev Serokatîya me pişkdar bibe di azadkirina miletê Kurdistanê da,yê bira..Di destpêkê da dibêjim divê netenê tagirên Otonomî bîn ji Kurda ra,lê pêwîste ku piştevanîya azadkirina vî miletî bikîn.Her li dûvan gotinên Qezafî,her çar partîyên kurd yên di civînan da amadebûyn partîya me,Partî Demokratî Gelî Kurdistan û Partîya Demokrat a Kurdistana Îraqê û Partîya Sosyalîst a Kurdistana Îraqê û Ala Şoreşê tevda nameyek ji Qezafîra nivîsandin û têda supasîya helwîstên wî kirin li rast miletê Kurd..

Herwisa li roja dawîyê jî dîsa got:"Meselek heye divê li ser baxivîn,ew jî mesela Kurdaye , Kurd ji layê hikometan ve têne êşandin û çewsandin...Me wekî dewlet,û bi navê xwe jî,çend caran daxwaz ji Tirkîye kirîye hêrişên qirkirin û derbiderkirinê li ser kurda rawestîne..Li vê Serokatîyê divê em bi hemî rêyan hewil bidîn zulm û zordarîyê li ser kurdan li Tirkîye nehêlîn..»

Roja 4/2/1986 ê di civîneka fireh da beyannameyek hate nivîsandin li ser helsengandina civînan û rewşa ramyarî ya herêmê û cîhanê,û bi taybetî livlivînên leşkerî yên Emrîkî li derya Naverast û li hember golava Sirt, û xweragirtina Sûrîya li dijî İmperyalîzmê û Zayonîsmê,û xebata gelên Felestînî û Lubnanî,û alozîyên vê dawîyê li Yemena Demokratîk. Û peregrafeka wê beyannamê li ser Îraqê hatîye nivîsandin ku dibêje:"Serokatîya Neteweyîya hêzên şoreşgêrên Erebî rawestîya li ser rewşa gelê Îraqê û ew nexweşîyên rijîma faşîst bi serî tîne ,ji derbiderkirina têkoşerên Îraqî û bikar anîna dirindanetirîn şêweyên kuşt û kuştarê û terorê li dijî wan,û pêçêbûnên Îraqê di şerekî wêranker û narewa da pûç kirîn.

Serokatîya Neteweyîya hêzên şoreşgêrên Erebî piştevanîya xwe ji hêzên Opozisyona Îraqê ra dupat dike ji bo roxandina rijîma Seddam a faşîst û rizgarkirina Îraqê ,û damezrandina rijîmeka niştimanîya demokratîk û pêkanîna Otonomî ji gelê Kurd ra li Kurdistanê ku wî(gelê Kurd) vedigerîne bo gêrandina rolê xwe yê neteweyî li dijî Zayonîzmê û İmperyalîzmê."

Di peregrafeka din jî da hatîye ku ev serokatîye piştevanîya xebata dadmenda gelên têkoşer dike ji bo serxwebûn û azadbûnê ji rijîmên kevneperest û faşîst û dîktator,û yekgirtina xebaa wan li dijî İmperyalîzma cîhanê bi serokatîya Emrîka ,ku eve jî pêdivî damezrandina bereyekî millîyê cîhanîye li dijî İmperyalîzm û Zayonîzm û Kolonyalîzmê.

Evara roja /6/2/1986 ê wefdek ji Bereyê Nîştimanîyê Demokratîk ê Îraqê ,li bajêrê Terablus a Rojava ,çavpêketinek kir bi serokê têkoşer Mu'emer Qezafî ra, ji bo gotûbêja û xuya kirina nêrînan li ser xebata hêzên Îraqî li dijî rijîma faşîst a Seddamê dîktator û rewşa ramyarîya herêma Rojhelata Navîn û hereşe û livlivînên leşkerîyên İmperyalîzma Emrîkî li dijî Lîbya li derya Naverast da li hember sinorê Lîbya li golava Sirt.Di çavpêketinê da rêberê şoreşa Îlûlê careka dinjî piştevanîya xwe ji xebata gelê Îraqê û miletê Kurd ra nû kireve. Hejî gotinêye ku nûnerê Ala Şoreşê jî bi wefda Bereyê nîştimanîyê Demokratîkra di çavpêketinê da amade bû.

# DOZA KURDÎ DI KONGIREYÊN "MESABE" Û SEROKATÎYA NETEWEYÎ DA



Di rojên I5-I8 ê,meha Adarê/I986,kongireya giştî ya duwê a Mesaba cîhanî ya berengarî kirina Împeryalîzmê û Zayonîzmê û kevneperestîyê û Şovênîzmê û Faşîzmê,li bajêrê Terablus a rojava,paytextê komara Erebî ya Lîbî,hate girêdan.Kongire li jêr vî dirûşmî bû:" Ji bona mikum kirina yekgirtina şoreşgêrî û bikaranîna rêbîra têkoşîna tevayî li hemberî terora Împeryalî ya zayonî ya şovênî ya paşverû ya faşîst."

Girêdana vê kongirê bicih anîna wan biryaran bû ku di kongireya yekê a Mesaba cîhanî da li sala I982 ê hatîne wergirtin.Û dupatkirin bû li ser rewabûna têkoşîna şoreşgêrî.Û ji bona xurtkirina hêrişên berovajî bo ser bingehên hêzên dijminan.Hejî gotinêye li sala I98I ê yekemîn kongireya cîhanî ji bo piştevanîya Lîbya li Terablus a rojava hatibû girêdan,û pêtir ji 240 rêkxirawên şoreşgêr û tevgerên rizgarîxwaz têda amade bibûn.Û di wê kongirê da Lîbya hate helbijartin ji bo Mesaba cîhanî ji bona xebatê li dijî Împeryalîzmê û zayonîzmê û şovênîzmê û kevneperestîyê û faşîzmê.Paşî komîta amadeyîyê a Mesaba cîhanî li I2-23/2/I982ê civînek kir û biryara girêdana yekemîn kongira Mesabê hate standin,û Kongireya yekem ya Mesaba cîhanî li I5-I8/5/I982 ê hate girêdan .Partîya me,Partîya Demokrat a Gelê Kurdistanê di wê kongirê da jî amade bibû û ji wî demî ve bû endem di Mesabê da .

Di kongira duwê da pêtir ji 300 tevgerên rizgarîxwaz û hêzên şoreşgêr û pêşverûyên erebî û cîhanî amadebûn.

Êvara roja I5/3/I986 ê serheng Qezafî rêberê şoreşa Îlûlê bi gotareka giring kongire vekir.Di destpêkêda qala hereşe û pîlanên Împeryalîzmê kir li ser gelê Lîbî û hemî gelên têkoşer ji bo azadî û serxwebûnê .Wî dupat kir ku gelê Lîbî biryara xwe daye li ser berevanî û xweragirtinê,û got dibe dijmin bikare gelê me tevê bikuje lê em : serê xwe ji wan ra şor nakîn û serbilind têyn kuştin.Paşî bixêrhatin li wefdên amade kir û li pêşîyê got:Îro em bixêrhatinê dikîn li nûnerên hêzên kurdî li cîhanê..." . Herwisa di axiftina xwe da li ser rewşa cîhanê û rojhelata navîn û pîlanên Împeryalîzmê li ser azadî û hêmnayî û serxwebûna gelên cîhanê serok Qezafî hate ser rewşa netewê kurd û got:" Nûnerên hêzên netewê Kurd bi merane , ev netewê parçekirî û çewsandî û şikencedayî,yê ku cîranên wî înkara mafê wî dikin ji bo yekgirtin û serxwebûnê.Em nikarin rewşa vî neteweyê bêdesthelat li pêşçav negrîn.Divê li her derê ji cîhanê xuya bikîn mafê neteweyê Kurd ji bo yekgirtin û serxwebûnê."

Civînkeran tevda bihayekî mezin ji gotara serheng Qezafî ra danî û ew gotar wekî belgeyekî karî ji kongirê ra pesend kir(qebûl kir) ji ber giringîya wê a dîrokî çunkî hemî meselên xebata cîhanî li dijî imperyalîzmê û dûvikên wê di cîhanê da di wê gotarê da hatibûn .

Di civîna êvara roja I7/3/ ê heval Mes'ûd Barzanî gotarek xwend bi navê hêz û partîyên Tevgera Rizgarîxwaza Kurdî ên di kongirê da amade(Ew jî eve bûn:Partîya me,Partîya Demokrat a Gelê Kurdistanê,û Partî Demokratî Kurdistan/Îraq û Partîya Sosyalîsta Kurdistana Îraqê û Partîya Sosyalîst a Kurd û Ala Şoreşê). Wî di gotara xwe da qala wan zordarî û karesatan kir ku tên serê gelê me û supasîya helwîstên serheng Qezafî kir li rastî doza neteweyê Kurd û got ev helwîste biratîya Kurd û Ereban mikumtir dike çunkî eve yekemîn rêberê rizgarîxwazê erebe ku berevanîyê ji neteweyê Kurd dike.

# RIJÎMA ŞOVÊNÎST 776 DIBISTAN LI KURDISTANÊ DAXISTIN

Rijîma faşîst û şovênîst derên 776 dibistan û xwendingehên navînî û amadeyî daxistin li gundên Kurdistanê li parêzgehên Hewlêr,Dihok,Suleymanîyê,Kerkûk û heya Neynewa jî.Bi vê yekê rijîmê guneheka mezin derheqê zarokên kurd û zanist û perwerdekirinê li ser lîsta karên xweyên reş zêdekir.Bihana rijîmê ewe ku ev dibistane dikevine deverên dervey kontrula wê,û eve bixwe jî danpêdane ku gelek deverên Kurdistanê hatîne rizgarkirin. Mebesta rastîn jî ewe ku wireya hawwelatîyan û canê wan yê xebatgêrîyê nehêle û şêwekî din jî zêde bike,jibilî dorgirtina aborî û qedexekirina berhemên cotkara bo firotinê,da ku gundîyan neçar bike barkin biçin bajêra heya rêya destelatdarîyê xweş bibe ku wan bibine nav agirê "Qadisîye"ya Seddam û bikine caş"Betalyonên Sivik" ji bo dijayetîya hêzên nîştimanîyên xebatkar li Kurdistanê.

Bêhna rijîmê bi daxistina derên dibistanan nehat vêca nexweşxane û bingehên avê û elektirîkê û daristanan jî daxistin .



Li parêzgeha Dihok destelatdarîya şovênîst derên 208 dibistanan daxistin li ser fermana nihênî ya rêveberîya giştî ya perwerde-Nexşedanîna perwerdeyî li parêzgeha Dihok,hejmar 575 berwar 2/IO/I985.Di wê fermanê da hatîye : "Li gor nama komîta rêxistina parastinê li parêzgeha Dihok(nihênî û şexsî) hejmar 236 li 22/9/85 ku daxistina van dibistanên di lîsta bi vê namê ra,têda hatî,biryar hate standin ku karên pêwîst ji wê çendê ra bihêne encam dan,û ji wê berwara li jor. Mihemed Se'îd Ebdulrehman,rêveberê giştî."

Li parêzgeha Hewlêr jî rêveberîya giştî ya perwerdeyîyê fermana daxistina 200 dibistanan derxist,ew jî li ser nama rêveberîya giştî,hejmar 279 li I/9/I985 ê .

Li parêzgeha Sulêmanîyê û Kerkûk jî derê340 dibistanan hate daxistin,her li ser fermana destelatdarîya faşîst û şovênîst.Herwisa derên bi deyan dibistanan daxistin li parêzgeha Neynewa.nemaze li Akrê û Şêxan.

Destelatdarîya faşîst hemî mamosta û rêveber û xizmetkarên wan dibistanan bankirin bingehên parêzgehan û jêra got ku îsal kesek ji wana neçin ser karên xwe. Û dilreşîya şovênîstan gehişte pilekê"pêpelûkekê" ku ji dibistanên wan parêzgehan ra destûr dan xwendevanên ew dibistanên hatîn daxistin wernegirin.

Hejî gotinêye ku hinek ji wan dibistanan tenê çend kîlomitran ji bingehên parêzgehan dûrin yan jî dikevne ser rêyên giştî,ku rijîm dixwaze tim vekirî bin ji armancên leşkerî ra.

Van biryarên hovêtîyên rijîmê hejmareka mezin ji xwendevanan ji xwendin û zanînê bêpar kirin,û deverên Kurdistanê jî ji xizmetên civakî û leşsaxîyê bidûr man.

Ji lewra,em ji hemî sazuman û rêxistinên Erebî û cîhanî,nemaze Rêkxirawa Neteweyên Yekgirtî ya perwerde û zanistan û çandî, dixazîn berevanîyê ji mafê xwendinê bikin ji zarokên Kurdistanê ra.

XXXXXXXXXXXXX

Herwisa li dû hêrişên xweyên şovênîstî desthelatdarîya dîktator derê amadeyîya Birayetî li Dihokê daxist û xwendevanên wê li ser amadeyîyên din belav kirin,bêy ku egerên wê xuya bike.

Tevgera nîştimanîya xwendevanan tevda,bi taybetî xelkê Dihokê dizanin ji ber rolê vê amadeyîyê di xwepêşandanên dijî rijîmê û xebatên nîştimanî teva da,ji demê navê Birayetî li destpêka salên 70 da standî,û nemaze di raperînên gelêrî da ku ji sala I982 ê ve destpêkirîn.Ev amadeyîye ya bûye bingehekî şoreşgêrîyê ku xwepêşandan ji wir destpêdikin li Dihokê.Eve bûne egera tirsiyana desthelatdarîya faşîst ji vî bingehî û li dawîyê daxistina derê wî■

# BEYANNAME JI RAYA GISTÎ RA

Bihelketina sala nû nûnerên hêz û partîyên niştimanîyên Kurdî û Kurdistanî,yên ku li jêr mor kirîn,civînek çêkir.Di civînê da hinek meselên ji Tevgera Rizgarîxwaza Kurdî ra giring hatine şirove kirin. Di destpêkêda li ser rûdaw û qewmînên sala 1985 ê rawestan ku di vê salê da dijayetî xurt û dijwar bûy li navbera hêzên aştîxwaz û pêşverû û demokratîk li alîyekî û hêzên İmperyalîst û paşverû li alîyekî din da,çunkî İmperyalîzma cîhanî bi serokatîya Emrîka hereşeyên xwe li ser tenahîya gelan û aştîya cîhanî tundtir lêkirin,û li ser rêbaza xweya berêkanêya çekdarkirinê berdewam bû û programê xweyê dijminahîyê yê leşkerîkirina asmanî jî bi cih anî,heya ku rûdana şerê Noklerî ji herdemekê din nêzîktir bûy,û li hember wê jî Yekîtîya Sovêtî û rista Sosyalîst û hêzên demokratîk û aştîxwaz rolekî baş gêrand ji bona parastina aştîya cîhanî û dijayetîya ramyarîyên İmperyalîstî.

Kênca ramyarîyên dijmindarîyên İmperyalîzmê li ser herêma me,Rojhilata Navîn,ji hemî herêmên din pêtir bû.İmperyalîzma Emrîkî û destçêkirîya wê İsrayîl ji şikestina xwe di Lubnan da têr nebûn û her berdewambûn li ser rêbaza xweya dijminkarî,û hêrişên rastewxwe li dijî gelên Lubnanî û Felestînî bi cih anîn,û hereşe li Sûrîyê û Lîbya kirin,ji ber piştevanîya wan welatan ji xebata hêzên niştimanîyên Lubnanî û şoreşa Felestînî û rawestanên wanên dijî İmperyalîzm û Zayonîzmê û Kevneperestîyê û pîlanên wan.Û helwîstên dijminkarîyên rêberayetîya Rêgan di du bûyerên vê dawîyê li Roma û Viyenna tundtir lêhatin û ew kirine behane da ku hereşa li lîbya bike ku wê hêrişeka leşkerî bike ser û dorgirtina aborî li ser xuya kir û ji dewletên din jî xwest weka wê bikin,lê newekî wê hezdikir lêhat û ev ramyarîya wê sernekêt,û hemî hêzên aştî û rizgarîxwaz ji hemî alîyên cîhanê piştevanîya gelê lîbî kir û nerazîbûna xwe ji hereşeyên Emrîkî xuya kir.

Hêzên niştimanîyên Kurdî nerazîbûna xwe ji hereşeyên Emrîkî dupat dikin û piştevanîya xwe ji xebata Sûrîya û Lîbya û hemî tevgerên rizgarîxwaz di herêmêda xuya dikin.

Civînkera xurt û firehtir bûna peywendîyên İmperyalîzma Emrîkî bi kolonyalîstên faşîstên Tirkîya ra di sala çûyî da jî dan xuya kirin,çunkî dewleta Tirkîya razîbû ku komeleka bombên Noklerî li ser axa Tirkîya û Kurdistana Tirkî bên danîn.Û hêşta parçeka axa Qubris jî dagîr kirîye,ku ev kire dibine metirsî li ser aştîya herêmê û ya cîhanê jî.

Yek ji mezintirîn problemên herêma me şerê Iranê û İraqê ye yê ku rijîma Seddamê faşîst ji pêş Imperyalîzmê ve agirê wî vêxistî.Û xuyaye ku berdewambûna wî di xizmeta gelên herdu welatan da nîne,û ji mirin û wêranîyê pêve tiştekî nagehîne gelên wan. ji alîyekî jî ev şere metirsîyeka mezine liser xebata rizgarîxwazîya gelê Kurd,çunkî Kurdistan jî ya ketîye ber nêrişên wêranker û bi vê çendê tengasî û alozîyên pêtir ji bo gelê me peyda dibin.

Sala 1985 ê saleka tijî sextî û alozî bû li ser gelê Kurd,ji ber berdewambûna ramyerîyên teror û qirkirinê yên dijminan bi serî anîn.Û dijminan gavên nû avêtin di harîkarî û rêkketinên navbera xwe da ji bo vemirandina agirê xebata şoreşgerîya gelê Kurd, Kurdistan bû meydanek ji zordarîyê û hêrişan li ser hawwelatîyên bêdestelat û sotandina gundan û çolkirinê û kuştargehan û daxistina dibistanan û girtina hezaran xwendeva-

BO LAPERE ( 50 )

# GEL LI SER XAKA WELATÎ

Eve careka din jî em vegeryayne ser xaka welatî,em vegeryayn ji bo mikum kirina xebatê û bi taybetî xebata çekdarî, mil bi mil li gel partîyên hevpeyman di Bereyê Nîştimanîyê Demokratîk da û hemî hêzên xebatkar li dijî rijîma faşîst û xwînmij ya hevalbenda Împeryalîzmê û kevneperestîyê.

Çiqas rindin ev çiyayên bilindên ku berfa kej ew dapoşandîn.Çiqas xweşe dengê van sûlavan ku ji her alîyekî têne xwar.Ev dol û nihale çiqas bêhna mirovî fireh dikin.Ah,çend dilvekere demê tîroşk li berfa ser tayên darên berûya dixe û wan gumtilên berfê dike komeka çilçiraxa .Dengê kewa çiqas li mirovî xweş tê demê li nava gelîyan diqebînin,heya barîna berfê jî we dike mirov piştî dûrîyê şanazîyê bi welatê xwe û serfirazîyên wî bike.Û gurmêna topan û giregira firokan jî bîra qehremanîyên gelê meyê nebez tînine bîra mirovî.Kê gotîye zistan ne wextê kar û xebatêye li çiyayên Kurdistanê.?

Gelek xebatên sext û aloz ku partîya me ji demê damezrandinê heya niha bûrandîn li pêşîya partîya meya xebatkar bûn bo hatina nav gîxa şerê çekdarî.Û li pêşîya wan têkoşînên ku bûyne egera vê serketinê ramyarîya dirusta partîya me bû di hemî waran da û bi taybetî helwîstên avaker di yekgirtina Tevgera Rizgarîxwaza Kurdî û Tevgera Nîştimanîya Îraqê da û nemaze partîyên Bereyê Nîştimanîyê Demokratîk da û mikum kirina hevkarîya bereyî û pêwendîyên navbera berey û gelek hêzên nîştimanîyên din,û rawestana wê li dijî şerên birakujîyê û gazîyên wê yên rastîn ji bo yekîtîya hemî hêzên nîştimanî,li gel cihê cihê bûna nêrînên wan yên ramyarî.

Û bi vê helketinê divê em supaskar bîn ji bo helwîstên partîyên dost û hevpeyman û hêzên rizgarîxwazên dost di herêmê da yên ku piştevanîya mafê partîya me kirîn bo girtina cihê xweyê siruştî li ser axa welatî ku partîya me jî ji rizgarîya wê ra her tiştê hêja û giranbuha pêşkêş kirîn.Û armanca partîya me ji vê yekê tenê pêşkêşkirina xebat û qurbanîyên pêtire di rêya maf û azadîya gelê Kurd û gelê Îraqê û dozên gelên herêma me da.

Ji damezrandinê heya niha pir demên sext û dirumên aloz bi ser partîya me da bçrîne,lê rêbazê nîştimanî û pêşverû yê partîya me ku xebata rizgarîya neteweyî bi xebata çînayetî ve girê dide tim xetîrek bû ji dûr û nêzîk ve rê ron dikir li pêş xebatkarên partîya me yên rast li gel xwe û gelê xwe,û rêber û kadroyên partîya me bi rişkxwarîya şoreşgêrane nehêştin alayê "GEL" biçemyîtin yan ji axa welatî dûr kevîtin. Û me pêtir ji 20 şehîdan ji rêber û kadroyân pêşketî pêşkêş kirin û pir birîndar û bi deyan girtî, û heya niha jî gelek jê di zîndanên faşîstan dane,gişt ji bona alayê GEL di welatî da û di nav cemawerê xweyê şoreşger da berz bimînê.Û di van rojan da em bîra şehîdên xweyên nemir nû dikîn bi taybetî şehîd Gundî û hevalên wî,û şehîd Kawe û hevalên wî,û şehîdan Faris,Cengo, Şemo û hevalên wan yên ku leşên xwe kirîne pir ji bo derbazbûna partîya wan,Partî Demokratî Gelî Kurdistan,bo ser axa welatî.Û em bîra hevalê xwe yê mezin şehîd Nûrî Şaweys jî nû dikîn û şîretên wî û rewiştê wîyê pêşverû li pêşçav digrîn.

Hatina partîya me bo meydanê bi aşkerayî destpêkeka nû û giringe,herçend dîsa vegeryana rolê rêber û kadro û pêşmergehên wêye di xebata çekdarî da,lê navê rolê çi hêzên din yên nîştimanî kêm bike,û yan cihê kesekî bigre.Çunkî cihê tevan di meydanê da heye û hêşta gelek ji cemawerê gelê me dûrin ji rêkxirawên ramyarî ji ber dirumên terorîstî û faşîstî û ramyarîya Seddamî ya şovênîstî ya ku kes newekî wê xwînmêj û şovênîst û hunermend di şêweyên çewsandinê da . Ji bo nimûne bi bikaranîna hereşa birna şerî û mişextkirina bi zorî ya cotkara bo dorên bajêra, û birrîna azoqey ji gundan,û nekirîna berhemên cotkarîyê,û daxistina derê sedan dibistan û nexweşxana û gelek hereşeyên din vê rijîmê karîye jimareka mezin ji modêla nû ya caşa bicivîne , ew caşên ku jêra dibêjin"Efwac xefîfe"(Betalyonên sivik). Vêca li ser me tevaye û nemaze Bereyê Nîştimanîyê Demokratîk ku rê û nexşan danîn ji bo pûçkirina vê diyardeya seyr ku piştî çarêke sedeyekî ji xebata çekdarîya şoreşgêrî di Kurdistanê da peydabûyî.

Sextîyên mezin hene li pêşîya partîya me bitaybetî û hemî hêzên xebatkar li Kurdistanê ku

BO LAPERE( 52 )



CENGO



FARİS



ŞEMO



CEMAL



CEMAL

Salek borî li ser wê şeva reş û tarî..Şeva I3/I4ê Adara sala 1985 ê..Ew şeva ku dîsan dagîrkerên faşîst û şovênî destên xwe bi xwîna II6 kurên gelê me yê bêdesthelat sor kirîn..Şeva ku I3 ji serok,kadro û pêşmergehên qaremanên partîya me di zîndana Mosil da şehîd kirîn..Dagîrkeran wisa zanî bi şehîd bûna wan xetîrên bîrûbawerîyên wan vemirîn û alayê destê wan ket ser erdî û êdî rêya wan jî winda dibe..

Lê ne',nexêr,ew jî xewnek bû ji xewnên dagîrkeran..Raste ew heval şehîd bûn lê,wekî hemî şehîdên tevgera rizgarîxwaza netewê kurd,ew zindîne û di dilê gel da nemirîne û qet namirin..Ew bûne stêrên geş û ketin asmanê Kurdistanê dilê şevên tarî diçirînin..Bîrûbawerîyên wan bûne agir û pêt li ber sîngê dagîrkeran..Bûne das û çekoçên destê karker û cotkarên Kurd ji bo qetandina bend û zincîrên koletîyê..Bûne hubr û merekeb ji pênivîsên roşenbîrên şoreşgêr ra û bûne peyv û awazên hozanvanan..Sirûdên azadîyê pê vedihînin.Alayê destê wan jî neket û qet nakeve..Stêr û gule-genim û xencer li ser wan çiyan bilindtir lêhatin û şewqa xwe ya sor geştir û firehtir kir..Vêcarê jî wekî hercar xewnên dagîrkeran têkda helweşandin.

Sed hezar silav û rêz bo we ey qaremanên gel û giyanfîdayên welatî..Ey pîroztirîn peyv piştî navê Kurdistanê..Silavên hezaran dayikên cigersotî û hezaran kal û pîrên derbeder,û hezaran zarokên sêwî..Silav bo we ji hezaran cêgir û hevbîr û hevrêyên we ..Ji pênivîsên hemî dilsozan..Ji lûliyên tivengên hezaran pêşmergehên Kurdistanê û ji hemî şoreşgêrên cîhanê û xebatkarên rêya rizgarîya gelên bindest.

Nemirî û serfirazî bo şehîdên Kurd û Kurdistanêye.
Mirin û rûreşî ji bo dagîrker û dijminên aştîyêye.



HEKAR



MEMO



DEŞTÎ



NEWZAD



BEREVAN



COTYAR



SİYAMEND



SİWARO

# PÊŞENG

JİMARE:II SALA:4ê ADAR/I986

GOVAREKA RAMYARÎ Û ÇANDEYÎ YE RAGEYANDİNA NAVÎNÎYA PARTÎ DÎMOKRATÎ GELÎ KURDISTAN DERDİXE



GULISTAN JI PÊŞENGÊ RA DIPEYVE